


kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

bîrnebûn

hejmar 78 | 2020



Şefîk Pêşeng

Lî gundekî şêxbizîniyan

Memduh Selîm

Apê Reso

Hesenê Metê

Koçan

Dr. Mikailî

Îskana têrikîyan/mirdêsan

Ji çarinên Omer Xeyam

wergera jî farisî: Ehmed Milan

Dr. Prof. Kinyazê Îbrahîm Mirzoyev

Tesîra Abay Kûnanbayûlî li ser edebiyata kurdi

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB
hejmar 78 / 2020

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Abdulbaki Xalîsinan, Seyfi Doğan,
Fatos Koyuncuer Brunner, S. Erdem, Dr Mikaili,
Mûlla Evîndar, Ecevit Yıldırım, Mem Xelikan,
Nuh Ateş, Ehmed Milan, Şefik Pêşeng,
Memduh Selim, Îhsan Türkmen, Mehtab Îdeli,
Xizan Şilan, Hesenê Metê, Zinarê Xamo,
Dr. Prof. Kinyazê Îbrahim Mirzoyev, Seyîdxan
Anter, Bêrivan Keskin, Abdurrahman Benek

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@apetryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyay

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 10 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK -Almanyay 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baski: Apec-Tryck AB



Ji arşîva kitêpxaneyaya universîteya Stenbolê hatiye wergirtin.

Li wir bi navê Tavşancıl (Omera), Tuzlu Göl kurbunda Kürd karyesi

Album: Anadolu seyahat yadigarı- Leon Berger, 1889

Li binê resimê jor: Tîpîk kurd

Li binê resmê jêr: Gundekî kurda li nêzikî Gola Xwê ya mezin.

Wêneyê berga pêşin: Ayşe Dudu Özalp /Hakbilen (1932-2008)

ji canbegên gundê Uzunbeyliya Polatliyê, keça Alişan Özalp e.

Malbata Özalp xwe wek neviyên Kürt Alişan begê dizanin.

Wêneya pergê paşin: Fodila Hesen begê

Ji arşîva Dr. Fikret Yildiz.

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tîn, sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

Ali Çiftçi, <i>Ji birnebûnê</i>	4
Ali Çiftçi, <i>Kongreya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ya 29an</i>	7
Şefîq Pêşeng, <i>Li gundeki şêxbiziniyan</i>	11
Memduh Selim, <i>Apê Reso</i>	18
Îhsan Türkmen, <i>Colo -4</i>	21
Abdulgazi Xalisînan, <i>Milet mezin e</i>	25
Mehtab Îdelî, <i>Peyva "ro"</i>	27
Hesenê Metê, <i>Koçan</i>	29
Dr. Mikailî, <i>Îşkana têrikan/mirdêsan</i>	36
S. Erdem, <i>Hêmanên gencineyên me yên giring û çandî: Nav û bilêvkirina navan</i>	56
Mem Xelîkan, <i>Serenad</i>	64
Ehmed Mîlan, <i>Ji çarinên Omer Xeyam</i>	65
Zinarê Xamo, <i>Kurdên Konyayê û serpêhatîyeke xweş</i>	68
Xizan Şîlan, <i>Kemana dil</i>	70
Nuh Ateş, <i>Hansê bextewar</i>	71
Mûlla Evîndar, <i>Şivaneke cêmêr "Ele Hecî"</i>	76
Abdurrahman Benek, <i>Kurdên Anatoliya Navîn</i>	79
Kinyazê Îbrahîm Mîrzojev, <i>Tesîra Abay Kûnanbayûlî li ser edebiyata kurdî</i>	82
Kinyazê Îbrahîm Mîrzojev, <i>Ronakbîrê kurda yî mezin Bariyê Bala</i>	85
Mûlla Evîndar, <i>Mem û Zîn</i>	87
Seyfî Doğan, <i>Qerfê</i>	88
Nuh Ateş, <i>Ji vir û ji wê -Çend kurtenivîs-</i>	89
Bêrîvan Keskîn, <i>Helbest</i>	91
Fatos Koyuncuer-Brunner, <i>Xwarinên kurdên Anatoliya Navîn</i>	92
Adem Akat, <i>Rojîya Evînê</i>	95
Ecevit Yıldırım, <i>"Karin" yan jî "Kanin"</i>	97
Seyfî Doğan, <i>Helbest</i>	98
Seyîdxan Anter, <i>"Feyza me weke Nîl e, lê em Dicle û Ferat in"</i>	99

Ji bîrnebûnê

Me bihar û havîna îsal bi tirs û xofa pandemîya bi navê Covîd-19an derbas kir. Ev pandemîya îsal ê bîranîneka gelek nexweş be, bi taybetî ji bo zarokên îro. Lê tiştê girîng niha ev e ku em vê rewşê çawa birêve dibin. Em ê çîng xwe biparêzin û xwe bigihînin dawîlêhatina wê?

Girîng û pêwîst e ku amadebûneka herkesî ji vê krîzê re hebe û dema hewce bike bi hazîrî be. Ev tê vê wateyê ku gava em baş bin û hertişt bi rê de here jî em xwedî helwesteka dîlnîzm bin. Meriv ne fikire ku herdem ê veng baş bibe. Hertişt dikare bibe. Zû yan dereng be jî, dê şert bên guhartin -dibe ku ne ewqas hovane wekî covid-19an be- lê bi awayekî dikare kirîzeka din rûbide. Eger ji destpêkê em xwedî helwesteka rast bin, wê hingê em bi hêsanî dikarin bi pîrgirêkan re rûbirû bibin û çareser bikin.

Piştî ev şeş mehên derbasbûyî em dibînin hîn jî ev agahdarîyên ku ji alîyê pîsporên pandemîyê ve li seranserê dinyayê tê dayîn hînek guh nadinê. Bi piranî ji nav însanên xizan, ji ber bê îmkaniyê û nezaniyê hîn zêdetir belav dibe.

Di destpêka vê nexwaşîyê de li nav gundên kurdên Anatolîya Navîn ev nexwaxî qet tunebû. Piştî ku tatîlê dest pê kir û rêya çûyîn û hatina ji welatên Ewropa bo Tirkîyê hat vekirin, em niha pê dihesin ku li gundên Anatolîyê jî ev nexwaşî belav bûye. Mixabin zanebûn û agahdarîyên ji bo vê sawê di nav însanên me de kêm e. Ev jî dibe sebeba ku ev nexweşî hîn zêde belav bibe. Em hêvî dikin herkes baş guh bide agahdarîyên ku ji alîyê pîsporên pandemîyê ve têne dayîn, xwe ji Covîd-19an biparêzin û nebin sebebê belavbûna vê sawê!

Dema ev saw pir belav bibe, bi piranî însanên xizan û belangaz ê jê zerarê bibînin. Ev dewletên ku bi darê zorê têne îdarekirin karê wan ê hêsanîr bike.

Dema bahsa kurdên Swêdê dibê, yekser pêşketina zimanê kurdî, nivîskarîya bi zimanê kurdî û Ekola Swêdê tê dengkirin. Yek ji sitûnên wê helbet birêxistinkirina komeleyên kurdistanî bû ku di destpêka 1981an de, piştî *Kome-la Xwendekarên Kurd li Ewropa* (KSSE), li derveyî welêt yekemcar bû bi temsîlkarîya ji her çar alîyên

Kurdistanê *Federasyona Komeleyên Kurdistanê* li Swêdê hat avakirin. Ya herî girîng jî ew biryar bû ku zimanê kurdî zimanê Federasyonê yê resmî be û bi vê re jî derxistina kovara *Berbangê* ku tenê bi kurdî bê wêşandin. Îsal Federasyonê kongreya xwe ya 29an pêk anî.

Keya Îzol yek ji wan kesan e ku di pêşengîya avakirin û rêvebirina Federasyonê de kedeka pir daye û bi salan serokatîya Federasyonê kiriye. Ji bo xwendevanên Bîrnebûnê me xwest em hevpeyvîneka pir kurt bikin.

Di vê hejmarê de birêz Şefîq Pêşeng, bîranîna xwe ya li gundekî kurdên Anatolîyê û herwiha danûstendinên xwe yên bi wan re li derveyê welêt jî, bi sernivîsa *Li gundekî şêxbizîniyan* bi agahdarî û têbînîyên xwe bi kurmancîyeka zelal nivîsiye.

Memduh Selim, bîranîneka xwe ya zaroktî û xortanîyê ya cîran û hevalekî bavî xwe yî bi navê *Apê Reso* nivîsiye. Di nav kurdên me yên Anatolîyê de li her gundekî ew kesên ku eskerîya xwe li Kurdistanê kirine xwedîyê bîranînekê ne.

Bîranînên eskerîyê di nav cimareta kurdên me de meriv bi rihetî dikare bêje sohbetên civatê yên

sereke ne. Tê bîra min jî dema li gundan însan topserhev dibûn hertim sohbetê wan li ser eskerîyê dibû, dirêj dikirin û teva nedibûn! Lê hinek ji wan wek a *Apê Reso* em pir diêşandin.

Îhsan Türkmen bi rêzenivîsa xwe ya *Colo -4*, Abdulbaki Xalîsînan, bi du helbestan, *Mîlet mezin* e û *Tarix*, Mehtab Îdelî li ser gotina ro/roj *Peyva 'ro'* ku di nav kurmancîya kurdên Anatolîyê de bi çend maneya tê bikaranîn, çing tê bilêvkirin û nivîsandin bi çend hevokan nimûneyan dide.

Hesenê Metê, kurteçîrokek bi navê *Koçan*, Dr. Mikailî, *Îşkana têrikan/mirdêsan*, li gor belge-nameyên arşîva osmanîyan serokwezareta Tirkîyeyê li gel orijînalê belgeyan hem bi tirkîya osmanî û hem jî bi wergera wan a kurmancî amade kiriye.

S. Erdem, *Hêmanên gencîneyên me yên girîng û çandî: Nav û bilêvkirina navan*, Mem Xelîkan, *Serenad*, Ehmed Mîlan, *ji çarînên Omer Xeyam* çendek ji orijînalê farisî bo me wergerandîye kurmancî.

Zinarê Xamo, bîranîneka xwe bi navê *Kurdên Konyayê û serpêhatîyeke xweş* nivîsiye. Birêz Zinar, balê dikişîne ser pîrseka girîng, ziman ku

piranîya kurdên me yên Anatolîyê li welatên Ewropayê jî bi erf, edet û zimanê kurdî bi zarokên xwe re deng dikin û li gor edetên xwe tevdigerin.

Xizan Şilan, bi helbesta *Kemana dil*, Nuh Ateş, wergera çêrokeka almanî jî yên birayên Grimm a bi navê *Hansê bextewar*, Mûlla Evîndar, serborîyeka şivanekî bi sernivîsa *Şivanekî cemêr "Ele Hecî"*, Abdurrahman Benek, bernameçêkirekî me yî jêhatî di van demên dawî de çend rêzeprogram jî bo TRT-Kurdî li ser gundên Anatolîyê çêkirine û jî kovara *Riataza* re bi navê *Kurdên Anatolîya Navîn* kurtenivîseka nasandina kurdên Anatolîyê *nivîsiye*.

Kinyazê Îbrahîm Mîrzoyev akademîsyen, profesor, serokê Yekîtîya Kurdên Qazaxistanê «Berbangê» û serokê Federasyona Navnetewî ya Diyasporayên Kurdan e. Zanayê edebîyata qazax û herwiha edebîyata kurdî ye. Birêz Kinyazê Îbrahîm bi du sernivîsan: *Tesîra Abay Kûnanbayûlî li ser edebîyata kurdî* û *Ronakbîrê kurda yî mezin Barîyê Bala* hem di warê edebîyata qaza-

xan û hem jî edebîyata kurdên me yên li Qazaxistanê heydar dike.

Seyfî Doğan, bi stîleka nû ya bêhed, bêsensûr û otosensûr, rexne û henekên bêtirs ku hîsên kesî naêşîne bi kurtenavê *Qerfo* kurtehelbest nivîsîne.

Nuh Ateş, bi sernivîsa *Ji vir û ji wê -çend kurtenivîs-* Bêrîvan Keskîn, bi helbesteka xwe, Fatoş Koyuncuer-Brunner, li ser xwarinên me yên berê bi sernivîsa *Xwarinên kurdên Anatolîya Navîn*, Ecevit Yıldırım, li ser lêkera *kan* bi sernivîsa *"Karîn" yan jî "Kanîn"*, Adem Akat bi helbesta xwe ya bi navê *Rojîya Evînê* ev hejmara me dewlementir kirine.

Seyîdxan Anter kitêba Amed Tîgrîs a bi navê *Dicle û Ferat* bi sernivîsa *"Feyza me wek Nîl e, lê em Dicle û Ferat in"* dide nasîn.

Bi hêvîya ku ev hejmar jî bi dilê we be û em di demeka nêz de ji vê metirsîya sawa Covîd-19an xilas bibin, bimînin di xêr û xweşîyê de.

Alî Çiftçî


Kongreya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ya 29an

Alî Çiftçi

Federasyona komeleyên Kurdistanê li Swêdê kongreya xwe ya 29an li bajarê Eskilstunayê di 8/08-21020an de pêk anî. Ji ber pandemîya covid-19an, Federasyonê îsal tenê bi 50 nûneran ve kongreya xwe çêkir. Komîteyeka rêvebirîya nû bi serokatîya birêz Kovan Amedî hat hilbijartin.

Keya Îzol yek ji wan kesan e ku di pêşengîya avakirin û rêvebirina Federasyonê de kedeka pir daye û bi salan serokatîya Federasyonê kiriye. Ji bo xwendevanên kovara Bîrnebûnê me xwest em hevpeyvîneka pir kurt bikin.

Bîrnebûn: Wek serokê Federasyonê yê bi salan, ji wan kar û xebatên ku



Serokê nû yê Federasyonê birêz Kovan Amedî

heta niha hatine kirin, xebatên ku tu ji bîr nakî û baş dibînî çi bûn?

— Federasyon yek ji girîngtirîn destkeftiyên kurdên li derveyî welêt e. Wek rêxistinek demokratîk ku çar beşên Kurdistanê li Swêdê temsîl



Dîmenek ji kongreya Federasyonê li bajarê Eskilstunayê



Keya Îzol

dike, di nav 40 salan de karên gelek girîng pêk aniye. Çend ji wan dîrokî ne û mohra xwe li komelgehê kurdên li Swêdê xistiye. Federasyon bi vê rola xwe di gelek pirsan de pêşengîya civata me kiriye.

Biryara kongreya yekem, herweha di destûra me de jî cîh digre: *”Zimanê kurdî zimanê me yê fermî ye.”* Bi saya vê biryarê zimanê kurdî di malên kurdan de zêdetir hat bikaranîn. Di dibistanan de bû zimanê perwerdeyê û alîkarî kir ku zarokên kurdan zimanê xwe bi kar bînin û bi pêş bixin.

- Derxistina kovara Berbangê.
- Xebata me bi boneya Komkujiya Helebçeyê û Enfal.
- Pêşwazîkirina birîndarên Helebçeyê 1988an û herweha meşandina pêwendîyan digel berpirsên nexweşxaneya Karolinska û Wezareta Derve ya Swêdê.



Ji pîrozbahîya Newroza 2017an a li Blå Hallenê. *DN.se* Ji çepê di rêza yekem de: Roger Mogert (s), Endamê Parlamentoyê Fredrik Malm (lib), Wezîrê kar Ylva Johansson (s), Keya Îzol, serokê Federasyonê, Jonas Sjöstedt (serokê partiya çep) û Ann-Margarethe Lihv (ji partiya çep)

- Merasîmên salane yên bîranîna Helebçeyê li Adolf Fredriks Kyrkayê û li Parlamena Swêdê.
- Xebat û înnîsyatîfa Federasyonê di cenazeya Dr. Qasimlou û Şerefkendî de. Federasyon bi balafireke taybet ji 115 kesan pêkhatî beşdarîya merasîma veşartina Dr. Qasimlou kir.
- Musabaqa Folklorê û muzikê: sal 1987, 1988 û 1999.
- Serpereştîkirina kampanya hemû rêkxistinên bîyanî li Swêd, li dijî êrişên nijadperestan di salên 90î de. Federasyonê pêşengîya wê kampanyayê kir ku gelek deng veda.
- Xwepêşendanên girseyî di rojên raperîna 1991an li Başûrê Kurdistanê, kampanya alîkarî û damezrandina Projeya Qandîlê.
- Semîner û festîvala Referandûma serxwebûnê ku 13 hezar kes civand û nêzikî 4 saetan di navenda Stockholmê de muzîka kurdî pêşkeşî hezaran kir.
- Serpereştîya xebata diasporayê. Li ser înnîsyatîfa Federasyonê civîna pêşî 10ê sibata 2018an de li Stockholmê pêk hat. Piştî vê civînê, li Moskova, Bruksel, Koln û Danmarkê konferans û civîn hatin lidarxistin. Ev xebat hê jî berdewam e.
- Şevahengên Newrozê li Konsert-husetê (1988) û li Blå Hallenê, salona xelata Nobelê (2017 û 2018)
- Hersê Newroz dirokî bûn. Seroka Şaredarîya Stockholmê, Serokê Partîya Çep û Wezîrek ji hukumeta Swêdê beşdarî kirin û piştgirî dan doza kurd û Referandûma serxwebûna Kurdistanê.

Bîrnebûn: Divê Federasyon li gor dema niha çi karî bike da ku rewşa kurdên Swêdê, bi taybetî ya ciwan û malbatên kurd baştir bibe, ji aliyê civakî û xweparastina nasnameya kurdî ve?

– Komelgehê kurdên Swêdê wek berê nîne. Federasyon hatiye merheleyeka nû, divê guherandinên esasî pêk werin. Daxwaz û hêviyên kurdên Swêdê hatine guhertin. Divê em li gor vê rastîyê rêkxistina xwe nûjen bikin. Kesayet an komên ku ji me dûrketine adivê careka din vegerin nav xebata Federasyonê. Divê em ji tecrubeyên 39 salan dersan werbigrin û pêşîya rêkxistinê li gor daxwaz û hêviyên ku di nav civata me de heye, vekin.'

Ciwanên kurd di jîyana civakî ya Swêdê de g elek aktîf in û roleka mezin dilîzin û heta îro jî nasnameya xwe parastine.

Ciwanên kurd wek çawa di gelek beşên civakî wek sîyaset, rojnemevanî, şano, film de çalak û xwedî serketinan in, ew dikarin dewrê xwe di nav rêkxistîneka wek Federasyonê de jî bînin cîh.

Divê em bêtir bala xwe bidin ser vê rastîyê û rêyên nû biafirînin. Şîyara "Ciwan pêşerojên me ne" divê bi rastî jî bikeve jîyana me, em Federasyonê teslîmê nîfşa nû bikin. Heger xort û keçên kurdan bi hemû alîyên xwe yê dewlemend nekevin nav karûbarên Federeasyonê, em ê nikaribin rêkxistîneka girîng ya mîna Federasyonê li gor pêdivîyên civata kurd nûjen bikin û berdewamîya wê biparêzin.

*Mala ava, te wexta xwe da me û pîrsên me bersivandin!
Em ji Komîta Rêvebir a nû re serkeftinê hevî dikin.*

PEYMANNAMEYA STENBOLÊ

Peymannameya Konseya Ewropayê ya Tundiya Li Ser Jinan û Pêşilêgirtina Tundiya Nav Malê û Têkoşîna Bi Wan Re

Amadekar: Pr. Sezgin Dinç

1 Peymannameya Stenbolê çi ye?

Navê wê yê resen "Peymannameya Konseya Ewropayê ya Tundiya Li Ser Jinan û Pêşilêgirtina Tundiya Nav Malê û Têkoşîna Bi Wan Re" ye lê ji ber ku di 11ê Gulana 2011an de li Stenbolê ji bo îmzekirinê hatiye vekirin bi navê Peymannameya Stenbolê tê naskirin. Ji aliyê 45 welat û hemû welatên endamên Yekîtiya Ewropayê hatiye îmzekirin û ji hêla 35 welatan ve jî hatiye erêkirin. Yekemîn welatê ku îmze kir Komara Tirkîyeyê ye. Dîroka likarbûna wê 1ê Tebaxa 2014an e. Peymannameya Stenbolê xwe dispêre prensîpa wekheviya zayendi ya civakî.

2 Armanca wê çi ye?

Parastina jinan ji her cûre tundiyê, pêşilêgirtin û jîholêrakirina tundiya li ser jinan û tundiya nav malê, jîholêrakirina her cûre cûdakariya li hemberî jinan, bihêzkirina jinan, pêxistina wekheviyê ya di navbera jin û mêran, parastina hemû ziyandîtiyên tundiya li ser jinan û yê nav malê, danîna pêkanî û politikayên karîger, hevkarîya navdewletî ya di çarçoweya peymannameyê de armancên bingehein yê peymannameyê ne.

3 Welatek dikare peymannameyê fesix bike?

Li gor xala 80emîn ya peymannameyê welatek kengî bixwaze bi danzanîna ji bo Sekreterîya Giştî ya Konseya Ewropayê dikare ji aliyê xwe ve peymannameyê fesix bike. Likarbûna peymannameyê ya li wî welatî piştî danzanîna fesixê bi sê mehan didome û piştî wan sê mehan peymanname ji bo wî welatî fesix dibe.

4 Bi erêkirina peymannameyê li Tirkîyeyê çi guherî?

Bi erêkirina peymannameyê "Qanûna Li Ser Parastina Malbatê û Pêşilêgirtina Tundiya Li Ser Jinê ya bi jimara 6284an saz bû û pê bingehek ji bo parastina ziyandîtiyên tundiyê hate danîn her wiha li hemû bajaran sazîyên bi navê "Navenda Çavdêrî û Pêşilêgirtina Tundiya" hatin vekirin. Ji bo şopandina karên girêdayî peymannameyê di bin banê Komîsyona Wekheviya Fîrsendê ya Jin û Mêran a Parlemantoyê jêrkomîsyonek hate damezrandin.

5 Peymanname tundiya li ser jinan çawa pênase dike?

Peymanname çi li qada giştî û çi li qada taybet be bê cûdahî her cûre tundiya fizîkî, cinsî, giyanî û iqtisadî û her wiha tehdîda tundiya di hundirê pênaseya "tundiya li ser jinê" de dibîne. Zarokên keç yê ku temenê wan di bin 18 salî de ne ji di nava vê pênaseyê de cih digirin.

6 Peymanname çi berpirsiyarî li aliyan bar dike?

Peymanname aliyan xwe mecbûr dike ku "tedbirên pêwîst ên qanûnî û yê din" bigirin da ku pêşî li her cûre kiryarên tundiyê û cûdakariyê bigirin û daxwazê ji aliyan dike ku çalakiyên karîger ji bo xurtkirina jinan pêk bînin. Her wiha aliyan peymannameyê divê hemû saz û dezgehên xwe, hemû mewzûata xwe di çarçoweya peymannameyê de sererast bikin.

Bi şertê nişandayîna çavkaniyê belavkirin û weşandina wê serbest e.
dincsezgin@gmail.com

Li gundekî şêxbizinîyan

Şefîq Pêşeng

Derssalek qediyabû. Ez ji bo westana havînê hatibûm gund. Li devera me, Baravayê traktor û biçeran hino hino şûna gîsin, das û palehîyê digirt. Xwedîerd bûbûn xwedîtraktor jî lê li heremê biçer kêmbûn. Biçera Oguz Begê Embarçîyayê hebû. Erdên wî yêncandîne gelek bûn û ew biçer tenê têra rakirina erdê wî dikir. Lewma jî di salên dawîya 1960î, destpêka salên 1970yî de biçer ji derva dihatin.

Erdê Barava gelek û bi bereket bû. Bi giranî ceh û genim dihat çandin û li gorî Anatolîyê, zad zûtir diseridî. Ku em ji bo westana havînê dihatin gund, ceh hatibû rakirin û genim jî li benda çinînê bû. Biçercîyên pêşî hatin gundê me ji Mereşê bûn. Paşê ji Konyayê jî hatin. Pirayî du biçer bi hev re dihatin. Xwedîyê biçeran, an wekîlên wan, du-sê şofêr û yek -du kesên dinê pênc-şeş kes bi hev re dihatin û heta hemû zadê gund bihata çinîn, li gund, li ser erdan diman.

Li gund ji bavê min pê ve kesekî bi hesabê doniman nizanibû.

Belê gundîyan li gorî hesabê xwe û texmînî dizanibûn erdê wan çend donim e, lê gelek caran erdê diviya 100 donim bûya, 110 an 90 donim derdiket. Lewma jî hesabê doniman gelek caran di navbera gundî û biçercîyan de dibû problem. Ew jî dihatin ba bavê min, bavê min hesabê wan çêdikir. Wê sala ez ji sinîfa şeşan derbasî ya heftan bûm, bavê min xwest ku ez ji dêvla wî hesabê gundî û biçercîyan çêkim. Wî dixwest him barê xwe sivik bike û him jî ez bi vê yekê xercîya xwe qezenc bikim. Min helbet hesabê rûbarê çarkoşe, sêkoşeyan dizanibû lê ê doniman çewa bû, min nedizani. Bavê min nîşanî min da.

Piştî erdê malbatakê radibû, gazî min dikirin. Ez diçûm min hesabê wan çêdikir, biçercîyan jî heqê xwe distend. Ne min tiştek ji wan xwest, ne wan tiştek da min. Lê erdê kê yê dawî bihata rakirin, xwedîyê erd li gorî derfetên xwe xwarinek xweş çêdikir. Berx, elok, dîk û mirîşk dihatin serjêkirin.

Biçercî bi tirkî dipeyvîn û ji xwe ji bo ku ji Meraşê, Konyayê

dihatin, me jî digot ew tirk in. Êvareka ku ji bo hesab çûbûm ser erdekî min dît ku du bîçercî bi kurmancî dipeyivin. Ez şaş bûm. Ew herdu kes jî heta wê hingê bi me re bi tirkî peyivîbûn. Me fêm kir ku kurmanc in, kurd in. Navê yekî Sefer bû. Piştî wê êvarê êdî em bi hev re kurmancî peyivîn.

Ev cara pêşî bû ku ez pê hesiyambûm ku kurd li Konyayê hene û min hin ji wan dîtibûn. Behsa gundên xwe, eşîrên xwe dikirin. Bi min tiştêkî nû bû. Wilo di bîra min de ye ku sala dîtirê jî hatin. Êdî min dizanibû ku kurmanc/kurd ne tenê li Diyarbekir, Mêrdîn û Batmanê, li Konyayê jî hene. Lê çima li wê derê ne, ji kengî ve li wir ne, fikreka min ya zelal çênebûbû.

Mala me li gund bû û ez di 1972an de, êdî li Diyarbekirê diçûm lîseyê. Sala pêşî birazîyekî min jî dest bi xwendegeha navîn kir. Dayika min jî li cem me bû. Sala duyem, birazîyê min xwendegeha mamostatîyê qezenc kir û çû Erxenîyê. Kekê min li Adapazarîyê li gundekî navçeya Akyazîyê mamosta bû. Li ser daxwaza wî ji bo lîseyê temam bikim, di sinifa talî de çûm wê derê. Dayika me jî bi me re hat.

Roja dîtirê çend jinên gund hatin bixêrhatinê. Dîya min ji bilî çend gotinan, bi tirkî nizanibû. Di rewşên wisa de mirov bi hemû zimanê dizane, dipeyive û hêvî dike ku yê himberî me, me fêm bike. Tê bîra min dema ez nû hatibûm Almananyayê, min bi çend gotinên îngilîzî dest pê dikir ku ew diqediyay, bi tirkî, paşê bi kurdî û axirê çend gotinên erebî ji devê min derdaketin. Ku tirkîya dîya min qediya, herdu alîyan jî dest bi zimanê xwe kir û ji bi tirkî qenctir hev fêm kirin.

Zimanê pê dipeyivîn, bi min pêşîyê weke kirmanckî /zazakî hat. Navên tiştan weke hev bûn. Nan, nan, av av, hêk hêk bû. Lê jihev fêmkirin ji bo me herdu alîyan jî zehmet bû. Dema min li farqînê li Yatîlîyê dixwend, hevalê me ên ji Pasûr û Hezroyê bi kirmanckî dipeyivîn û ev zimanê ku li vî gundî dihate axaftin, dişîbiya zimanê wan.

Em hatibûn gundekî kurdan. Navê gund *Yazılıgürgen* bû. Gund di navbera Akyazî û Karapurçekê de bû. Gundîyan xwe ji eşîra Şêxbizînî dihesiband û zimanê xwe jî Şêxbizinkî bi nav dikirin. Lê li derûdorê gund, weke gundê kurdan dihate binavkirin. Wan digot:

ew Şêxbizinî ne, xelkê jî digot: ew kurd in.

Gund li ser rêya Akyazî û Karapurçekê hatibû avakirin. Camîyek, dibistanek û yek ya ciwanan, yek ya navseran û yek jî ya kalan sê çayxaneyên gund hebûn. Camî û dibistan li himberî hev bûn û navenda gund bûn. Dora 50-60 mal bûn. Lê ji gundê Harmanlîyê heta Ahmetlerê ku Yaziligurgen di navbera wan de bû, li herdu aliyên rê mal hebûn. Tevî wan malan hejmara malên gund zêdetir dibû. Gundî di nav xwe de bêistisna bi zimanê xwe dipeyivîn.

Li her malekê mihaqeq yek-du debance hebûn. Rojeke ku ez hêj nû çûbûm, li çayxaneya ciwanan minaqeşeyek derket. Paşê şer kirin, derketin derva û dengê teqînê hat. Her yekî jarjûra xwe vala kir. Min ji xwe re digot, niha çend kes hatine kuştin, çend jî birîndar bûne. Dengê debancan qut bû. Em derketin derva. Tişteke nebûbû. Teva berê debanca xwe dabû qaçayê çayxanê û ew weke moxilê qul kiribûn.

Li gund ên erdê wan ji yên dinê zêdetir, malbatên nifûsa wan ji yên dinê pirtir hebûn. Lê pirayîya wan mirovê hev bûn. Kesî xwe mezinê

gund nedidît. Kesî li kesî neheqî nedikir. Kesî kesek dinê biçûk nedidît. Ez nizanim ji îhmalkariya wan yan jî ji sedema kurdbûna wan bû, li gel elektrîk kişandibûn gundên cîran, hêj elektrîk nehatibû gund. Dîrekên elektrîkê anîbûn, lê heta em li wê bûn, jî elektrîk nehat gund.

Herçi bi dirêjîya du sed- sê sed salî hatibûn xerîbîyê, irf û adetên xwe, zimanê xwe parastî bûn. Li gund çend malên laz û gurcî jî bi cîh bûbûn. Ji xwe ji Akyazî heta Duzceyê dever, deverêke tevîhev bû. Tirk, kurd, boşnak, çerkez, abaza, laz, arnawid, tatar, gurcî û roman li vê herêmê bi cîh û war bûn. Paşê em pê hesiyan ku li Akyazîyê şeş-heft gundên dinê ên kurdan hene. Li Akyazî û Karapurçekê her kesî dizanibû kîjan gund gundê kurda ye û wan jî tu carî kurdbûna xwe venedişart. Bi qasî di bîra min de ye gundên kurdan ev bûn: Teke-taban, Yuksel, Potuklar, Eskibedil, Kumkopru, Karaçali. Dibêjim qey di wan salan de gundê herî mezin ê kurdan Teketaban bû.

Bûkan li ba xwesû û xwezûrên xwe ranedihiştin zarokên xwe, bigirîyana jî şîr nedidan wan, ew aş nedikirin, bi wan re nedilîstin. Ev

yek şerm bû. Lê wekî dî li gorî de-
vera me, gelek lîberal bûn. Li nav
erd û zevîyan keç û jin dixebitîn.
Têkilîyên jin û mêran, keç û xortan
ji alîyê me hêsantir û vekirâtir bûn.
Li du çayxaneyan alkool dihate firo-
tin û yê n vedixwarin di hedê xwe
de vedixwarin.

Camîya gund hebû lê cemaeta
wê tunebû. Bi navê Ahmed Xoca
melayekî gund hebû. Xaniyekî
delal ava kiribû, lê ew di odeyeke
di hewşa camîyê de dima. Em jî
kirêcîyê wî bûn. Çayxaneya ka-
lan li kêleka camîyê bû. Ji hewşa
camîyê bi wan re sohbet dikir. Wî-
sa di bîra min de ye ku gundî tenê
diçûn limêja îdê. Di remezanê de
ên bi rojî jî ên fîtar jî hebûn. Zex-
tek, zorek tunebû. Ji bo limêja îdê
ez û kekê xwe jî çûn camîyê. Xort
li devê derî civîyabûn, lê derbasî
camîyê nedibûn. Piştî mezinan du-
sê caran gazî wan kir, paşê derbas
bûn. Ahmed Xoca hêj nû dest bi
waizan kiribû, bû pisepisa xortan.
Xwedê giravî mela dirêj kiribû.
Tiştêk wîsa li devera me ne mim-
kin bû.

Ahmed Xoce ayetên dixwen-
dîn, şaş dixwend. Axirê limêj xilas
bû. Xort li devê derî sekinîn û îda
temamê cemaetê pîroz kirin. Roja

îdê li mêrga gund hêlekan danîbûn.
Keç û xortên gund li wê bûn. Her
carê keçek û xortek diçûn ser
hêlekanê û xwe kil dikirin. Kilam
digotin, davêtin ber hev, direqîsîn.
Ahemd Xoce, ne li medresê ne jî
li Îmam Xetîbê xwendibû. Li gor
gotina wî, li navçeya Mêrdînê,
Nisêbînê eskerî kiribû. Ji eskerîyê,
ji talîma eskerî hez nekiriye, li ser
pirsa fermanîdarê wan ku kî dikare
li pêş wan limêj bike, gotiye; Ez!...
Lê nizanibûye. Çend înan li ser hev
çûye ba melayekî û hin tişt ji wî
fêrbûye. Di rastîyê de gundî jî xiz-
meteke zêde jê hêvî nedikir.

Gundîyan debara xwe bi çandînê
û xwedîkirina heywanan dikir. Ga-
ris, petat, pîrase, gêzer û lehane
diçandin. Pez û dewar xwedî diki-
rin. Darên sêv, hirmî, bindeq, tirî
û kestaneyan hebûn. Min dara tirî
cara pêşî li wê dît. Hatineke dinê ya
gund berhevkirina beq û qepûşkan
bû. Keçan qepûşk, xortan jî beq
berhev dikirin û dibirin difrotin
kargehên Adapazarîyê. Ez jî çend
şevan bi wan re çûm nêçîra beqan.

Çewa li alîyê me adet bû, li vî
gundî jî li mamostayên gund xwedî
derdiketin. Bi taybetî çend malên
gund heftê carek du car, an çend
hêk, an çend sêv, serîyekê lehanê,

an tasikek mast dianî mala me. Ava gund ji bîra camîya gund bû. Keçên gund nedihîştin ku dîya min avê bîne, her carê yek ji wan dihat û ava me dianî. Ji ber bi roj ez û kekê xwe ne li mal bûn, gelek caran jin dihatin serdana dîya min. Dibe ji ber em kurd bûn, wisa zêde bi ser me de dihatin.

Li gund qesab û dikan tunebûn. Ji mehê carekê yekî karek an berxek ser jê dikir û goştê wê difrot. Xwarinên wan pirayî bi sebze bûn. Lê bacanên reş, xirtik, îsot nas nedikirin. Gelekan ji wan cara ewil xwarinên bi bacanên reş, xirtik û îsot li mala me dîtin.

Hevalên min li gund çêbûbûn û têklîyên me gelekî baş bûn. Recep, Fîkret, Dursun, Ramazan, Hamît, Husên, Şahan hin ji wan bûn. Ji ber em kurdên Diyarbekirê bûn, qederek zêde didane min. Me bi hev re bi gogê dilîst, em diçûn masîyan, em bi hev re digeriyan. Lê ji ber min alkol venedixwar, min bi kaxezan nedilîst, bela xwe di keçikan nedida, hevalên min ez zêde miteasib û hinek jî saf didîtim. Ji gund sê xortên dinê dihatin lîseya Akyazîyê. Em bi hev re diçûn û dihatin. Sibehan dolmîşek ji Karapurçekê dihat, em dibirin û

êvaran jî em vedigerandin. Milekî şofêrê dolmîşê tunebû. Jê re Kolsuz Kahraman digotin.

Di lîseyê de xwendekarên faşîst û nîjadperest gelekî serdest bûn. Yek ji Erzeromê, birayê wî jî mosta bû û kurd bûn, ên dinê ji deverê, em pênc-şeş xwendekarên weke şoreşger û çepgir dihatin nas- kirin hebûn. Faşîstan neheqî li me dikir, rojekê êrîşî me kirin. Xortên gund pê hesiyan û neh-deh ji wan tevî debanceyên xwe hatin lîseyê. Xwendekarên faşîst-nîjadperest dît ku piştî me heye. Wilo dev ji me berdan. Bi qenaeta min ji helwesteke siyasî wêdetir, ji bo min hatibûn.

Heke xortekî û keçekê hez ji hev bikira û biryara zewacê bidana, ne weke ku li ba me adet bû, nedîçûn keçik nedixwestin. Keç û xort bi hev re direviyan, diçûn gundekî din, cem mala meriv an dostekî xwe û paşê ew diketin navberê. Li hev dihatin û axirê daweta xwe çêdikirin. Di dawetan de klarnet û def hebû. Ji Adapazarîyê koçek dianîn. Di dawetan de govend nedigeriya. Direqîsîn. Mûzîka li dawetan lê dida, bêtir awaz û meqamên mûzîka romanana bûn. Ku li gund dawetek hebûya ji gundên kurdan gelek keç

û xort ji ber xwe ve dihatin dawetê. Dawetên wan lewma qelebalix dibûn. Pir sîleh berdidan. Keç û xortan di dawetan de hev didîtin, hev nas dikirin, dil digirtin.

Li gund dibistana serate hebû. Piştî dibistana serate zarokên xwe nedişandin dibistanê. Herçi dibistana navîn li Karpurçekê hebû û Karapuçek tenê sê kîlometre dûrî gund bû û çûnûhatin ne zehmet bû, tenê keçîkek diçû dibistana navîn. Du birayên hev, sê xort jî em tev de diçûn Lîseyê Akyazîyê. Li gund hêj kesekî lîse qedandibû tunebû.



1973, Mamosteyên gund, Celalettin Oncu û Omer Sandal

Him li gund û him li deverê hin nav pir zêde dihatin bihîstin. Ji navê jinan; Emîne û Fadîme, ji yên mêran Dursun û Alî pir bûn. Wekî dinê jî bernavkê gelek kesan hebû; Kral Huseyin, Sari Alî, Tilkî Alî, Korelî Alî hin ji wan bûn.

Ez havîna 1975an de qederê mehek û nîv bi serê xwe li gund bûm. Wextê min gelek bû û di vê demê de ez û xortên gund, mezinên gund bêtir bi hev re bûn. Ez gelek caran diçûm çayxaneya kalan. Pênc-şeş kes bûn. Berî nîvrokî dihatin û piştî esir diçûn malên xwe. Mirovên xweşsohbet bûn. Henekçi bûn. Min jiyana wan, serpêhatîyên wan mîraq dîkir. Di derbarê tarîxa xwe û gund de pir tişt nizanibûn, lê çîrok û serpêhatîyên wan ên eskerîyê nediqediyan. Hinan ji wan li alîyê me eskerî kiribûn. Zêde xweşbîn bûn, ji xeman dûr bûn.

Wê salê yek ji wan li gund, çûm sê dawetan wan. Dawetên dinê jî yek li Teketabanê û ya dî jî li Potuklarê çêbûbû. Dursunê mîrê Henîfeyê ku bernavkê wî Deniz Gezmiş bû û dolmîşa wî hebû, eskerîya xwe li Farqînê kiribû û di çûnûhatina eskerîyê de li Diyarbekirê hatibû mala me. Wî ez wê havînê bi dolmîşa xwe

li hemû gundên kurdan, Hendek, Adapazarî û Duzceyê gerandim. Em bi hev re derketin nêçîra beqan. Jina wî Henîfeyê jî hêk û mast ji mala min kêr nedikir.

Ez salekê li wî gundî mam. Lê bi hestên gelek xweş û qenc ji wan veqetiyam. Min li wî gundî xwe xerîb hîs nekir.

Di zanîngehê de hevalên min yê ji kurdên Konyayê çêbûn.

Li Almanyayê hejmara hevalên min zêdetir bû. Me li gel kurdên Başûr, Rojhelat û Rojava, kurdên Konyayê, Haymana, Kirşehîr, Samandag, Samsun, Aksaray û Kayserîyê bêtir nas kir. Em dîroka wan ji wan hînbûn. Di têkiliyên me yê li dervayî welêt, me bi zelaî dît, bê kurdên Anatolîyê çiqas dildar û dilsozên zimanê xwe ne. Çiqas bi çand, irf û adetên xwe girêdayî ne.



1974, *Yazılıgürgen* dêya min bi keç, jin û zarokên gund re.

Ber êvarê bû. Roj giran giran/ hêdî hêdî diçû ava. Teşqela ber şevê zêde bû, însan li ber malan diçin û dihatin, karê xwe dikirin. Wext, bi leza karên dawîya rojê bû. Çûçik diketin pînê, pez û manga nêzikî gomê dikirin. Jin li ber xwarina êvarê bûn. Herkes li ber karê male xwe bûn. Apê Reso, di mala xwe henedihat, ji karê dinê dûr dadiwestî. Te mêzekira li ser şîva ji aliyê ozê, dest dane paş xwe, giran giran bi tenê berve mala me dihat. Di wê teşqela mehlê de Apê Reso tunebû, ew ji karê dinê dûr dadiwestî. Karê dinê da, ji wî ra tu wate tunebû. Tim xemgîn bû. Bi derd û keder bû. Ji dinê ti tahm hey-nedina. Lê ne merivekî pozbilind bû, merivekî dilnizm bû. Mala xwe li hêla mizgeftê bû, lê nediçû mizgeftê. Mizgeft ji derde wî ra nedibû derman. Wî dizanî, li vê dinê tiştên gundî yên wî nedîtîni, wî dîtîni e. Tiştên wan nedizanî wî dizanî. Ew tiştê dizanî, derdên giran di dilê wî da, mejoyê wî da cihekî mezin digirtine. Dixwast hevalekî

derdên wî fehm bike, wî fehm bike û guhdarî ya wî bike wî hebe.

Bavê min, bi salan ji Apê Reso gelekî biçûktir bû. Lê qîmeteka mezin dida Apê Reso. Ji Apê Reso pir hez dikir, guh dida ser wî û ew pir caran dikire mîvan. Di wê teşqela ber êvarê da Apê Reso, pir rojan dihate hundirê mala me. Bavê min, ew li jur odê rûnişkandî da. Bavê min, dizanî ew î tim bi keder û xemgîn bû. Ez ne şaş bim, rojeke sala 1976a bû. Daqimên bavê min hebûn.

Daqimên dirêj. Apê Reso dizanî. Li jur odê rûnişt û got:

“Bilo, ji min ra cixale û daqimekî dirêj bîne”.

Bavê min, jê ra daqimekî dirêj û cixalek anî. Cixale kire serê daqim û vêxist. Daqim, giran giran bi esaleteka mezin kire devê xwe û dûmana cixalê kişand. Kûr kûr kişand û dûman ber da. Ezî wê demê zarok bûm. Û tê bîra min, daqimgirtinî û cixalekişandina Apê Reso, min heyran heyran temaşe dikir. Devê daqim berjur dikir û dûman dikişande hundirê xwe, paşê

ew dûmana bi kesereke kûr berdida. Dema navber didayê, qala demên berê dikir. Deng dikir, xemgîn dibû, zîz dibû, çav tijî dikirin. Lê min pir fahm nedikir. Ew ji bo çi ye. Min bi xwe xwe digot “Apê Reso, çima tim bi derd e û xemgîn e”.

Dîsa Rojekê, hatibû mala me. Demsal zivistan bû. Berfî li herdê bû. Bavê min demeke nêzikî ji bajêr hatibû. Rojên sersalê bûn û bavê min ji bajêr teqvimê anî bû. Ev teqvimê, dayê min li dîwar dardaxistibû. Teqvim ji 12 rûpelan bû û li her rûpelekî wêneyek hebû. Apê Reso rûnişt û dîsa bi daqimê dirêj cixale vedixar û çavê wî li teqvimê ket. Mêze kir û got:

“Bilo, carekê bînin, ez li wê teqvimê mêze kim.”

“Kurê min ev çiya çiyayên Munzûrê ne, min li vira eskeri kir, li ber çavên min pir kurmanç/ kurd kuştin, li ser hevdu kuştin, zar û zêç, kal û pîr negotin li ber çavên me kuştin, ji bîra min qet nare, tişt ji dest min nehat, ez li wira mam. Bi rastî jiyan ji min ra li wira qediya...”

Bave min teqvim ji dîwêr heyne û anî da Apê Reso. Li wêneyê rûpela yekemîn mêze kir û tiştek negot. Rûpela duyemîn mêze kir, dawestî, dawestî mat bû. Pir mêze kir tiştek negot. Lê li rûpelên din mêze nekir. Di



Çiyayên Munzûrê

wê rûpelê da çiya hebûn. Ez jî mêze dikime, Apê Reso tişteki bêje lê tişteki negot. Bê deng ma, sûretê xwe xemgîn bû, tu yê bêjî, serê wî çû dereke din. Bavê min got:

“Apo çi bû, çima tu li wêneyên din mêze nakî?”

Bêdeng ma, teniskê navber ketê, bersiv da bavê min û got;

“Kurê min ev çiya çiyayên Munzûrê ne, min li vira eskeri kir, li ber çavên min pir kurmanç/kurd kuştin, li ser hevdu kuştin, zar û zêç, kal û pîr negotin li ber çavên me kuştin, ji bîra min qet nare, tişt ji dest min nehat, ez li wira mam. Bi rastî jiyan ji min ra li wira qediya...”

Çav dîsa tijî kirin û ji cixala xwe kesereka kûr kişand. Demeka dirêj tişteki negot û bavê min jî bêdeng ma.

Çar kurên Apê Reso hebûn. Navê yekî ji wan Başo bû. Le Apê Reso jê ra nedigot Başo. Digot Dersim. Kesî fahm nedikir çima bi kurê xwe yî Başo ra dibêje Dersim. Le ji wê rojê şunva min fahm kir ku çima dibêje Dersim. Wî dizani derdê xweyî giran, bi wî navî sivik nabe. Le a ji dest wî dihatî ew bû..

Apê Reso, li vê dinê tiştên pir giran dîtibûn. Bejîtîya însanan dîtibû.

Durûtîya însanan dîtibû. Meriv merivan dikujin, zarokan, jinan dikujin. Le kes tişteki nabêje. Him van tiştan dibînin, him jî tişteki nabejin. Ji bo wê, ji oldaran hez nedikir. Pismamekî xwe hebû. Navê wî, Mille bû. Oldar/dindar bû. Tim diçû mizgeftê, rîyê dirêj berda bû. Li cemaatê rûdinişt, tim qala dîn dikir û pismamê xwe bi Apê Reso ra digot:

“Tu çima narî mizgeftê? Mizgeft li hêla mala te ye.”

Rexnên wisa dikirin. Carek ne, du caran ne ew gotinan tim dibûn. Rojekê, dîsa di nav cemaatê da bi Apê Reso ra, va gotinana kirine û Apê Reso teqîye û gotiye;

“Lo kurê bê eşo, rîdirêjo, cennet-cehennem çima derxistin e tu fahm nakî. Eşê te di berda nare. Ji bo dînikê mîna te derxistine. Ma dînikê mîna te li vê dine bitirsîn, rehet dawestîn ji bo wê, cennet û cehennem derhistine. Dema em mirin, xwelî bi serê me kirin her tişteki teva dibe.”

Pismamê Apê Reso şaş dibe çi beje, bêzîman dibe. Bersîveke felsefî ye, giran e û rast e. Bê xwandin, jiyaneke li gund lê eşên kûr, eşên bi eş.

Husîn, Eş û zarok çûne odekê, ji Colo ra jî li oda mêvana nivîn rêxistibûn. Colo biçûya kuderê kesî jê ra di oda mêvanan da nivînen mêvanan ranedixist - ne xalên wî û ne jî apanên wî. Berî ku xwe tazî bike, berê di ser xwe ra mes kir, paşê jî li nivînan. Bêhna mîzê jê nedihat lê, hê jî şalê wî lekeyek li ser bû. Bi xwe jî bîhna xwedanê jê dihat -wî jî nedizani kîngê bi ava germ û sabûnê serê xwe şûstibû. Ji xwe ra nekirê xem, giraniya xewê dabû ser çavan. Şalê xwe derxist û xwe dernexwûn avête nav cîya. Ji balgîyê bîhna lewentê û ji nivîna jî a naftalînê dihat.

Rabû ser xwe, berî ku şalê xwe li xwe ke, çû ber teqê, hê ro derneketibû, lê ne ewqas tarî jî bû. Dengê çûçikên ewro û yê mîyan dihat. Zûzû şalê xwe li xwe kir, derîyê odê, paşê derîyê derva vekir, xwe avête der. Meresên xwe kire ningê xwe, tam ji sikanê peya ba, bi gotina Husîn "Olew tu çi şaş bûyî, herî azanê bixwînî." veciniqî? Colo di ber xwe de "de were min û belê ha" go û bi ken li Husîn vege-

rand: "Na lo, tenek îşê min ê hene. Gerek ez zû herme gund." Husîn xwast ku ew nanekê bixwe, paşê bi rê keve, lê Colo bi ya Husîn nekir. Colo xatirê xwe xwast û bi reverev ji wî bi dûr ket.

Gava hate devî rê, nizanibû ku rast here yan na. Çendekê fikirî, rast biçûya wê di ser ozê Mirckê ra biçûya Sefika, di rê da yan jî Yayla Alî Axa, ji wir da jî Omera û gundên din. Rasterast tenê çem zevî û ji dûr va Yayla Malê Mihtopalê hebû. Çep biçûya, ew ê di nava saetekê de bigihîştê gundê xwe - Xelika.

Ew ê biçûya gund, ji neçartîyê. Bi gavên zûzû berê xwe da gund. Colo pir zû dimeşîya, tuyê bêjî qey gur raserî wî dide. Loma jî leqebeke wî ya din ku gundîyan lênayîn: "Condere" yê ji motorên John Dere wergirtibûn. Bê ku bêhna xwe bigre yan jî bi rê da daweste, hat gihîştê perê gund yê ji alîyê başûr va. Hê zû bû, ji alîyê rojava da ewr sor bûbûn, tu nemabû ku ro helata.

Di nav mala, vê carê ne bi lez, di kêleka goristên re, di paş dibistanê

re xwe avêt mala xwe. Dest avête derî, derî nehate vekirin. Çû ber camê, bi dengê nizm go: “Melek, Melek, ez im, Colo, derî veke.” Melekê deng neda, lê di teqereqê ra meriv dizanî ku ewê hişyar e. Tiqî bi derî ket û Colo xwe avête hundir. Melekê bi çavên hê xew li ser li Colo mes kir, xwast pirs ke, ka bê ew çi halî wî ye, bi şev li ku bû. Lê şûna wê tenê got «cîhê te çêkim?» Colo got: “na, ka avekê bide min.” Colo ava xwe vexwar, Melek jî bêdeng çû dîsa kete nav cîya.

Cola çû li ser kevirê li ber argûn rûnişt, destê xwe da ser çokên xwe û kete xem û xeyalan. Çima, wî jî nedizani, gava bi tenê dima, diya wî dihate bîra wî. Hertim jî ew serpêhatîya mêrat ku di dilê wî de bûye kul.

Ew î biçûk bû, bi topê dilîstin. Çi bû, wî jî baş nedizani, Kemoyê Heske, Kemoyê poz nikul ku kêmtir deh salan ji wî mestir, bi kuteke hîrmkî yek li nava serçav dabû. Xwîn bi serçavê wî ketibû. Berî ku Kemo dîsa lêxe, Colo berve mal reviya. Dev û bivîlên tijî xwîn bûn. Ew ê bihata, biketa hembêza dayîka xwe û gilîyê Kemo bikira. Li wê oda ku ew niha tê da ye, diya wî jinên cîranan va rûniştibû. Gava

Colo jinên cîranan dît, hiskîniya wî hatibû birin. Wî li diya xwe û li jinên din mes kiribû û xwe ji fedîya avetibû der. Çûbû xwe dabû ber sîya dîwarê xarime. Dîsa hîskehîska wî bû, lê nedigirîya û tu cîhên wî jî nedişîyan. Çavên wî li derî bûn, li hêviyê bû ku diya wî derkeve û were ba wî. Divê ew bihata, Colo hembêz kiriba û ew bidaya ber dilê xwe, jê hez kiriba. Lê na, diya wî li ba hevalên xwe bû têrka gotinê ne fikir. Colo di cîhê xwe da xwe sor fikir: “Çima, dev pozê min ên tijî xwîn in, ew çima nayê? Çima nayê pirs nake ka çi hatiye serê min? Di cîhê xwe de bûbû bazût. Heta ku wî ew dengê nas bihîst: “Colo, te çi mirûz kirîye xwe?” Ev Fat bû, ji mehla jêrîn bû. Bûka çend mehan bû. Ji Colo pir hez fikir, Colo jî ji wê. Colo ji wê ra bi dizkî diçû cixare distand, wê jî yek cara şekir dida wî û yekcara jî êmîş. Colo bi dengê Fatê ra veciniqî û rabû ser nînga. Bê ku Fat ji wî pirs ke, ka çi hatiye serê wî, Colo go: “Em bi topê dilîstin, ezî di qelê da bûm, top hat li serçavên min ket.” Fat hate ba wî, destê xwe di serî da û bi henekî go: “Tuyî veng çir bibî, rê li te nabe.” Kêfa Colo nehatiba cîh jî, xwe baştir hîs fikir. “Lê lê

Qaman, lê haya te ji vî qeregunî tune, dev pozê vî tijî xwîn bûne”, Fatê dengê xwe gîhande diya Colo. Diya Colo, Qaman hate ber derî, go: “Were lê lê, tişt bi wî nayê, ne yek e ne dudu ne, ya çok in, ya enîşk e, ya dest in, çi dizanim, her ro dereke wî yê di bin xwînê va ye. Bi vî mîna sîrpene va baş dibe. Tişt nabe, were rûne». Fatê careke din destê xwe di serê Colo da û çû kete hundir ba jinên din, Colo jî kete quncê xwe. Gotinên diya wî bi wî pir bi qar hatibûn. Fat dayîka wî bûya, wê serê Kemo bişkênaya. Diya wî jî, ne pirs kiribû ka çi hatîye serê wî, ne jî gotibû ka ewî birçî ye yan jî tî ye.

Her diçû hêrsa Colo li diya wî pirtir dibû. Ji nişka va rabû ser xwe, kevirek kire destê xwe avête derîyê malê, kevir ji wir şemitî kete nav malê. Kevirekî din girt avête cama odayê, hêrsa wî daneket, çend kevirên din jî teve camê kirin û tu cam bi pencereyê va nehîştin. Qîjîn bi ser jina ketibû. “Colo meke, Colo ez qurban, Colo ez ti dorê” gotinên jinan li Colo fêde nedikirin, heta ku şîpqinî bi binguhê wî neket, ew rehet nebû. Diya wî bû. Wê di stukurê wî ra girt û ew avête herdê. “Tu dîn bûyî? Qet tunebîyo,

te dikim qurbana wê camê. Serpecino, te xêr e?

Bi dengê Melekê dîsa hate xwe: “Colo, tu yî ji duh va li ku yî, va çi halê te ye, va çi qilêra te ye? Derxe kincên xwe ez bişom.» «Erê xwangê, erê, ka biskine, çayekê vexwim, ez ê rabim di şûyî kevim.» Colo bersîv dayê. «Çayyy”, Melekê ev peyv di devê xwe de gerand, “çay tune, tu nizanî? Ez avê bi ser dim, tu here ji dikanê momkê bistîne, were.” Melekê hêvî dikir, Coloyê bêje “erê”. Bigota “erê”, wê bizanibûya ku pereyên Colo hene. Colo lê vegerand: “Here ji malê Cemêl qedaxekî deyn bike, heta em distînin.” Ew jî li dilê Melekê nehatibû. Melekê dengê xwe nekir. “Eyy, ka bê, ka kesek li min geriya, kesî li min pirsî, ji duh vir ve?” Colo bi vê gotina xwe, him xwast şorê biguhere, him jî bizane, ka gundî bi mesela wî hesîyane, yan na. Melekê tenê go “na” û li dîndariya birayê xwe sekinî.

Bi rastî jî ne kesek li Colo gerîbû, ne jî kesekî pirsî wî kiribû. Melek xwe bi xwe fikirî “Kî li te bigere, ya du tolazên mîna te, ya jî yekî qitmirî îşê xwe wê bikeve ser te.» Colo û Melek bi heval bûn, bi cîran bûn, bi dê û dot bûn, lê tim jî bi

tenê bûn. Kesekî ji bo xatirpîrsînê li derîyê wan nedida, kesek nedihat mêvanîya wan, peyayekî aveke wan a sar venexweribû. Navê sêwîtîyê bû ku ew di nava civatê da, ji civatê dûr dixist.

Melekê dîsa ji Colo pîrs kir: “Tu bixwazî, ji te ra du hêka biqewrînim, rûne bixwe, tu yî niha birçî yî.” Bê ku li hêvîya bersîva Colo bisekine, Melek du hêk ji bin kulingê derxistin, berê xwe da aşxanê. Pir neçû tewa hêk tê da, du sê nanê sêlê va anî danî ber Colo. Colo dest avête nê, parîyekî xwe jê kir, tam di nav hêkan ra kira, ji Melekê careke din pîrsî: “Fatê jî pîrsa min nekir?” “Na” go Melekê. Melekê pir pîrs ji Colo ne dikirin, ne jî dida pê şoran. Colo jî li hêvîyê bû ku Melek ji wî pîrsan bike, loma tim gotin tîna ser xwe. Baş-xirab çî dibe ma bibe, Colo hertiştî xwe ji Melekê ra digot, gilîyên bi wê re dikirin. Melekê jî ji ber wê Colo pir baş nas dikir. Berî ku Colo devê

xwe veke, wê dizanî ka ewî çî bêje -kîngê hêrs bibe, kîngê bikene. Melek bêdeng bû, pîrs nedikirin, bêyî gilî û gazîn bû. Radibû, îşê xwe dikirin, xizmeta Colo dikir û radiket. Lê vê carê Colo ne Coloyê hertim bû, wê jî jê dervedixist, ka mesele çî ye. Derdekî wî yê giran hebû û bi ser da jî qala Fatê kiribû ku şik xistibû dilê wê. Xwe negirt, “Çî îşê te bi Fatê ketîye? Fatê xelkê çima li te bipirse?” ji Colo pîrsî û gavek paşve avêt. Colo mîna ku li hêvîya vê pîrsê be, nanê dest xwe danî û rabû ser xwe. Rabûna wî bi Melekê bi xof hat û wê gaveke din paş ve avêt. Colo çû ew hembêz kir, cirfê pê girtibû. Melekê jî cirifandina wî hîs dikir. “Melek, xwangê, etê!” Melekê dengê xwe nekir. Bi herdu destên xwe di pîyên Melekê re girt, “Tu dizanî vê Fatê çî anî serê min?” Melekê go “Na, çî?” Colo dîsa li dûrîyekê bû. Wî dil hebû dereweke xwe bikira, lê ji Melekê nediwêrî.



Mîlet mezin e

Mîlet mezin e, kulturê por meke.
Edebîya rê, belagat çixir vekir, bîr meke.

Mele, feqî, seydaya medrese çêkirin
Cezîrî, Xanî, Teyran, Seîdî Kurdî, bîr meke.

Ebu Muslim, Selahaddîn Eyyubî tenê, yek e,
Kawa, Zaloglu Rustem, Alişan begê bîr meke.

Doza kurda pir e, sitran e, destan e,
Dengbêj e, hozan e, henek e, bîr meke.

Sunnet e, dawet e, lêxin dolê zurne ke.
Bilîzin govend e, turê folklorê bîr meke

Kurd malcîna, dugun, goştî berx kay meke.
Runî pêz, postî penîr, firi, kurt, sîr bîr meke.

Xermana bîçer ke, genim biçîne, ard ke.
Bulxura sîtila rêz ke, serdayînê bîr meke.

Kurd in, comerd in, bela dike şîfa şafînaka,
Dola, mawlûda, nanî tazîya bîr meke.

Mezina hurmetê, qusûrê kême meke.
Zava bûkê, xenzûr xasîyê, saygîyê bîr meke.

Abdalbaki Xalîsînan

Tarîx

Tarîxê sahnê tim hebûn,

Hezar sala derbaz bû, bîr nebûn.

Wexta hezretî Îbrahîm hebûn,

Nîce zeman e, ka bîr nebûn!

Hezreti Muhammed e, sahabî bûn,

Gabana, zozana bîr nebûn.

Mazenderanê, Xorasanê a rêya ketin,

Rêya sor da hatin Anatolîyayê, bîr nebûn.

Çiqas zordestî be, bîr meke.

Fermendar sarok Alişan beg ka?

Çexbûn zora, Anatolîya bîr meke.

Malan bar kir, hezara kon wedan ka?

Perîşanî, meşeqata, telafa bîr meke.

Bar kirin Anatolîya, pira eşîreta ka?

Ankara, Konya, Kirşehîre bîr meke.

Îz kirin otlay, av gerîn çiya ka?

Pez, berx, hesp, qirbûn bîr meke.

Hatin Sivrihisarê, Çeltikê, Yunak ka?

Gawestîn, mal girtin, mola son duraq ka?

Kurmanca Anatolîya welat kirin.

Gawestîya, canbegîya, reşîya bîr meke!

Werin yek bin, mazîyê meke.

Zeman zû çû, bajara bûn mekteplî ka?

Bûn amîr, memûr, ama mazîyî bîr meke.

Arazî kêr bû, çûn Ewropaya bûn îşçî ka?

Şûûr yek bûn, silaya bîr meke.

Abdulkakî Xalîsînan

Peyva “ro”

Mehtab Îdelî

Zimanê kurdî zimanekî gelekî dewlemend e. Zaravayên wê em dikan wekî kurmançî, soranî, kelhorî, hewramî, kirmancî, lekî û lorî bi nav bikin. Zimanê me bi dehan devokan û bi hezaran peyv û gotinan di hundirê xwe de dihevine. Bêguman ew jî zimên dewlemend dike. Di nav de hinek peyv hene ku di kurdîyê de wekî hev standart in. Ê hinek peyv jî li gor zaravayan û devokan tên guhartin. Ez dixwazim îro li ser peyva “ro” ya di devoka me Anatolîya Navîn ya berfîratî de û di devok û zaravayên din de çawa bi kar tê bisekinim.

Peyva “ro” di nav kurdên Anatolîya Navîn yê kurmanç de bi çend maneyan tê bikaranîn.

Mînak;

1. Ro (24 saet, şevûroj)

Mînak: di mehekê de 30 yan 31 ro hene.

2. Ro (roj, tav): stêrka ku ronahî û germiyê dide dinyayê.

Mînak: îro ro derketiye, hewayî xweş e.

Ro îro dereng ava bû.

3. Ro (ro, roj): dijraberî şevê.

Mînak: em ê sibê bi ro herin bajêr.

Bi şev, bi ro li benda me bû ku em werin.

4. Ro (çem, çemên biçûk)

Mînak: dema çûn hirîyê bişon, av pir bû hirî bi ro de çû.

5. Ro (lehî)

Mînak: Baran barî pez û dewarên gund bi ro de çûn.

6. Ro (ronî, ronayî, ronahî)

Em dikarin herin, her der (alî) hîn ro ye.

7. Ro (bi mecazî): Her tiştê/ê boş ya/yê diherike û diçe.

Mînak:

Hatin tiştên wan talan kirin, dizîn hemû kêda wan bi ro de çû.

Dema zevîyên wan ji aliyê dewletê hatin şewitandin, hemû kêda wan

a salekê bi ro de çû.

Xêra bike, bi ro de ber de.

8. Robûn: Ji bo wefatkirina mirovan tê gotin.

Mînak: Ez hê biçûk bûm, bavê min ro bûbû. Dîya min bî, ez û birayê xwe sêwî man.

Ro di erdnîgarîyê de, robar, rûbar, çemên biçûk an jî, ava ku diherike ya ji çeman biçûktir, lê ji coyan mezintir (bi gelemperî li çiyayên peyda dibe û diherike ta digihe deryayê).

Co: Erx, ava kêr ya diherike. (bi taybetî ya ku jî baranê çêbûye û piştî demek ne dirêj dîsa diçike yan jî ava ku berdidin ser zeviyan.

Wateya "ro" di nav zaravayên din û li heremên din de wekî ro, roy (zazakî), robar (mînak li herema Colemergê), rûbar (sorani).

Di zimanên din de; Farisî (rûd), pehlewî (rot), hexamanşî (rewteh), avestayî (rewde), sanskrîtî (srevetî: herrikîn), ermenîya kevn (aru:co, co-bar) û (arogem: avdan), îrlendîya kevn sruth(ro, robar), lîtwanî sravêtî (herikîn), yûnanîya kevn (rêw: herikîn û ruomos: rîtm), polonî strumien (ro,robar), rûsî (ostrov: girav), inglîzî stream (ro, robar, herik), almanî strom (ro, robar), swêdî ström (ro, robar).

Di vir de xuya dike ku hemû proto-hind û ewropî "srew- (herrikîn; ro)

Jê

.robar

.robarî

.royî

Li hinek hereman jî çemên wekî Ferat û Dijle direkt bi peyva "ro" an "royî" bi nav dikin.

Mînak: zazayên Siwêregê ji çemê Feratê re dibêjin ro, royî. Wekî di stran û helbestên Kadir Buyukkaya de derbas dibe "Vengê royî/Dengê Feratê".

Wekî peyveke serbixwe, forma standard ya zimanê nivîskî "roj" e, ne "ro" ye.

Lê di kurdîya Anatolîya Navîn de zimanê devkî û ya nivîskî de "ro" ye, ne "roj" e.

Çavkanî: <https://ku.m.wikionary.wiki>, wîkîferheng.

Jin weke Xwedê ne... dixwazim bibêjim mîna yek ji wan hîkmetên Xwedê ne ku bi tevayîya temenekî xwe î dirêj jî meriv nika-ne wan fahm bike. Şeyma xanim jî yeka welê ye.

Ji gelek salan û vir ve wê nas dikim, lê ti carî jî ne weke îro. Îro dîsa mêvana min e. Piştî şîvê em hatine li salona malê rûniştine. Şeraba ku ji ber şîvê di piyalên me de maye, hîn jî li ber me ye. Ne tenê li ser dostanîya xwe, em li ser gelek tiştên dunyayê jî dipeyivin û me kwîr vedaye. Dengê nûçeyên êvarê jî televîzyona salonê bilind dibe.

Pêşîyê zêde bala me nakêşe, lê dûre li ser nûçeyeka sereke Şeyma xanim awurên xwe dikute ekrana televîzyonê û welê guhdarî û temaşê dike: Serokwezîrê Kurdistanê hatiye Ankarayê. Evê carê alaya Turkiyeyê û alaya Kurdistanê li kêlekên hev, serokwezîrên van herdu welatan jî li pêşberî hev rûniştine. Mijara ku tê peyivîn koçberî û penaberên welatên şer e. Herdu serokwezîr dipeyivin ka ew ê çawa alîkarîya hev bikin ku bergirî

û pêwîstîya belengazîya penaberan çareser bikin. Evê mijarê jî herdu serokwezîr bi alîkarîya tercumanekî dikin. Bala min li Şeyma xanimê û sûretê wê î baldar e, lê guhê min li ser gotinên serokwezîran e.

Tiştê ku zêdetir bala min dikêşe ew e ku dibînim çavên Şeyma xanimê tije av bûne. Ji ber şeraba îşevîn e, an ji ber mijara belengazîya penaberên welatên şer e... ez nizanim. Dûre li tiştên din dihizirim û di xwe de dibêjim: ku ev herdu kesên dipeyvîn ne serokwezîrên du welatan bûya, ez ê têketama gumanekê ku li wextekê Şeyma xanimê pêwendîyeke xwe û van ciwamêran hebûye û anuha jî bi bîr tîne. Lewra dizanim ku ti carî polîtîkayê bi qasî îşev bala wê nekişandîye. Çi hîkmet e, ez nizanim, lê anuha ew bi baldarîyeke bilind li ekranê mêze dike û ez jî bi baldarîyeke welê li wê mêze dikim... ji bo ku têbigêhîjim.

Piştî ku ev nûçeya sereke diqede, Şeyma xanim axîneke ji kûrahîya dil dikêşe û pişirîneke efsûnî li ser lêvên wê diyar dibe:

pişirîneke ji salona malê dûr, ji wê êvara me dûr, ji wê dîmensiyona me dûr... pişirîneke weke pişirîna Mona Lîsayê ye, meriv têdernaxe ka ew pişirîn ji kêfxweşiyê ye an ji xemgînîyê ye. Lê çavên wê î kespikî hîn jî bi av in... weke ava Kahnîya Sipî pîrozwer.

Ji bo ku rastîya vê yekê bizanim, ez deng li televîzyonê kêr dikim û bi mereqdarî jê dipirsim:

– Eve çi bû, Şeyma xanim... çima te xemgînîyeke welê, melankolîyeke welê li xwe daye der?

Ew êdî şerm nake, radihêje destmaleke li ser maseyê, mîna ku devê xwe paqij bike, li min mêze dike, ava di çavên xwe de vedimale û dibêje:

– Ne tiştekî girîng e, tenê tiştek hat bîra min û dilê min keliya.

Vê carê bêtir lê dihizirim: aya evê jinikê çi dît, çi bîranîna wê û van serokwezîran bi hev hebûye? Ji tercumanê wan jî dikevim gumanekê, lê ez nikanim vê yekê yekser û bi awayekî vekirî bibêjime wê. Ev kela dilê wê tatûleke bêtir li min peyda dike û dîsa dibêjimê:

– Ku ne tiştekî zêde vaşarî û arizî be, dixwazim ewê kela dilê te bizanim, Şeyma xanim... ka bibêje, çi bû, çima dilê te keliya?

Mîna ku li neynikekê mêze bike, Şeyma xanim li kefa destê xwe î çepê mêze dike û bi pişirîneke sergirtî:

– Çîrok dirêj e... dibêje, dev jê berde!

Ev gotinên wê mereqê li min zêdetir dike û tenê bi tirs û bi pîrs li wê mêze dikim û hinekî jî sil dibim... deng nakim. Û bawer dikim ew jî di wê gavê de evê rewşa min têdigêhîje û loma dibêje:

– Ku tu bikanibî guhdarî bikî, ez ê vebêjim?... hinekî dirêj e.

Bi tatêl û hinekî jî bi tengijîn dibêjimê:

– Ez dikanim guhdarî bikim, Şeyma xan... tu vebêje.

Û Şeyma xanim ewê destmala kaxizîn dîsa di çavên xwe ên avî re dide û her bi wê pişirîna xwe ya efsûnî vedibêje:

*

“

Ew çi rojeke teng û diltengîn bû, Xwedê... çi rojeke reş û şil bû! Di xwe de digiriyam û ji çavên xwe bêtir min ji dilê xwe hêsr dirijand. Li gel ku rojeke bi ro û ronahî bû jî, reşbûn û bêhtengîya wê rojê, eve sî û sê sal in, rasterast ji sî û sê salan zêdetir e ku di bîra min de ye... weke îro li ber çavên min e.

Ewê rojê... roja ku dapîra min li dibistanê destê xwe li porê min peland, ez li cîh hiştim û ji hundurê sinifê derket, di wê gavê de sinif jî û dunya jî li wî salê min î piçûk teng hat û hertişt li ber çavên min reş geriya. Li gel ku dapîra min soz da min ew ê piştî nîvro were û min bibe malê jî, kela dilê min î teng sar û sivik nebû. Ez lê fikirîm ku ji sinifê derkevim der, heta malê li pey dapîra xwe biqîrim û bibezim. Ez li hêzeke efsûnî hizirîm ku baskên balindeyekê bi min ve bike, ez pê bifirim û ji dibistanê birevim. Lê ne hêzeke efsûnî, ne jî baskên balindeyekê... tişteke bi min ve xuya nebû û ez jî bêhêvî û bi ewê xemgînîya xwe di sinifê de mam.

Dema ku mamosteya sinifê dît bê ez di çi rewşê de me, ew hêdika hat û weke dapîra min, wê jî destê xwe li serê min peland (destê wê weke destê dapîra min nedilerizî), bi diloanî bi min da zanîn ku ne pêwîst e ez bigirîm û xemgîn bikevim: lewra li vir hevalên min ê çêbin, ez ê fêrî tiştan bibim û ji dibistanê hez bikim.

Ewê roja pêşîn... heta piştî nîvro jî ez bi kesekî re nepeyivîm, ez ji hundurê sinifê derneketim der. Ez her giriyam û li hêvîya hatina

dapîra xwe mam. Û ew danê wê sibehê çi wexteke dirêj bû! Piştî dirêjahîya danê sibehê, bi gotineke din bi wexta nîvro re, dema min çav bi dapîra xwe xist, ji hertim bêtir ez giriyam û ji her carê bêtir min xwe bi hemêza dapîra xwe ve şidand. Dûre... piştî ku mamosteya min jî ez hemêz kirim, (bêhneke xweş ji mamosteya min dihat) destê min di destê dapîra min de û em ber bi malê ve çûn.

*

Roja din sibehê dema ku dapîra min dîsa serçavê min şûşt û ji porê min î dirêj gulîyên min dihûna, min têderxist ku ez ê dîsa biçime dibistanê. Di hûnandina her gulîyekî min de tenê Xwedê dizane bê ez çiqaşî bi tirs û bi xem bûm. Lê dapîra min li ber dilê min dida, wê jî weke mamosteya min dixwest ez bawer bikim ku ez ê hînî tiştan bibim, hevalên min ê çêbin û ez ê ji dibistanê hez bikim.

Di vegera dapîra min de, li dibistanê dîsa bi tenê mam, dîsa dilê min teng bû û dîsa çavên min tijî bûn. Ku hêsir jî ji çavên min nehata xwarê, kesekî nedizana ez digirîm: bêdeng û ji dilekî bêzar di xwe de digiriyam... weke sergînê ku di xwe de bişewute. Mamosteya

min hat, ez hemêz kirim, li ser çoga xwe cîh da min, destê xwe li serê min peland, yek bi yek ew hemû gulîyên ku dapîra min hûnabûn, bêhn kir (lê bêhneke xweş ji porê mamosteya min dihat) û di kefa destê xwe de bir û hanî. Dûre bi min da zanîn ku porê min xweşik e, gulîyên min xweşik in û ji min pirsî ka ez dikanim wan gulîyên xwe bihejmêrim. Min tilîyên destê xwe î çepê hejmart û ji mamosteya xwe re got:

– Pênc.

Lê wê bi kenekî hûr dîsa weke tayên axpandirê yek bi yek gulîyên min kire nava destê xwe, nîşanî min da û bi deng hejmart: yek, dudu, sisê, çar, pênc û... şeş, heft. Herweha di van du rojan de ez fêrî du peyvên nû bûm: şeş û heft, fêr bûm ku porê min li ser heft gulîyan e. Mamosteya min dîsa bi min da zanîn ku porê min kej û gulîyên min xweşik in:

– Keçê, got, tu çiqas şîrîn û xweşik î... rasterast weka min î.

Min bi mamosteya xwe bawer dikir, ji neynikan bêtir min bi wê bawer kir ku ez jî weke wê me: porê min kej û çavên min kespikî. Xwedê dizane loma wê jî zêde kir... li gotinên xwe zêde kir û got:

– Dirûvên te li min diçe û êdî tu keça min î. Ma tu naxwazî bibî keça min?

Min serê xwe di ber xwe de hejand ku ez dixwazim bibim keça wê. Û ez bûm keça mamosteya xwe. Mamosteya min yeke xweşik, kubar, kej... û hertim jî bêhneka xweş jê dihat.

*

Her cara ku ro hildihat û dibû rojêke nû, êdî giriyê min û xemgînîya min a ji dibistanê jî kêmtir dibû. Wek ku dapîra min û mamosteya min digot, ez fêrî dibistan û gelek tiştên din jî bûm. Ji dibistanê, ji mamosteya xwe, ji hevalên xwe xweş û kêfxweş bûm êdî. Porê hinek ji hevalên min weke yê min kej û du kes jî bi por û erdê xwe weke nanê şewutî bûn.

Roj hatin û roj çûn. Weke keça mamosteya xwe ya xweşik, di her rojêke nû de ez fêrî gelek tiştên nû bûm. Lê rojekê... rojekê mamosteya me ji me zarokan pirsî ka kî ji bilî zimanê tirkî bi zimanekî din dizane. Gelek dûre fêr bûm ku di sinifa me de ji Holandayê, ji Îngilîstanê, ji Fransa û Almanyayê zarok hene, bi zimanekî din jî dizanin ku ew ziman ne tirkî ye. Ez fêr bûm ku ev dibistan taybetî ye û ji bo zarokên

wusa ne: dayik an jî bavê hinekên ji wan jî qet ne ji Îstenbolê ne. Lê hîn jî... anuha jî nizamî bê ez çawa ketibûm wê dibistanê.

Li ser evê pîrsa mamosteyê, ji zarokan pîranîya wan destê xwe rakirin ku ji bilî tirkî ew bi zimanekî din jî dizanin. Mamosteyê yek bi yek ji wan zarokan dipirsî ka meriv çawa bi almanî, bi holandî, bi îngilîzî û fransî tiştekî bi lêv dike. Ew tiştên ku mamosteyê bi tirkî ji wan dipirsî, wan jî bi wan zimanan ji wê re gotin bi lêv dikirin. Bi taybetî jî zimanê fransî bala mamosteya min dikişand û Xwedê dizane wê jî dixwest ew di ber re fêrî çend gotinên fransî bibe.

Di fransîyê de dengên “ju”, ”ji” ”jou” zêde bûn an jî bi min welê dihat. Û ji kompleksê bû, ji bêyomîyê bû an ji rastîyê bû, nizamî... lê ez jî rabûm min destê xwe bilind kir ku ez jî bi zimanekî din dizanim ku ne tirkî ye. Mamosteya min, bi gotina wê, ew a ku ez bûbûm keça wê, berê xwe da min û got:

– Sen hangi dili... bildiğin dilde “seni seviyorum” nasıl söylenir, kızım?

Min got:

– Ju te hez dikim.

Baş diyar bû ku wê tiştek ji van

gotinên min fahm nekir. Loma bi mereq ji min pirsî ka ez, an jî dê û bavê min ji kîjan welatî hatine. Welat çi bû, wê çaxê min nedizanî... ji bilî Koçanê. Min got em ji Koçanê hatine. Lê wê ji Koçanê jî tiştek fahm nekir û bi raman dîsa pirsî.

– Kızım, bu Koçan nerede oluyor ki? Ülke mi, şehir mi... orası?

Min cudahîya di navbera ‘ülke’ û ‘şehir’ de jî nizanîbû... loma min gotê:

– Köyümüz çok güzeldi.

Xwedê dizane wê fahm kir ku ez bahsa welatekî nakim, bahsa bajarekî nakim... tenê bahsa gundekî dikim. Mîna ku hêvîya wê ji min, ji ez a keça wê şikiyabe, hustuyê xwe jî xwar kir û bi tatûl got:

– Peki konuştuğun dil neydi, kızım, hangi dille söyledin?

Bi serbilindîya ku ji bilî tirkî ez jî bi zimanekî din dizanim û weke wan hevalên xwe aferînekê jê werbigirim, min gotê.

– Kurmancî.

Di wan deman de min nizanîbû kurmancî zimanê kê ye û kî pê dipeyivin. Lê welê diyar bû ku wê dizanîbû. Lewra tatûla li rûyê mamosteya min a xweşik zêdetir bû û got:

– Kızım, bu ermenice mi? Kürtlerin konuştuğu dil mi?

Ji ber ku min nizanîbû *ermenî* û *kürt* jî çi ne, min got:

– Bilmiyorum.

– Kızım, kimlerin bu dili konuştuğunu bilmiyorsun ama dili biliyorsun... peki kiminle konuşuyorsun bu dili?

– Ninemle... ama hep o konuşuyor, ben dinliyorum.

– Ne dinliyorsun, kızım?

– Masal...

– Kızım, sen anlıyormusun nine-nin sana anlatıklarından?

– Anlıyorum... uyuyuncaya kadar çok güzel masallar anlatıyor bana.

– Peki kızım, ninenler nereden gelme, Diyarbakır'dan mı, Van'dan mı... Konya'dan mı?

Min fahm nekir ew çi bûn wê got, loma min serê xwe li çep û rastê xwe li ba kir û min dîsa gotê:

– Koçan.

Min bawer nekir ku wê fahm kiribe Koçan li kuderê ye, lew-ra dîsa wegeriya ser zimanê min û dapîra min:

– Kızım, kürtlerin dili mi bu kurmancî?

Bêyî ku bizanim kurmancî zimanê kê ye, tenê ji bo ku ji pirsên mamosteya xwe xelas bibim, weke hespan min serê xwe bi jêr û jor ve hejand û pirsê wê erê kir. A wê çaxê min dît bê sûretê ewê mamosteya min a xweşik çawa guherî, min dît bê çi tirs û tatûl li sûretê wê î xweşik peyda bû, sûretê ku li gor wê, dirûvên min jî dişibiya dirûvên wê. Bi ewî sûretê xwe î bi tatûl hêdîka di ser min de daqûl bû, li nava çavên min mêze kir (di wê gavê de hay jê bûm ku bi rastî jî dirûvên min dide û çavên wê jî weke yên min kespikî ne) û got:

– Yok, kızım... böyle bir dil yok, dünyada böyle bir dil olamaz. Sadece sen ve ninen anlaşmış ve dil diye konuşmuş olabilirsiniz. Ama böyle bir dil yok. Hani bazen, anne ve babalar ne konuştuklarını çocukları anlamasın diye uyduruk bir şeyler çıkarırlar ya, buda öyle bir şey, kuş dili diyoruz buna. Mesela: afsır dıfsır nıfsır nefsir dıvsır.¹ Yaa, benim güzel kızım. Hadi şimdi bu dili aklından, ağzından çıkar at kızım... sadece çirkinler konuşur böyle.

Ez li bendî pesin û hezkirineke

¹ Adın nedir.

mamosteya xwe bûm ku ez jî bi zimanekî din dizanim, lê wê rabû hêvî jî li min şikand û dilê min jî şikand ku ew tiştê ez dibêjim ne rast e. Bi ewê hêvîya şikestî mîna ku ez bixwazim gunehkarî û *çîrkînîyekê* ji ser xwe rakim, min gotê:

– Ne tenê ez û dapîra xwe, li gundê me herkes wusa dipeyive... bi kurmancî.

Herkesên li gundê me, gwînê mamosteya min bêtir vemirand, bêhna wê tengtir kir û ji min re got:

– Tamam, sen yine de ninenle konuş ama bu bir dil değil.

Bala min kişand ku mamosteya min êdî ji min re negot: *kızım*.

Ewê rojê hêvî li min şikest, bawerîya min bi min nema û di nava hevalên xwe de rûmet û rewaca min kêmbû... an jî min welê hîs dikir.

Lê ew zimanê ku dapîra min bi min re pê dipeyivî û li gor mamosteya min ne ziman bû, ez hîn jî û îro jî pê dipeyivim. Anuha rasterast wexteke ji sî û sê salan jî zêdetir di

ser evê bîranîna zaroktiya min re buhuriye, lê weke do hîn jî di bîra min de ye.

Ev nûçeya îşevîn û ev dîmena televîzyonê... ez mereq dikim. Hîn jî nizamim ka ew mamosteya min a ku ez li wextekê bûm keça wê, sax e an ne, lê wek ku min got, ez mereq dikim ka gelo ew hîn jî weke berê difikire ku zimanê min û dapîra min ne ziman e û tenê kesên *çîrkîn* welê dipeyivin... zimanê ku anuha herdu serokwezîr bi rêya tercumanekî bi hev re dipeyivîn?”

*

Pişti vegotina evê serpehatiya xwe, Şeyma xanim di ser çogên xwe de xwar dibe û dîsa li kefa destê xwe mêze dike... bêdeng, mîna ku bipê ka ez ê çi pûwanê bidime evê serpehatiya wê. Û bêyî gotin, bêyî daxwaza xwe ez jî radibim, nêzîkî wê dibim, ji kêleka lêvên wê maçeke bêyî heramî lê dikim û bi qasî finala çîrokekê em herdu jî welê bêdeng dimînin.

Îskana Têrikîyan/Mirdêsan

Dr. Mikailî

Heta nika di derheqa kurdên Têrikî da pir tişt hat nivîsandin, lê piranîya wan agahîyana yê devkî bûn, yan ji wek çîrok, efsane mezina ji me ra qal dikirin.

Di lêgerîna me ya di arşîvên Osmanî da em rastî çend belgeameyan hatin ku tê da qala Têrikan jî tê kirin. Piranîya wan belgeyana li ser bûyerên adlî bûn. Tê da qala hilgirtina bacê yan jî tevdîrên îdarî dihat kirin. Yan jî li ser dizî û kuştina kesan bûn.

Di zik wana da me hin nav, dem, tarix û qala tiştan dîtîn, ew ji bo me girîng bûn. Em dixwazin wana bi we va par ve bikin.

Belgeameya herî kevntir di sala 1777an da ye. Ew tarîx bi îskana êlên kurd yê din ku ji bo Anatolîyê hatine şandin va hevdu digrin, yek in.

Em ji navî cihên ku bûyer, dizî û şekawet bûne derdixînin ku Têrikîya ji bajarî Bursa û Aydinê bigre hetanî Kirşehir, Yozgatê (Bozok) hesp bezandine, talan û tertele kiri-


ne, rê birîne. Ev karê xwe hin caran bi kesên ji êlên Hêcibî û Reşîyan va kirine. Li hin deran jî bi komên tirk û turkmanan va kirine.

Bi sedan sîyarîyên wana hebûne û li derdorên ku ew lê bûne tu kesî bi wana nedikanîye û ji ber vê jî xelkên van derana pir caran li hemberî têrikîya hawar ji dewleta Osmanî, ji Stenbolê xwestine.

Hin caran li dû şer serê begên têrikîyan jêkirine û wek îspat ji Istenbolê ra şandine. Yek ji serokê têrikîyan ku seri wî di sala **1825** hatiye **jêkirin Dumanoglu Cafer Beg** bûye.

Dîsa di nava belgeameyan da, di sala 1800î de qala serokî êla têrikîyan, **Dumanoglu Mustafa beg** derbas dibê. Em ji vê derdixînin ku serokatîya têrikîyên ku hatine Anatolîya Navîn û roava di destî malbata Dumanan da bûye. Dumanoglu Mustafa beg jî li piştî bûyerekê girtine û avêtine zîndana Amasyayê.

Nevîyên wana îro li gundî Sirçaraya Haymanayê û li navça



Polatlîyê dijîn û paşnavê wana Duman, Dumanoglu ne. Li gor neviyên Dumanogluyan ew bi xwe Mirdêsî ne û Têrikîyên din jî avaneyên wana ne, yanê xelkê ku di bin îdara wana da ne. Le ev çiqas rast e em pê nizanin.

Ji ber ku berê navî têrikîya li navçê hertim bi dizî û talanê derbas dibû, dibe ku naxwazîn xwe bi wan va yek bigrin. Ev tê zanîn ku gelek êl û malbatên din ya kurdan di bin îdara Mirdêsan da bûye. Lê yên herî camêr, şervan, wêrek û cengawer têrikî bûne.

Li Anatolîya Navîn kîjan beg yan jî axayî xwestîye hukum bike,

ji xwe ra kesên têrikî wek şervan girtine yan jî ji wana keçik xwestine û keçên xwe jî dane wana. Bi vê rêyê him xwestine xwe ji xerawî û şerê wana biparêzin, him jî bi wan ra bibin xisim û meri.

Di nav belgenamayan da ji bo wana her caran ekrad yanê kurd hatiye nivîsandin, lê bi çend cureyî.

Weka: Ekradî Tîrganli, Ekradî Terkanli, Ekradi Tirikanli, Ekradi Turkanli.

Yên ku ev ferman an jî belgename nivîsandine memurên osmanî ne û bi tîrkîya osmanî, bi tîpên erebî nivîsandine. Yê ku wana werdigerînin tîrkîya latînî ya îroyîn jî

pirî caran bi wan cûreyan û bi dîtînên îdeolojîya tirkîtiyê nivîsandine.

Ji ber ku haya wana ji navî Têrikî, yan jî Têrikan ku kurd bixwe ji xwe ra dibêjin, tune ye û pê nizanin jî!

Ji ber van nivîsandînên turkan, turkanli hin kesên nîyetxerab diwêjin ew tirk in û di nav kurdan da heliyane, bûne kurd.

Lê bes têrikîyên li Anatolîya Navîn em nas dikin bi her tiştên xwe kurd in. Di nav gundên tirkan da dijîn, lê tu tirkekî heta nika ji wan ra negotiye û nabêje tirk yanê turk!

Ez hetanî nika tu rastî gundekî têrikî ku tirk bin, tirkî deng bikin nehatime. Dibe ku hin kes, ku ji dê bavê da kurmanç in, kurd in çûne bajaran, tev komê tirkan bûne û ji xwe ra dibêjin tirk. Ewqas!

Lê haya ew netewperestên tirkciyan ji Mirdêsan û rola têrikan da nava mîrîtiya Mirdêsan danîne.

Li Anatolîya Navîn ji devera Têrikan ra "Aliyê Mirdêsa" tê gotin. Yanê Mirdêsa = Têrikî ye.

Zimanî têrikîyên Haymanayê, Polatli, Sivirihisar, Konya, Riha, Kahta û Qersê kurdîya kurmançî ye.

Ji ber ku mîrên mirdêsiyan begtiya Palo û Çermokê jî kirine, mirdêsiyên wê derê bi kurdîya dimilkî (zazakî) deng dikin.

Gelo mirdêsa kî ne, ev nav ji ku tên?

MIRDÊSÎ/TÊRIKÎ

Egil di sedsalên 16-19an da serbajarê hukumeta kurd ya Mirdêsan bûye. Agel yan jî Angel bi zimanê suryanî tê wateya "Derî". Di serî sedsala 20an da hin ermenî û kurd li vir dijîyan. Egil deriyê çiyayên Torosan ya rohilata başûr e û ber bi hoza Diyarbekirê va vedibe, li ser rêya Diyarbekir û Meletyê ye.

Di Şerefnamê da dûr û dirêj qala xanedana Mirdêsan tê kirin. Li gor Şerefnameyê, koka begê Palo û Çermokê jî Mirdêsa ne.

Li gor rîwayetan navê MIRDAS ji Salih bin Mirdes/Mirdas tê.

Ibni Adim di kitêba xwe Zübde-tül Halepê da (sal 1002) wekîna qala Mahmud bin Nasir bin Salih Mirdas dike: „*Wexta ew kete nav Helebê li hêla wî 1000 kurd, deylemî, ereb û avc (Müslümanên bizansî) û tirk hebûn, ereb ji vê pir tirsyan, piranîya eskerên Salih bin Mirdas kurd bûn.*“

Disa di kitêba "El A'lakul xatira Fi Zikri Ümera'i Şam ve Cezire" da tê nivîsandin ku li bajarî Humusê êleka mezin ya kurdan hebûye.

Dîsa Şahabeddin El Ömerî di kitêba xwe Mesalikul Ebsar da

dinivîsîne ku li dû êriş û qirana Mongolan gelek êlên kurdan ji Şarizorê derbasî alîyê Şam û Helebê bûne.

Ji wan nivîsana jî dîyar e ku piranîya xelkê dewleta Mirdêsan kurd bûne û hemî êl û kesên di bin îdara wana da jî xwe wek Mirdêsî/ Mirdasî bi nav kirine.

Li gor dîrokê dewleta Mirdêsan bi destî fatimîyan li Remle hildiweşe û Salih bin Mirdas jî li qada şer tê serjêkirin. Ji ber ku Salih bin Mirdas êrîşî Helebê kiribûye. Wexta dewleta Mirdêsan di sala 1030 da hildiweşe, zarokên Salih bin Mirdas bi êlên kurd va tevhev derin li qelaya Egilê xwe vedişêrin, dimînin, ji ber ku ew êl berê jî ji Egilê hatibûne.

Wê dewrê li Şam, Heleb û Raqqayê kurdên Hakkârî, Zerzarî, Mehranî hebûne.

Li gor Şerefnameyê di destî hin kesên ku xwe Mirdêsî dihesibînîn da şecereyek heye ku heta 15 bavan diçe û dibêjin em ji Ebbasîyan tên. Nivîsandina Şerefnameyê di 1597an da qediyaye. Ebbasî pismamê Hz. Muhammed in.

Lê Şerefname dibêje ew weka rîwayet e.

Li Egilê gorna Hüseyin Arac (Topal Hüseyin) heye ku wek ava-

ker û mezinê Mirdêsan tê qebûlkirin û bûye pîrozgeh.

Ew kesî ku li Egilê dewleta Mirdêsan dîsa ava kiriye Pir Mansur e. Ew ji Hekkarîyê hatine û li qela Egilê bi cîh bûne. Li dewsa wî bi dorê Pir Musa, Pir Bedir begtî kirine. Bi piştgirîya êlên kurd li wê derê qela Egilê zeft kirine û hukumeta xwe çêkirine.

Di salnameya 1883-1884a Diyarbekirê da wekîna qala hukumdarên Egilê dibe: „*Di sala 1564- 1565an da qala pîrşgirêka navberî begî Egilê Kasim bi hukumdarî Paloyê Cemşid beg va têkirin û ji bo ku ew di Dergahî Mualla da bê çareserkin.*“

Di dewra Akkoyunluyan da Kasim beg bi Uzun Hasan va dibe xisim û keçîkek xwe dide wî û ji wê keçîkê jî Zeynel beg dibe. Tirba xwe li Hesenkêfê bû! Piştî ku Hesenkêf di bin bendavê da ma, yan jî meri dikare bibêje hat hiştin, dewletê ew tîrb ji wir rakir û li Hesenkêfa nû dîsa ava kir.

Kasim beg zarokên seraya Akkoyunluya perwerde dike, ji bo vê jî jê ra dibêjin Lala Kasim!

Li gor rîwayetan li dû mirina Pir Bedir ji jineka wî lawikek tê dunyayê û ji ber ku dêya xwe tirk bûye, navî wî Bulduk lê dîkin, yanê

bi tirkî „î ku me dît.“ Hîn di salên xortanîyê da Bulduk beg wek serokê êlê tê hilbijartin.

Ji ber navî wî ji vê şûnda ji Mîrîtiya wan ra „**Buldukanî**“ tê gotin û naskirin.

Piştî mirina wî Emir Îbrahim, li şûna wî jî lawê wî Muhammed dibe reîs. Ji Muhammed sê law dimînin. Hîn di saxîya xwe da lawî mezin Îsa li ba xwe dihêle, Emir Timurtas di-de ser qela Baxinê, Emir Huseyin jî dide ser qela Berdencê. Begê Palo û Çermokê jî ji koka wî ne.

Li dû mirina wî dîsa Îsa, li dewsa wî jî Dewletşah dibe serok. Li dû wî Emir Îsa û lawê wî Muhammed û dû wî jî lawê wî Kasim di dewra Şah Ismailî Safewî da dibin serokê Mirdêsan.

Şah Ismail ji wan hez nedikir, ji ber ku wana bi Uzun Hasan va xisimti, merivî çekirîbûn û bi wî va kar dikirin. 1508an da komutanî Şah Ismail, Xan Muhammed Ustaclu li dû şerekî giran qela Egilê xiste destî xwe. Mirdêsiyan li ser vê Egil terikandin û xwe avêtin bextê çiyayên Kurdistanê. Le ew pir dewam nekir, kurdan bi navbertiya Îdrîsî Bidlisî bi Sultanî Osmanîyan Selimê II va li hember Şah Îsmail peyman çêkirin. 1514an da li Çaldiranê Şah

Îsmail bi binket, tac û textê xwe ke-te destî kurd û osmanîyan. Li dû şerê Çaldiranê Emir Kasim qela Egilê dîsa xiste destî xwe. Lê demek kurt da mir, ji wî lawik nema bûn. Li ser vê birazîyê wî Murad hat serî Mirdêsan. Murad kesekî sofî bû, gorna Kasim begê çêkir, alîkarîya fiqara kir. Ji Murad Beg jî du lawik man: Ali Xan û Qasim beg. Wana jî mîrîti kirin lê zû mirin. Ew mirin şunva di sala (1005)1597an da kurê Qasim, Cafer(Cewer) bû beg. Wî jî qasî 30 salî hukumdarî kir.

Avahîyên Mirdêsan:

Mizgefta Lala begê Diyarbekir: Li dora sedsala 15an ji hêla Lala Kasim va hatiye avakirin.

Tirba Lala Beg: Li Diyarbekir nêzikî Mizgefta Lala begê ye. Tirba xisimekî Lala Qasim e.

Zati-Ali Kûmbeti: Egil- Diyarbekir: Li gor rîwayetan ew tirba Isa begê ye. Isa Beg di sedsala 14-15an da jîyaye. Kumbeta Zeynel Beg: Li Heskêfê ye (Hesenkeyf).

Gundên Têrikîyan/Mirdêsiyan

Îro li Ruhayê (Urfa) gundê ku têrikî /mirdêsiyên lê ne, em dizanin ev in:

Hilvan 7, Siverek 4, Karaköprü 8, Haliliye 7, Bozova 4 , Eyyubîye 2, Suruç 1, Akçakale 1 gund.

Navên ku em gihîştinê ev in: Büyük Yarımtepe, Küçük Yarımtepe, Büyük ve Küçük Mirdes, Kızlar, Gölpınar, Akziyaret, Hamurkesen, Yukarı ve Aşağı Komad, Grabsor, Karaca, Estagfurula köyü, Korcik, Karapınar, Çakmaklı, Saluca, Sorikan, Tatarhöyük, Buğdayhöyük, Çiftlik.

Li Eskişehir-Sivrihisarê:

Göktepe, Kaldırım, Buzluca, Sivrice û Ahilerê têrikî hene. Va gundana bi Çeltik û Polatliyê va cîran in.

Li Konya Cihanbeyliyê:

Büyükbeşkavak, Çölyaylası, Kelhasan, Küçük beşkavak jî malên têrikîyan hene. Li çend gundên Tokatê jî têrikî hene.

Li Haymanayê gundê têrikîyan ew in: Sırçasaray (Gundê Axlera), Tepeköy, Çatax, Bogazkaya,

Kronolojîya secereya begên

Têrika/Mirdêsa

Li gor belgeyên arşîvan hetanî 1620an li Egilê malbata Buldukanîyan hukum kirine û li dû wê jî bi piranîyan êlên kurdan va tevhev Mirdêsi/têrikî ji welatî wana hatine derxistin ji bo îskana mecburî hatine şandin. Pêşta li Reqqa, dû ra ji wir reviyane û li Ruha, Diyarbekir,

Kahtayê dîsa belav bûne. Ew derana ji berê da cîhwarê kal û bavî wana bûne. Kesê ku navê xwe di arşîvan da derbas dibe heta sala **1629 Buldukani Cafer beg** e.

Ji vê wextê şûnva serhildan li hemberî dewleta osmanîyan dest pê kirin. Li Kurdistanê tevlehevîyeka mezin dest pe kir.

1700an da Mirdêsan li zivistana dadiketin hoza Gewran, Evdileziz û Diyarbekirê, havînan jî derdiketin Meleti, Hisni Mansur, Gerger, Erzurum, Elaziz (Xerpêt) û Melazgirê.

1725-1729an da ew jî weka Canbeg û gelek êlên din ji hêla osmanîyan va li Reqqayê hatin îskankirinê. Lê ew jî weka piranîya Kurdan ji wir revîyan.

Di sala 1741an da bi kurdên din va li Ankara, Konya û Anatoliya Navîn hatine bicîhkirin. Begên wan î herî kevn tê zanîn Tahirbeg e (1746). Li dû wî jî Muhammed kurê Muhammed, ber bi Kahtayê tere. Ew kalikên nivîskar û şairê kurd Osman Sebrî ne. Lawê Osman Sebrî Huşeng Sabrî li Elmanya Berlinê Dermanfiroş e (Eczaxane).

Mistefa (Haci Deli beg, Têrikî) û kurê herî biçûktir Evdil Hay beg bi qasî 1000 malî li Haymanayê,



Fodila Hesên Begê bi keca xwe Rehm û newîya xwe Zerê ve.

Anatolîyê tèn îskankirin.

(Nota Dr. M: Di arşîvên Osmanlî da qala Abdulhay begekî derbas dibe, lê dibêje ew kurdê şêxbezênî ye!)

Dîsa navî begên Hêcibîyên li Balayê îskan bûne jî Mala Abdulhêy e. Kalikê malbata Binerbay û Şah-suvarglu ne.)

Li Kahtayê û Ruhayê navê Mustafa beg (Deli Mustafa) derbas dibe. Li gor belgenamayan di sala

1777an da hendî komeka mezin ya têrikîyan li Anatolîyê ne û di sala 1800î da qala Dumanoglu Mustafa beg derbas dibe. Ew avêtine zîndana Amasyayê. Li dû wî dîsa di sala 1826an de navê Dumanoglu Cafer beg derbas dibe ku wî bi osmanîyan re şereka mezin kiriye û li piştî şer serê wî û 5 şerwanê têrikîyan jêkirine û ji sultanî osmanîyan ra şandine û di wê herbê da qasî 200 şerwanên têrikî jî hatine kuştin. Qala kuştî û birîndarên osmanîyan nêye kîrin.

Wek me li jor jî qalê kir, navê begê dawî yê Mirdêsîyan li Kurdistanê **buldukanî Cafer beg** bûye û hetanî 1620an li Egilê hukum kiriye û navî begî Dumanoglu li Anatolîya Navîn jî Cafer (Cewer) beg e, ew wek hev in. Ev ne tesaduf e. Li gor min ewna kalê Dumanogluyan e. Ji ber ku ew bi zorê şandine Anatolîya Navîn, wana li wir jî li hemberî osmanîyan serî hildane û ketine şerên mezin.

Di belgenameya arşîvên 1847an da dîsa qala reîsî, müdürî nahîya têrikan Dumanoglu Mustafa beg derbas bibe.

Li gor malbateka Dumanogluya (Y. Dumanoglu) ji Sircasaray - Haymanayê kalikê wana ev in: Yilmaz, Husik (Huseyin), H. Osman, Cafer, Yahya. Ji vê bêtir nikarin bijmêrin. Ew heta 1850yî paş va terin.

Li gor min, kalikê wan Mustafa beg avêtine zîndanê û di 1826an da jî Cafer beg serjêkirine, yên ku mane zarok û newîyê wî Cafer begî û Mustafa begî ne. Wana jî ji tirsan pir qala va kalan nekirine û li wan xwadî derneketine!

Di arşîvan da sebeba nezanîna kalikên xwe yê din zelal e. Li dû kuştina wana quweta wan şikestîye. Lê dîsa jî em di arşîvan da dibînin ku li Anatolîya Navîn hetanî komara Tirkîyeyê ava dibe, piranî beg û mîrên kurdan tim piştî xwe dane şervanên têrikan.

Di belgenamêyên arşîva osmanîyan da Têrikî

29.10.1191 (1777) Konur kazası (Kongur) ahalisinden bazıları satılmak üzere Aydın'a at getirirlerken Emirdağı civarında Terkanlı (Têrikî) aşireti efradının taarruz ve yağmasına uğradıklarından, men'i ve gasbolunan at ve eşyanın geri alınması.

Kurdî: Ji xelkê Konurê hîn kesên ji bo firotinê hespên xwe dihanîne bajarî Aydinê, di rê da li nêzikî Emirdaxê têrikîyan erîşî ser wana kirine, mal û hespên wana ji wan dizîne, ger ew mal û milkên xelkê dîsa ji wan bê hilgirtin û pêşî li têrikîyan bê girtin.

20.10.1193 (1779) Eskiil kazasına gelen beş yüz hane Terkanlı Aşireti tarafından vuku bulan tecavüz ve garetten şikayetle mezkur aşiret o havalide iskan olundukları takdirde kendileri ahar mahalle hicret ederek perişan olacaklarından keyfiyetin nazar-ı ehemmiyete alınması ve maksubatın da istirdad edilmesi kaza reayası tarafından istida olunduğuna dair Eskiil Kazaı Kadısı Yusuf imzalı.

Kurdî: Xelkê Eskiilê bi înzeya Qadi yî bajêr gilî dikin ku 500 malî êla têrikîyan hatine wir, eger ew êl li wir bi cîh bin, ewê xerawîyan li wan bikin û xelkê vira ê mecbûr bimîne ji vir barke û perîşan bibe. Ew dixwazin ku ev pîrsgirêk bi girîngî were berçavkirin û çareserkin.

Jêrenot: Eskiil nika bi bajarî Aksarayê va girêdayî ye û navî xwe Eskiil e.)

29.12.1215 (1800) Haymana kazasında Terkanlı (Têrikî) Aşireti'nden **Dumanoglu Mustafa** ve Çubukabad kazasında idmanlı Aşireti'nden Osman'ın Amasya Kalesi'ne sürgün edilmeleri.

Kurdî: Li bajarokê Haymanayê ji êla Têrika Dumanoxlu Mustafa beg û ji Bajarokê Çubukabad (Çubuk-Ankara) ê ji êla Idmanli Osman ji bo qelaya Amasyayê bèn sirgûnkin.

10.06.1231 (1815) Terkanlı

Aşireti Kürdlerinin gelip geçdiklerinden reayanın mezruatını itlâfa ve tüccarın malını gasp ve sırka-te cür'et ve Bezanlı Aşireti'ni de (Şeyh Bezen) mukaddema yağma eylediklerinden ve ihkak-ı hakk için bunların muhtelif mahallerde bulunmasına mebni her tarafa emirler yazılması icab eylediğine ve kendisinin Karaman infıkakı vuku bularak Konya'da emri intizar edilmekte olduğuna ve saireye dair Adana Valisi Celaleddin Paşa'nın tahrirati.

Kurdî: Walîyê Adanayê dixwaze ku bila haya herkesî jê hebe, êla kurdên Têrikî çûyîn hatina gel dixê metirsîyê û bi taybetî jî dizîya êla Bazenan (Şêx bezenî) dike û ji ber vê hewce ye ku pêşî li wan bê girtin, çûyîn hatina wan bê qedexê kirin. Berî her tiştî jî ber ku ev bûyêr li navçeya Karamanê dibe, emir jî Konyê bê dayîn.

02.11.1234 (1818) Sivas köylerinde hırsızlık eden **Tirkanlı Kürdlerinin** muharebe ile münhezim edildiklerine dair Sivas Valisi Lütfullah Paşa'dan Kapi Kethüdası'na.

Kurdî: Walîyê Sîwasê Lütfullah Paşa ji bo Kapi Kethuda dinîvîse ku kurdên Têrikîyan li gundê Sîwasê

dizî kirine bi şer hatine belavkirin.

Jêrenot: Kapi Kethuda direkt bi Sultanî Osmanîyan va girêdayî ye û piranîya wana zarokên Gayrîmusluman bûn û ne tirk bûn.

15.09.1235 (1819) Aladağ ayanından Mustafa oğlu Seyyid İsmail ile emmizadesi Hacı Mehmed'in şekavet ve itaatsizliklerini bertaraf etmek ve Konya toprağında dolaşan Türkanlı (Têrikî) aşiretinin tedibleri için Karaman Valisi Ebubekir Paşa'nın isteklerini dile getiren tahriratları üzerine bu konunun daha sonra müzakere edilmesi gereğine dair hatt-ı hümayun.

Kurdî: Hatti humayuna (Nivîsa Sultanî Osmanîyan) li ser daxwaza valîyî Karamanê Ebubekir Paşa, ji bo pêşilêgirtina şekaweta ji xelkê Aladaxê lawî Mistefê Seyyid İsmail û pismamî wî Heci Mehmed û ji holê rakirina êla Têrikîyên ku li dorberê Konya yê digerin.

27.08.1237 (1821) Kırşehir sancağında Derbend'e hücum eden ve köyler basan Konya'da kışlayan Tirkanlı aşiretinin külli bir kuvvetle takib ve iki yüzü öldürülerek perişan edildiğine ve otuz bin koyunları zabtolunup sekizer kuruşa halka dağıtılmağa başlandığına ve paralarının gönderileceğine ve yir-

mi aşiret reisinin kesik başlarının yollandığına dair.

Kurdî: Têrikîyên ku li Konyayê bi cîh in, li sancaxa Kirşehirê êriş anîne ser bajarî Derbendê û gundan, dizi û talan wan kirine. Lê ew bi hêzeka mezin hatine taqipkirin û ji wana 200 kes hatine kuştin û pêrişan kirin, 30000 pez û keriyê wana jî yeka xwe bi 8 quruşan hatiye firotin û bedela wê ji bo Istenbolê ware şandinê û dîsa serê bîst reîsên Têrikîyan ji bo Istenbolê hatiye şandin.

25.01.1237 (1821) Bozok (Yozgat) ahalisinin Rîşvan, Tırkanlı ve Hecibanlı aşiretleri Ekradının şakavetlerinden bahis ile nizam altına alınmaları temennisi.

Kurdî: Daxwaza xelkê Bozokê (Yozgat), ji bo çareserkirina nebaşîyên eşkiyayên kurdên reşî, têrikî û hecibîyan.

Jêrenot: Bozok ji peyva farsî Bozorg tê, bi wateya mezin e. Bi peyva "ok" va têkiliya xwe tunneye.

23.01.1237 (1821) Budaközü Kadılığı'nın Rîşvan, Tırkanlı ve Hecibanlı Ekradî eşkiyasının yaptığı mazarratlarının def edilmesi talebi.

Kurdî: Daxwazname ji bo Qadiyî Budaközü, ji bo çareserkirina nebaşîyên eşkiyayên kurdên reşî, têrikî û heciban.

21.12.1239 (1823) Konya toprağında dolaşan Terkanlı aşiretinin fukaraya taaddi ve tecavüzleri olduğundan tedipleri Karaman valisine havale edilmiş ve Konya toprağından çıkarılmışlar ise de Haymana ve Ankara tarafında olan aşiretlere iyi muamele yapılmasına dair mektup.

Kurdî: Name di derheqa tedîben têrikîyên li devera Konyayê zirar dane mal û milkên xelkên fiqare hewaleyî valiyî Karamanê bûye û wî ew tedîp kirine, ji devera Konyayê derxistine. Êlen ku li aliyî Haymana û Ankarayê mane bi rindî bîn muamelekirin, xerawî li wan neyê kirin.

05.01.1240 (1824) Ekrad tائفesinden Şeyh Bizinli ve Terkanlı ve Cihanbeyli aşayiri Ankara'nın kazalar reayasına ziyan getirdiklerinden tehditleri hakkında ferman suduru babında Ankara ve Kengiri (Çankırı) mutasarrıfının yazdığı kaimeye ait hülâsa.

Kurdî: Ferman ji bo mîrên Ankara û Kengiriyê (Çankiri) ku kurdên ji êlên Şêx bezenî, Têrikî û Canbegan li bajarokên Ankarayê zirar û zîyana dane xelkê û metirsî li ser wan çekirine.

23.03.1241(1825) Eşkiyadan Kadıkıran'ın başına topladığı Tırkanlı ekradı eşkiyalarının, Keskin kazasında hasarat yaparak Ankara Valisi Nurullah Paşa'nın maiyyet askeriyle de çarpışarak firaren avdet eyledikleri esnada Hacı Bektaş-ı Veli hankahı mensublarından birini katleyledikleri hakkında Hacı Bektaş şeyhi Hamdullah Efendi'den Karaman Valisi Ali Paşa'ya arıza.

Kurdî: Gilîkirina şêxî Hacibektaşê Hamdullah Efendi ji bo walîyê Karamanê Ali Paşa di derheqa eşkiyayê Têrikan ku ji xangehê Hacı Bektaşî Veli kesek kuştine û berî wê jî dîsa di bin serokatîya eşkiya Kadıkıran da li bajari Keskinê zirar û ziyane dane xelkê û bi leşkerî walîyê Ankarayê Nurullah Paşa va ketine şer û ji wir da ber bi Hacibektaşê reviyane.

09.05.1241 (1825) Kurtbeli'nde Terkânî Ekradı'nın -Kargın'da- Acem tüccarlarına ait eşyaları yağmalayıp, bazılarını katl ve cerhlerine sebebiyet verdikleri hadisenin tahkikine ve teferruatına dair Mazhar Nur Hamd Abduhu Mehmed Efendi'nin ilamı.

Kurdî: Lêpîrsîn û agahdarîya Mazhar Nur Hamd Abduhu Mehmet Efendi: Kurdên têrikî li Kurtbeli, li Kargînê dizîya bazîrganê

Ecem kirine û hin ji wan kuştine û birindar kirine.

30.01.1242 (1826) Eşkiyadan Sadi oğlu'nun, Tırkanlı aşireti beyi ile ittifak ederek Aksaray'a taarruz hududunda iken yetişilerek mülhhezim edildiği ve rüesadan **Dumanoglu Cafer Bey ile beş bölükbaşının serlerinin gönderildiği** hakkında Karaman Valisi Ali Paşa'dan Sadaret'e arıza.

Kurdî: Valîyî Karamanê Ali Paşa ji Sadaretê ra xeber daye ku eşkiya Sadioglu bi êla Têrikan va hêza xwe kirine yek û xwestine êrişî Aksarayê bikin, lê heta wêngê ew gihîştîye û nehiştîye ew êriş bikin û ji reîsên wan Dumanoglu Cafer û sere 5 sergerdeyên din jî jêkirine û şandine Istenbolê.

27.10.1250 (1834) Eğil Kazası'nda (Diyarbakir) Tırkanlı Aşireti ile Zogorlar ve diğer bir köyün Kürdleri nüfus yazımını ve Mansure askeri tertibini kabul etmediklerinden asi bir vaziyet aldıklarına ve Timur Bey'in bunları açıkdan açığa himaye ettiğine dair.

Kurdî: Ji Egîla Diyarbekrê **Têrikîyan** û Zogoran û hin kurdên din nexwastine nüfusa xwe bidin qeydkirin û herin leşkerîyê, li hember vê derketine û Timur begê jî

piştgirîya wana kiriye, ew parastine.

08.04.1263 (1847) Reşvan ve Terkanlı aşiretlerinin Çiçek dağından başka nerelerde bulunduklarına, ne kadar askerle ıslah edileceklerine dair Konya Meclisi'nin mazbatası.

Kurdî: Mazbataya meclisa Konyayê: Êlên Têrikî û Reşî ji bilî Çiçekdagi li kuderê ne û ew ê bi çiqas esker bên îslah kirin.


23- Belge Tarihi:

H- 18.03.1263, Miladi: 1847

Belge Özeti: Cihanbeyli Aşireti'nden ahz olunmuş olan neferatdan bazı firar ile Rışvan Aşireti'ne dehalet eden kesianın himayet olunacakları **Triganlı Aşireti Müdürü Dumanoglu Mustafa Bey** tarafından ifade olunduğundan men edilmesi.

Kurdî: Li gor agahdariyên serokî midurî êla Têrika Dumanoglu Mistefa beg, ew kesên ku ji êla Canbegan reviyane, xwe avêtine bextê Reşîyan, hewce ye pêşî li wana bê girtin û men kirin.

28.01.1263 (1847) Aksaray civarında bulunan Reşvan ve Terkanlı aşiretlerinin uygunsuz hareketlerini önleyip gasbettikleri emvali geri almak için asker sevk edilmesi hakkında tezkire,



Serasker Mehmed Said'in derkenarı ve ilgili evrak.

Kurdî: Evraqa derkenar û tez-kireya serasker Mehmet Said ji bo pêşlêgirtina xerawîyên êlên reşî û

têrikan û tiştên ku wana dizîne bên desteserkirin û derheqa şandina eskeran.

28.04.1264 (1848) Osmancık kazasından geçen Bağdad tatarını katledip mal ve eşyasını çalmış olan Terkanlı Aşireti eşkiyasından bazılarının, Ankara'nın Bala kasabasında yakalandığına, ele geçirilen eşya ve mallarla ilgili Binbaşı Said Ağa'nın gönderdiği şukkarların takdimine dair Serasker Mehmed Said'in yazısı.

Kurdî: Pêşkêşkirina nivîsa serasker Mehmet Said di derheqa tişt, mal û milkên ji hêla bînbaştî Said Axa va ji eşkiyayên têrikan ku li bajarokê Osmancikê (Çorum) teterekî (Tatar=Postacı) Baxdadê kuştine û tişte wî dizîne. Hin ji wan dizan li bajarokê Bala-Ankarayê hatine desteserkirin.

19.01.1264 (1848) Ankara civarında Terkanlı Aşireti'nin fenalıklarının önlenmesine dair tezkire.

Kurdî: Tezkire di derheqa pêşlêgirtina nebaşîyên êlê têrikan li dorbera Ankarayê.

08.01.1264 (1848) Amasya civarında posta tatarından İbrahim tatarın **Terkanlı Ekradı** tarafından nükudu gasb edilerek on bir nefer eşkiya tarafından katl edildiği.

Kurdî: Li Amasyayê teterê postê İbrahim ji hêla 11 kurdên têrikîyan va hatiye kuştin û dest dane ser posteya wî.

17.06.1264 (1848) Yaylaya çıkarken Tırkanlı ve sair aşair eşkiyasından korunma talebinde bulunan reaya için altmış zabtiye istihdamı emredilen Konya Valiliği'nin; mezkur altmış zabtiyenin tahririne ruhsat ve maaşlarının suret-i tesviyesinin bildirilmesi talebi.

Kurdî: Welatîyên ku dixwazin derkevin zozanan ji ber tirsê eşkiyayên têrikan û êlên din parastina xwe ji zabtiye xwestine. Wîlayeta Konyayê jî 60 zabtiye ji bo parastina welatîyan dane û ji bo mehanî û xercîya wana xwastek.

23.11.1273 (1856) Yozgat'da yol kesip soygun yapan **Tırkanlı Kürtleri'nden** altı haydudun Bursa ve Aydın yörelerinde aranıp, yakalanması.

Kurdî: 6 kurdên têrikî ku li Yozgatê rê birîne û dizî kirine li Bursa û Aydinê lê bigerin û wan bigirên.

10.01.1284 (1867) Zahirî mübayaası için Avadis ve Yanko'nun Samsun'dan Merzifon'a gönderildikleri Ohannes'in yolda

üzerindeki meblağı gasb etmiş olan on yedi nefer Ekrad'ın Rîşvan cemaatından Terkanlı ve Okciyanlı aşiretlerinden oldukları tahakkuk eylediğinden ve ayrıca Fransa tebaasından Mösyö Arlo'nun dahi parasını soyduklarından gerekli işlemlerin yapılmasına dair tahrirat.

Kurdî: Lêpîrsîna di derheqa ewê bûyêrê Avadis û Yanko de ku ji bo kirîna ce û genim Ohannes ji Samsunê şandine Merzifonê û di rê da perê wan hatine dizîne, diz kurdên ji cemaata reşîyan ji êlên têrikî û Oxciyan bûne û dîsa wan kesana perê welatîyê Fransa Mosyo Arlo jî dizîne. Hewce ye ew bê lêpîrsîn û çi lazime bê kirin.

Belgenameyên mirdêsan ya arşîvên Osmanîyan

Belge özetî: Hicri 29-07.1141 (1725)

Anadolu eyaletindeki kadılara: Rakka parekendesî cemaatlerinden olup Erzurum, Kars ve Cildir eyaletlerinde sakin olan damat yegen Mustafa Paşa ve matbah emini el-Hac Halil'in uhdesindeki Batılı (Badilî), Karkin, ve Mirdesî aşiretlerinin Rakka'ya nakledilmesi ve içlerinden muhalefet edenlerin kalebent edilmesi.

Kurdî: Ji bo Qadîyên eyaleta Anatolîyê: Ew Êlên Badilî, Mirdêsi û Karkin ku di bin îdara cemaata perakendeyên Raqqayê de ne, ji eyaletên Erzurum, Kars û Çildirê di bin îdara Damat yegen Mustafa Paşa û emînê matbahê el Hac Halil da ne, ji bo Raqqa yê bên şandin, yên ku li dij derdikevin bên girtin, binçavkirinê.

Belge Özeti: H 29-12-1204 (1788)

Dersaadet ahalisinin günlük ihtiyaçlarının temin maksadıyla Mirdesî Aşireti ile o havalideki ashab-i agnam ve celeblerce bu tarafa getirilecek olan kızıl koyun, karaman koyunları ve sair cins agnam için adi geçenlerden yolda müselleme, zabitan ve sair ehl-i örf tarafından bac, toprak bastı ve benzeri adlarla akçe istenilmemesi, bahse konu koyunların yol emniyetlerinin sağlanması ve teferruatı hususlarında Erzurum valisi vezir Abdullah Paşa ya hüküm.

Kurdî: Biryar ji bo walîyê Erzurumê vezir Abdullah Paşa: Ji bo ku hewcedarîya Stenbolê ya rojane ji êlên Mirdêsiyan û kesên din yê xwedan pez baca pêz û vergî neyê hilgirtin û di rê da kerîyên pezi wana baş bên parastin.

Jêrenota Dr.M: Li gor min li vir qala Mirdêsiyên li Kurdistanê mane, tê kirin.

**Belge Özeti: H-21-03-1222
(1806)**

Hazineye teslim edilen Mir-desi ve tevabii aşireti cemaati mukataasi akçesinden, Sultan sahasındaki kalyon inşaatı ile vazifeli Silahşorani Hassa'dan Osman beyin çeşitli masraflarının hazineden ödenmesi.

Kurdî: Ji pereyî Mirdêsîyan û êlên bi wan va girêdayî, parek ji bo xercîyên Silahşorani Hassa Osman beg û ji bo çêkirina kalyonekê ji bo Sultan bê dayîn.

**Belge Özeti: H-29-09-1309
(1893)**

Kahta karyesinde Mirdes aşiretinden Haydar Ağazade Ebuzer Ağa'nın Karınca karyesinde inşa ettirilmiş olduğu camii hakkında malumat.

Kurdî: Agahî di derheqa avakirina mizgefta ku ji gundî Kahtayê Haydarzade Ebuzer Axayî Mirdêsîyan li gundê Karınca.

**Belge Özeti: H-19-11-1309
(1893)**

Mamuretülaziz vilayeti Kahta karyesinde Mirdes aşiretinden Haydar Ağazade Abuzer Ağa'ya nişan itasi.

Kurdî: Dayîna xelatîyek ji êla Mirdêsan Haydar Axazade Abuzer

Axa ji gundê Kahta bi ser wîlayeta Elazizê va.

**BAŞBAKANLIK OSMANLI ARŞİV
BELGELERİ (BOA)**

Hat 0446/22287 D

H-1240 (M-1824)

Karaman valisi kullarının kapu kethüdâsına muharrer şukkasıdır Atûfet-kârâ sultanım hazretleri **Cihanbeyli mîr aşireti sâbık Mustafa Bey Amasya**'ya nefy ve iclâ buyurularak iktiza eden emr-i şerîfi Ankara mutasarrıfı atûfetlû **Nurullah Paşa** hazretlerine gönderilmiş ve merkûmun babası ve ammisî dahi daima derûn-i aşirette olduklarından ahali-i aşireti ızlâl ve nifâkdan hâlî olmadıklarından **vatan-ı asliyyeleri olan Harput'a nakil ve iskânları** babında savb-ı hulûs-verîye hitâben bir kîta emr-i âlî şeref-sudûr etmiş olduğu beyanıyla makam-ı sadâret-uzmâdan bir kîta emir name-i sâmi ve emr-i şerîf-i mezkûr vâsıl-ı savb-ı hâlisânemiz olup bu günlerde **Têrkanlı usâtı (Têrkanlı Eşkiyası) gâilesiyle uğraşılup mezbûrların kahr ve tenkîlleri** (Toptan yoketme, öldürme) kuvve-i karîbeye gelmiş ve merkûmânın başlarında hayli asker olduğuna bu aralık Harput'a

nakil ve iskânları babında şeref-vârid olan emr-i âlî ...olsa aşiretçe vesveseye zâhib olarak isyan suretine ibtidârları mülâhazadan ba'îd olmadığından inşallah ta'âlâ şu Têrkanlı gâyilesi hemen çend rûz zarfında bertaraf olacağından ol vakit bunların vatanları canibine i'zâmlarına bakılsa sühûletle ber murad olacağı bu def'a bâ-arîza Bâb-ı Âlî'ye dahi tahrîr olunmuşdur. Keyfiyet malum-i şerîfleri buyuruldukda gâyile-i mezbûr bertaraf oluncaya kadar emr-i şerîf-i mezkûr ifşâ olunmayarak meskûtün anı kalması usûl-i maslahattan gibi olmağa bu vechile bir müddet meks ve tevkîfleri hususuna müsaa-de-i aliyye erzân buyurulması emr-i ehemmine taraf-ı saadetlerinden dahi himmet ve mürüvvet buyurulmak mütemennâ-yı hâlisânemizdir.

Fî 7 C sene 1240. (1824)

Seyyid Ali

Kurdî: Mirî Canbegan ku bi fermana Sancak begîyî Ankara Nurullah Paşa li Amasyayê surgun e, şandina ji bo welatî wan ya berê Xarpêt nika bê sekinandin baştir e. Ji ber ku va malbat ji berê da ji bo dewletê karên baş kirine, xwedanê gelek leşker in,

şandina wana di nav êlan da ê bibe sedema tevlihevîyekê. Hetanî ku ew belaya eşkiyayên têrikîyan çareser nebe, ew neyên şandin. Eşkiyayen têrikîyan di nav çend rojanda bên kuştin û ji hole warin rakirin.

Ku ew pîrsgirêk hal bû Babi Ali hingî dikare ji wan ra musaade bike û wana dîsa bişîne welatî wan yê berê Xarpêtê.

Li gor me ew pîrsgirêka bi vî awayî baştirin û bi serkevtin çareser bibe.

Fî 7C sene 1240 (1824)

Seyyid Ali

MVL-0001-00016-002-001 Ci-hanbeylilerden ahz olunmuş firariler ile Rişvanlara dehalet eden kesanın himayet olunacakları Tirganlı Aşiret Müdürü Dumanoglu Mustafa bey tarafından ifade olunduğundan men edilmesi, Sayfa 1-Sayfa 2., Sene 1263(1827)

...izzetlü...mürüvvetlü...e-fendim hazretleri:

Terkanlı aşireti sarıkları (hırsızları) Horto ve Şadiye oğlu İsmail, Vedat, Kasım malum ... imamı avaneleri ile Şeyh Bızınlı aşireti ahalisine Kösezenli cemaati muhtarı

ashabına (sahiblerine) istirdadı (geri iade edilmeleri) zimmete Rişvan Aşireti beylerini hemen hane ve saire yanına buyurulmalarını muktedir mübaşeretiyle irsal kazandığı ve dersaadete bilfiil sevk suretiyle icabetine bakılacağı ve şayed Rişvani aşireti tarafına Terkanlının sahabet tarafı dinlenerek tasrihan icrayı hak manası uymadığını takdirin sukut ve ağmaz oluna merkurmlar şımaracaklarına başka uygunsuzlukları bir dahi sirayet eylemedikçe Terkanlıların birisine sahabe olunmaz ise bu tarafına bir adam alır hanelerimiz tarafına gideriz ve Şeyh Bızınılılardan ise beş on ihtiyar Terkanlılardan dahi beş onunu celb ile ihkak-ı hak (hak alma) hürriyet ve rahat veririz. Ancak mîr mumaiyleh tarafına sahabet olunur ise tekasülümüze haml olunmak niyazımızdır ve nihayet bu tarafın Terkanlı üzerine asker çıkarılmak lazım geldiği halde dahi bilmuaye hududun kesib ... sözlerinden ibaret ve bunların herbir sözlerine itimad olunmayacağı keyfiyeti varest-i kayıt iş'ar ve işaret işbu haklarında lazım geldiği vecih üzere taltif ve te'lifi ba'dül icra vesaya ve tenbihat icabetinin izamına dahi imtina kılınarak

yanlarına mu'temed (güvenilir) adem tarikiyle hanelerine iadelerine karar verilmiş ve bunlar Rişvan Aşiretinin yaşlıları olarak bu suretde Terkanlı dan ayrılıb maslahata suhulet (kolaylık) kesb edilmiş ve şuna yalnız serakiye mezburû (adi geçen hırsızlar) emin mirmumaiylehin idaresine avdete ... karar üzerine ihkak-ı hak mana-i mucibesini suret balmadığı takdirde hah u nahah (ister istemez) asker sevkine mutavakıfen ... ve bu cihetle harekete mübaderet (işe başlama) bilvesile emir ve iradesinin tahsiline ve merbut bulunmuş olduğuna, bu hususta mezburlara sahabe etmeyerek muavenet (yardım) ve müzaheret (koruma) muktaziyeyi kamilen icra edilmesine mumaiyleh ... ismine Abdurrahman Bey bendelerine hitaben emirname

Hazreti vekaletpenahın ihdar ve siyanet ...

Tesril-i maslahatça memuriyetini istihdam olunacağını ve merhuman ... Mustafa bey'le manzur buyurulmak için leffen takdim kılındığı ifadesine sürat-i vesile-i arz hususiyet edilmiştir.

İnşallahu teala ... şeref-i vusul buyurula ve herhalde emr ve irade mahzan mumairadelerindir.

2

Kurdî: Di vir da qala kesên Têrikî dikin ku ji êla Şêxbezenîyan mal û milkê xelkê dizîne û keçekan wan jî revandine. Şêxbezenîyan ew gilî kirine û daxwaza bi navbertîya reşîyan çareserkirinê tê kirin. Dibêje ji her alî qasî 10 kes bèn guhdarkirin û li gor vê biryar bê dayîn.

D H MKT 00128_00017_002_001
Mikailli kürtleri reisi Alişir beyin Terkanlı eşkıyasını koruması ve beraber yaptıkları haksızlıklarla ilgili şikayet. Sayfa 3-1311(1895)

Piyade dairesine fî 5 Ağustos sene 309

Makâm-ı Sâmi-i Cenâb-ı Ser-Askerî'ye

Ma'rûz-ı bendeleridir

Hele eşkıyalık ve kuttâ'-ı tarîklik ilminde benûn-i sârıklara üstâd olan meşhur Terkanlı aşiretinden ve birçok def'a Haymana'da tutulup hapse konulmuşken Alişer Bey sahâbetiyle salıverilen ve ni-

hayet Konya'da birçok seneler haps olup ikmâl-i müddet eden Bayram nam şakî ve ona refâkate olup ondan cerî ve cesur bulunan Terkanlı Tilki Hasan ve birkaç daha eşkıya birleşüp daima Alişer Bey'e arka vererek ...âhirede tecâvüz eyleyerek deve ve sığır ve manda misillû büyük hayvanât götürmeleriyle Alişer Bey'i ihyâ ve âlemi ızrâr etmektedirler.

Mehmed Sadık

Kaza-i Haymana.

Mühür.

Kurdî: Ji êla têrikîyan dizekî navdar Bayram, hevalê wî Tilki Hasan û hevalên wan bi alikarîya reisê Mikailîyan Alîşêr beg ji girtîgeha Haymanayê hatine berdan û wana ji bo Alîşêr begê dizî û talana xelkê kirine, dest dane ser heştir, deve, naxir û komîşên xelkê û bi vê Alîşêr beg devlemend kirine.

Mehmet Sadık

Bajaroka Haymanayê

Mor

ÇAVKANÎ:

BOA (TC Başbakanlık Osmanlı Arşivleri)

Şerefname, Şeref Xan 1597

Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler- Ziya Gökalp

Akkoyunlu-Kürt ilişkileri, Veysel Akdeniz

Hêmanên gencîneyên me yên girîng û çandî: Nav û bilêvkirina navan

S. Erdem

Destpêk:

Helbestvan Arjen Arî di hevpeyvînaka xwe de dibêje: “Helbest li ser axa xwe şîn dibe.”¹ Navên merivan jî, ji ber ku wek mînak helbestvanên li ser axa xwe şîn dibin nîşan didin, di çanda civakan da cihekî girîng digirin. Nav, ji nimandina merivan herî zêde, nimandina civat û çanda civakan nîşan didin. Çimkî berîya her tiştî nav, di nav zimên da tîrîgîştin û pejirandin û ziman jî navgîna esas veguhêzîna çandê ye. Ziman, objektîf-bûyîna jiyana rojane bi wateyên hevbeş peyda dike û heman ev fonksiyona xwe di ser navan, navên ku ji paşaroja hevpar re bûyî referans da nîşan didin û ji domandina çanda civakî ra dibe alîkar (Çelîk, 2006: 39). Herweha nav, ji ber ku ji bîreka kolektîf tîrîgîştin û him ji cîhana civakî û zana ra dibe referans, him jî di nav pergala çandî da wek kodêka ragihandinê ye, fonksiyona xwe dibe (Çelîk, 2006: 40). Wek mînak: Di çanda kurdan da, gava meriv navên dê û bavên xwe li zarokên xwe dinin, nikarin navên wan zarokan hildin û li şûna navên wan bi wan ra dibejin “Anê” (dapîr) yan jî “Kalo” (bapîr) û ew denglêkirina bi vî awayî ji wan zarokan ra dibin nav. Di vê xebatê da em ê ji navan û bi taybetî ji bilêvkirina navan ra, ji der û dora xwe -bi piranî ji gundê me, gundê Hesinan (bi tirkî Büyük Damlacık Köyü)- hinek mînanan bidin û lêkolondina wan bikin.

1) Bilêvkirinê da kurtkirina navan:

Di zimanê kurdî da ji ber taybetmendî yê zimanî, devkî û nivîskîya navan ji hevdu cuda ye. Nav, bi piranî bilêvkirine da kurt dibin. Wekî ku Mehmed Uzun di romana xwe ya bi navê *Hawara Dîclêye* da (Uzun, 2019: 49) destnîşan dikê û dibêje: “*Ehlê Cizîra Botanê ku ji kurtkirina navan hez dikin*,” em jî dikarin bibêjin ku hemu kurd, ji kurtkirina navan hez dikin. Bi vî rengî nav tîrîgîştin û formaka devkî derdikeve holê. Mînak: Hesên dibe Hes, Îbrahîm dibe Bir an Biro, Fadîme dibe Fam û Emîne jî dibe Êm an Emik (Tablo 1-2).

¹ <https://www.dailymotion.com/video/xx3kyd> Tarîxa Gihiştinê: 28.04.2020

2) Di nasnameyan da guherandina xwemaliya navan:

Di babeta navan da yek bala meriv dikşîne ku ev e, navên bi xwemaliya xwe bi kurdî, di nasnameyên Tirkîyê de bi wateyeke bêpêwendî hatine nivîsandin. Wek mînak: Navê Rihanê kirine Rahîme, navê Garê kirine Ayşe û navê Tahê jî kirine Zeliha û hwd (Tablo 1-2). Li gora meriv dikare bibêje, gava mirov yekî li nifûsê qeyd bibe, karbidestên nifûsê çî hatiyê hişê wan, ew li nasname nivîsandine. Ji bo vê yekê mînakeke cîranekî me (Bobo / Ercan Şenoglu, li tarîxa 02.05.2020) dide û dibêje ku: “Li salên dawîya 1980an da rojekê ez çûbûm mala hevalekê xwe. Li wê rojê jî karbidest li malên gund digeriyan û sererastkirina qeydên nifûsê dikirin. Dema ku ez li mala wan bûm, karbidest hatin û nav pirs kirin, nivîsandin û qeyd kirin. Navê dayika hevalê min jî Garik bû û navê wê yê bi tirkî pirs kirin. Min jî bi henekê got, navê xwe Güney e. Li ser vê, navê wê xanimê Güney nivîsandin.” Lê ez bawer im bi şaşîti li nasname ne Güney, lê Gürey nivîsandine. Çimkî di nasnameya wê xanimê da navê xwe Gürey e. Faktoreka wekî din jî ew e ku, nav li gor wekhevîya denga guherandine û nivîsandine. Mînak, navê Kewê di nasname de Gevî hatiyê nivîsandin (Tablo-2). Wekî ku tê zanîn kew bi tirkî keklîk ê. Lê ji ber ku bilêvkirina Kewê û Gevîyê nêzikî hev in, nivîsandina Kewê bûye Gevî. Bi heman rengî, Pûl bûye Pûllû; Şekir jî wek Şakîre hatiyê nivîsandin û hwd.

Tablo 1. Navên mêran û bilêvkin û di nasnameya Tirkîyê de nivîsandina navan

Navên mêran (bi kurdî)	Bilêvkirina navan	Di nasnameya Tirkîyê de nivîsandina navan
Abdile	Abo / Abdo / Abik / Abdik	Abdullah
Bal*	Bal	Memet
Bango*	Bango	Hasan
Başo / Boşo*	Başo / Boşo	Haydar
Bavo / Babo	Bavo / Babo	Ercan / Suleyman
Baybay*	Baybay	Baybay
Bayram	Bayrik / Bayro / Beram	Bayram
Bekir	Bek / Beko	Bekîr
Bir	Biro / Birik	Îbrahîm
Caf	Caf / Cafik	Cafer

Cemal	Cam / Camo / Camal	Cemal
Cêbraîl	Cepo / Capo	Cebraîl
Cêzmî	Cesko	Cezmî
Cîhan	Cîho	Cîhan
Colik*	Col / Colik	Ahmet
Daxistan	Daxo / Daxik	Dagistan
Yehya / Ehya	Eh	Yahya
Elî	Al / Alik / Alo	Alî
Elî Dede	Aldede	Alî Dede
Enwer	Em / Emik / Ammar / Anno	Enver
Eşref	Açko	Eşref
Ezîm	Ezîm	-
Faxrettîn	Faro	Fahrettîn
Fayo	Fayo / Foyo	Faîk
Gêne / Gêna*	Gêna / Gêne	Musa
Gêdûk	Gaduk / Gêdûk	Gedîk
Gêncô	Gênc / Gêncô / Gêncik	Genco
Hecî	Hecik / Heco / Hecko	Haci
Hecîdede	Hecîdede	Hacidede
Hemît	Hamo / Hem / Hemik	Hamît / Abdullah
Hesen	Hes / Hêsik / Hêsko	Hasan
Heyder	Heydo / Heydik	Haydar
Hisên	Hus / Husko / Husik / Husîn	Hüseyîn
Hul*	Hul / Hule / Hullo	Îsmaîl
Hullo*	Hullo	Yakup
Îlhan	Hinik	Îlhan
Ismail	Îsik / Sim	Îsmaîl
Kimo*	Kimo	Haydar
Kor Axa	Kor Axa	Cevced
Kûbîlay	Qûbo	Kûbîlay
Kûdan*	Kûdan	Bekîr
Lût	Lût	-
Mem / Mam	Mam / Mem / Mamik / Momko / Momo	Mahmut / Memet
Mexm	Mexm / Mexemik	Mahmut
Mest / Mist	Mest / Mast / Masto / Mistik / Misto / Meçik / Miçik / Miço / Piço	Mustafa
Miho	Mih / Mihik / Miho	Mehmet
Mil Elî	Mil Elî	Alî

Mille	Mille	Molla
Millo*	Millo	Ahmet
Millos	Millos	Osman
Mişko*	Mişko	Haydar
Mûse	Mûse / Musik	Musa
Nebî	Neb	Nebî
Necîb /Necatî	Naco /Neco	Necîp / Necatî
Xefûr	Xefûr	Gaffur
Xelîl	Xallo	Halîl
Xelîldede	Deda / Dadik	Halîl / Dede
Xalît / Xatîb	Xatto / Xotto	Halît / Hatîp
Yamîn	Emko	Yamîn
Omer	Om / Omik	Ömer
Osman	Os / Oso / Osik	Osman
Ozcan	Îco / Êco	Özcan
Qam	Qam	Kamber
Qasik	Qasik / Qoso	Kasim
Qêm / Qem*	Qêm / Qemik	Ömer / Memet
Qetîl*	Qetîl	Osman
Qîs	Qîs	Îsmâîl
Receb / Recaî	Rac / Rec / Reco	Receb / Recaî
Reşik / Rişik	Reşik / Rişik	Raşît / Naşît
Remezan	Rem / Ramo	Ramazan
Reza	Rizik	Riza
Saadullah	Sexd / Sexdo / Sexdik	Saadullah
Samî	Somo	Samî
Satılmış	Sato	Satılmış
Selahattîn	Salo	Selahattîn
Sezaî	Sezo	Sezaî
Sim	Sim	Îsmâîl
Suleyman	Sil / Silo / Silik	Süleyman
Şêx*	Şêx / Şix	Bekir
Tato / Toto*	Tato / Tatik / Toto	Gafûr /Memet / Haydar
Têmûr	Tem	Tîmûr
Tûncay	Tûnco	Tûncay
Ûs / Ûsiv	Ûs / Ûsik / Ûsko / Ûsiv	Yûsûf
Zal	Zal / Zalik	Salîh / Zalîf
Zuppu*	Zuppu	Ahmet Hîlmî

*Ev nav, yên pêwendîya nivîsandina di nasnameyê da û xwemalîya wan bi hev re qet tune yî ne.

Tablo 2. Navên jinan û bilêvkirin û di nasnameya Tirkîyê de nivîsandina navan

Navên jinan (bi kurdî)	Bilêvkirina navan	Di nasnameya Tirkîyê de nivîsandina navan
Zebik	Abe	Zeynep
Af	Af	Arife
Asî	Asî	Asiye
Zeb	Ay / Aye	Zeyneb
Bes	Bes / Besik	Esmâ / Esme
Can / Canê*	Can / Canê	Gulfer
Cax	Cax	-
Cemîle	Cemik	Cemîle
Dondu	Don / Donik	Dondu
Emîne	Em / Emik / Emûn	Emîne
Elîf	El / Elik	Elîf / Elife
Esmê	Es / Esik / Esmê	Esmâ / Esme
Eyşê	Eş / Qêş / Qêşik	Ayşe
Êmiş	Êmiş	Emîne / Umuş
Fam	Fam / Famik	Fadîme
Fan / Fayme	Fan / Fayme	Fadîme
Fatme	Fat / Fatik / Foto	Fatma
Ferfûn*	Ferfûn	Findik
Gar / Garik*	Gar / Garik	Gürey / Ayşe
Gewr / Gewir*	Gewr / Gewir	Cevriye
Goz	Goz	Guzel
Gul	Gul / Gulo	Gül / Güllü
Gulfer	Guf	Gülfer
Gusik*	Gus / Gusik	Günsel / Zeynep
Hakil	Hakil	Hakil
Hecîng	Hecîng / Hec	Hatice / Hacer
Had / Hadik	Had / Hadik	Hediye
Haw / Hawik	Haw / Hew / Hewik	Hava / Havva
Îf	Îf	Ayfer / İlfet
Kew*	Kew / Kewik	Gevî
Kez / Kezban	Kez	Kezban
Man	Man	Mendife
Maşîqe*	Maşîqe	Hatice / Guler
Mêl	Mêl	Meliha
Mendîfe	Mendife	Mendife

Meşure	Miş	Meşure
Miyase	Miyase	Esme
Mok*	Mok	Medîne / Rûkiye
Nadîle	Nad / Nadik	Nadîle
Naz	Naz	Nazîfe / Nazmîye
Nûr / Nûrik	Nûr / Nûrik	Nûrîye / Nûrten / Nûray
Orab	Orab	Rabia
Perihan	Per	Perîhan
Pis*	Pis	Fatma
Piş*	Piş / Pişo	-
Pûl / Pûlik*	Pûl / Pûlik	Pûllû
Qanîme	Qanîme / Qam / Qamik	Kanîme
Qin*	Qin / Qinik	Dondu
Qiz / Qizik*	Qiz / Qizik	Kîraz / Mînube
Rab	Rab / Rabik	Rabîa
Reşik	Reşik	Rahşan
Rihan*	Rihan	Rahîme
Riş	Riş / Rişê / Rişko	Reşîde / Döndü
Seb / Sebiha	Seb / Sab	Sabîha
Safîye	Safik	Safîye
Sultan / Sulte	Sult / Sulte / Sultuk	Sultan
Şan* / Şaz	Şan / Şaz	Şazîye
Şekir*	Şekir	Şakîre
Şem*	Şem / Şemik	Şemsiye
Şêrik	Şêrik	Şerîfe
Şewzat	Şewzat	Şevzet
Têx *	Têx / Têxko	Zelîha / Dondu
Tulay	Tûl	Tulay
Urxê / Urx	Urxê / Urx	Rûkiye
Xan	Xan	Hanim
Xeçe	Xeçe / Xecik / Xeyce / Xat / Xatik	Harîce
Xeyal / Xayal*	Xeyal / Xayal	Nihal
Xezal	Xezal	Hazal
Xoyre	Xoyre / Xayrik	Hayrîye
Zeb / Zebik / Zebo	Zeb / Zebik / Zebo	Zeynep
Zex	Zex / Zexik	Zelîha
Zêz*	Zêz / Zêzik	Zeynep
Zuhre	Zuhre / Zuher / Zorik	Zuhre / Zehra

*Ev nav, yên pêwendîya nivîsandin a di nasnameyê de û xwemaliya wan bi hev re qet tune yî ne.

3) Diyarbûna bandora bawerîya tewşê ya li ser navan

Ji bo babeta navan taybetmendîyeke din a çandî, bandora bawerîya tewşê ye. Li gundê me car caran malbat navên merivên malbatên din li zarokên xwe dinin. Lê ger bi vê niyetê, navên ji merivên wê malbatê yêkê/yêkî li zarokên xwe nan, dibe ku navên zarokên xwe yên din jî bi navên merivên wê malbatê berdewam kin. Ger ew vê rêzikê bişêkînin û navlênanê nedomînin, dibêjin ku ew nerindiyê tîne û ew zarokên din ên nav lê nehatine dayîn jî pir najîn. Herweha ji bo bandora bawerîya tewşê, li çend navên mêran ên bi dû nava û navê xwe yê duyemîn wek “Dede” hatiye lênandin jî xuya dibe. Malbateke li gundê me (Mala Kara Huso), hemû kurên xwe navê xwe yê duyemîn “Dede” ye. Li gorî gotina keça malbatê (Ferrah Adanç, tarîxa gotinê 22.04.2020), sedema lênandina navê duyemîn a “Dede” weha ye: “Xanima wê malbatê (Zexika Beram), piştî ku keçika xwe ji dayik dibe, heta 12 salan kurên (lawik) xwe yan bi mirî ji dayik dibûne, yan jî hîn neketin yek saliyê dimirine. Gava ku ew xanima dîsa ducanî bûye, xewnek ditiye û di xewne de jê re gotine; kurekî te yê bibe û ewî wê bijî. Lê tu yê navê wî yê duyemîn “Dede” lênî û li cihê Dede (Cihê Ziyaretê) qurbanekê şerjêkî. Xanim, sibe radibe û bi tesîra xewnê, dihere xewna xwe ji cîraneka xwe -yeka ku xewna baş şirove dike (Zebê Ayê)- re behs dike. Cîranê xwe guh dide ser û jê re dibêje: “Ji kesî re qala ducanîya xwe meke û li cihê Dede qurbanê şerjêke û goştê wê nexe malê. Vê carê Zexik li gundekê din jî dihere malakê -maleke ocêx- li wê derê jî, heman tiştî jê re dibêjin. Zêdeyî dibêjin, ku navên pêxemberan li kurên xwe ne.” Bi vî awayî ew malbata kurê xwe bi du navan dikin û navên wan hemu yên duyemîn “Dede” ye. Wek mînak; Huseyîn Dede, Îbrahîm Dede, Osman Dede, Halîl Dede û hwd. Heta mervatîkî wan jî mîna wan, du nava li kurê xwe dine û navê kurê xwe dikê Omar Dede.

4) Navên ku wek ji paşerojê re guvah dibin

Nav, carinan derbareyê dîroka cîhwarê ku meriv lê dijîn jî agahîye didin. Wek mînak: li gundê me bilêvkirina navê Zuppu. Navê Zuppu, bi rastî Ehmed/Ahmet bûye. Lê gava ew zarok bûye, wî şorbe pir dixwarîye. Wê demê ermenî jî li gund dijiyane. Ji ber ku Zuppu şorbe pir dixwarîye,

ermenîyan ew bi vî navî Zuppu gazî dikirine û bi ser vê de navê wî wek Zuppu maye (Tablo-1). Dibêjin ku di ermenkî de zuppu, peyveka bi şorbê re têkildar e. Wiha diyar dibe ku di demên borî de li cihê gundê me de ermenî jî jiyane.

Herweha, meriv dikare bibêje ku, hin merivên bi navê dayikên xwe tênê vegotin jî, eserên ji heyne maderşahiye nîşan didin. Mînak li gundê me çend merivên bi navê dayika xwe tênê vegotin weha ne: Mistikê Zebo, Bayrikê Elê, Heskoyî Gozê, Ayibî Rişê, Elî Pişo û hwd.

5) Navên ku kevneşopîye nîşan didin

Ji bo mijara navan mînaka paşîn ku were dayîn ev e: Carinan hin kurik, hîn ji dayik nebûne yan jî ji dayik dibin lê hîn pir biçûk in (1-2 salî), bavê wan dimire û ew bêbav dimînin. Ji ber vê, navî bavê wan, li ewî kurikên bêbav dinin. Lê belê piştî ku navê bavên wan lê dinin, nikarin ku bi wî navî deng lê bikin û li şune bi wan kurikan ra dibêjin “Bavo yan Bobo”. Ew lêdana, ji wan re dibe nav. Heman bi vî rengî wek ku me berê behs kiribû, ger navên kal û pîran li zarokan danan jî, bi wan zarokan re dibêjin: Kalo yan jî Anê.

Taybetmendîyên çandî bi hin alîyan ra wekhev bin jî, ji gelek alîyan da ji hev cuda ne. Nav hêmanên girîng ên çandê ne. Bi nivîsandin, bilêvkirin û bi wateyên xwe, nimandîyan çanda kurdan dikin û bi vî rengî, taybetmendîyeka bêhempa didin çanda kurdan.

Çavkanî

Çelik, C., 2006, “*Kültürel Sembol Sistemi Olarak İsimler*”, Çukurova Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, Cilt: 6, Sayı: 2, s.39-62.

Uzun, M. 2019, *Hawara Dicleyê*, Weşanxane ya Îthakî, Stenbol.

Serenad

Li quntara çiyakî
Pişta xwe dayê zinarekî
Serenad ji bo berx û karan
Bi awazekî kurdewarî
Kerî rakiriye ser piyan
Dengê billûra şivan
Xwaş xwaş belav dibû
Li çol û çîyan
Yek jî ez bûm
Ji wan guhdaran.

Mem Xelîkan



AGAHDARÎYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatolîya Navîn wêneyekî kevn di Bîrnebûnê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatolîya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çî awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatolîya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmancîyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopîyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlemedîya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

Ji çarînên Omer Xeyam

wergera ji farisî: **Ehmed Mîlan**

Zimanet¹ nayê kirin hebûna me heya sibê re
Halê xwe xweş bigire ji vî dilê pir sewda re
Meyê noş bike li bin hîveronê, meh bi meh
Hîv dê gelekî bigere, dîsa me peyda nake

Her çiqasî reng û rûyê bedew heye min ra
Wek lalerû û mîna dara sirve bejn heye min ra
Diyar nebû ku di mezarxana axê da
Çi heyf, neqaşê ezel ewqas bedew çênekirama.

Dema ku mirim bi badeyê² min bişon
Telqîna min ji şeraba nab bikin
Heke bixwazin roja mehşerê min peyda kin
Di axa deriyê meyxa nê de li min bigerin

Qurana ku ew kilamên qedîm³ û hêja nin
Carcaran û ne her wext tîn xwendin
Li dora lêva pîyalê⁴ ayetek heye
Ku li her derê û her wext tê xwendin

1 Zimanet: garanti, soz, ehdkirin.

2 Bade: Mey, alkol, şerab, ereq. Nab: Xalis, sade.

3 Kilamê qedîm: Qurana mecid.

4 Pîyale: Qedeha ku li ser devê wê û li aliyê hindir ayet hatî nivîsandin.

Tu yê ku meyê venaxwî lûma neke ji mestan
Çêneke tu fêl û hîlan çêrok û dastanan
Mexrûr nebe ku tu meyê venaxwî
Sed loqmên heram dixwî ku mey pê ra xulam in

Rabe were şewqê⁵ bide ser dilê me
Hel bike bi bedewîya xwe muşkila me
Yek kûzik⁶ şerab bi hev ra nûş bikin
Berê ku kûzikan çêkin ji herîya me

Berbangê⁷ dihat dengê ji meyxana me
Ey mestê xerabatî⁸ ey dînoyê me
Rabe ku em tijî bikin pêymanê⁹ ji meyê
Berî ku tijî bikin pêymanan ji axa me

Em û mey û mitrib û ew koncîkên xerabatî
Can û dil û cam û kûzika pir tijî şerabî
Serbest ji hêvîdarîya rehmetê û tirsê ezabê
Asûde ji bade û xak û agir û avî

5 Şewq: Ronahî, ronî, nûr, ronîya hîvê, ronîya tavê.

6 Kûzik: Kûzka şerabê, mîna cêrê avê ye û ji herîya sax dihat çêkirin.

7 Berbang: Serê sibê, şevê.

8 Mestê xerabatî: Mestê meyxanê, jîrê meyxanê.

9 Pêyman: Pîyan, pîyale, cam.

Ewqasî vexwim şerabê, ku ew bîna şerabê
Were ji tirba min wek mirî me li binê erdê
Eger were ser tirba min memûrek
Ji bîna şeraba min bibe mestê meyxanê

Meyê dayne ser kefa destê min, dilê min bêtab e
Ev emrê revokî¹⁰ dibuhure wek cewa avê ye
Bizanibe ku agirê xortaniyê av e
Agahdar be ku hişyarîya dewlemendîyê xewn e

Heke dara jîyanê¹¹ ji bingeha bextê te hêşîn bibe
Ger li ser endama¹² te emr kincekî giranbiha be
Dî çadira ten¹³ da sîber be ji te ra
Hay jê hebe, pala xwe nedê ku çarmixê wê sist e

Ey bê xeberan şiklê berz¹⁴ hîç¹⁵ e
Ew asmanê neh tebeqe û reqem hîç e
Xweş be ev alema kevn û fesad
Girêdayî ye bi yek demê û ew jî hîç e

10 Emrê revokî: Emrê ku zû diçe, derbas dibe, birova diçe.

11 Dara jîyanê: Dara beqayê, mandigarî, ebedî, qiyamet,

12 Endam: Ten, beden, laş, bejn û bal, qamet.

13 Ten: Beden, can, laş.

14 Ber: ber ceste, zahir, ber çev.

15 Hêç: hîç, sifir, heder û bê feyde û bê hûde, dunya derewîn, ne mayê,

Kurdên Konyayê û serpêhatîyeke xweş

Zinarê Xamo

Min di nivîseke xwe ya berê da qala cîranekî xwe yê kurdê ji Konyayê kiribû. Navê wî Salih Erdogan e, ji gundê Omera ye. Keç û lawekî wan heye. Lawik 18 salî ye, hîn dihere lîseyê. Herdu jî hurmetkar in, wek şekir in.

Bi minasebeta tahmîrata xaniyê me, min çend malbatên merivên wan jî nas kirin.

Yê ji min ra karkir dît in lawê me-ta Salih e, navê wî Kemal Bulduk e.

Çend malbatên min nas kirin, giş jî ecêb camêr, nefsbîçûk û fedekar in.

Do tiştêk ji karkirên min ra lazim bû, dibê ez biçûyama ICA Maxîyê. Ji ber ereba min tune ye, ez ê peyatî biçûyama. Rê li dora 20 deqîqa ye. Çûyîn hatin li dora 40 deqeyî digre.

Li ber derî ez bi karkiran ra dipeyivîm. Lawê Salih hat ba me. Me silav li hev kir, min got ez ê herim herim ICA Maxîyê û min xatir jê xwest.

Got tu ê bi çi herî? Min got ez ê peyatî herim. Got apo, dûr e, peyatî neçe, were ez ê te bi erebê bim.

Her çiqas min got zahmet neke, ez ê herim, camêr qebûl nekir, ez birim û anîm.

Bi rê ve me hinekî sohbet kir. Te digot belkî nuh ji gund hatiye, kurmancîya wî ji ya zarokên min deh qatî baştir bû. Lawik li vir çê bûye, li vir mezin bûye, lê dîsa jî kurmancîyeke pir mikemel dipeyive. Ez bûm heyran.

Îro dîsa ji min ra tiştêkî din lazim bû, vê care jî bavê wî Salih ez birim HORNBACKÊ.

Ez çiqasî sipasdarê wan bim hindik e. Camêran dibêjin kînga ji te ra erebe lazim bû, ji me ra bibêje.

Kurdên herêma Konyayê herî kêr 300 sal in ji Kurdistanê, ji nav kurdan dûr ketine, ev 40-50 sal in li Swêd in, lê dîsa jî asîmîle nebûne, hîn jî dema tîn ba hev bi hev ra bi kurmancî dipeyivin, li malên xwe bi kurmancî dipeyivin, zarokên wan kurmancîyeke mikemel zanin.

Zarokên gelek siyasîmedarên kurd yên bi nav û deng wek yên kurdên Konayayê bi kurdî nizanin. Mesela kurmancîya zarokên min bi

qasî ya zarokên cîranên min ne baş e. Û em bi wan ra bêyî kurmançî bi zimanekî din napeyivin.

Lê dîsa jî kurmançiya wan zeîf e, bi taybetî jî yên herduyên biçûk.

Lê kurdên Konyayê ne tenê asîmîle nebûne, ji hev ra pir baş û bi tifaq in jî, ji hev hez dikin, bi ser hev da diherin û tên, alîkarîya hev dikin.

Li taxa me Albyê çend malên wan hene giş hev nas dikin, haya wan ji hev heye.

Yê me ne wisa ye. Du roj berê bi tesadufî min kurdekî Zaxoyî nas kir. Nabêna me 300-400 mîtro

ye, lê ev 17 sal in ez li vê taxê me, heta nuha me hev nas nekiriye. Lê kurdên Konyayê ne wisa ne, haya wan ji hev heye. Xwezî ev tifaqa wan di nava partîyên me da jî hebûya.

Min ji cîranê xwe û ji Kemal Bulduk ra (yê ji min ra karkir dîtî) got, piştî her tişt qediya hûn ê giş werin bibin mîvanê min, dibê em hev nas bikin, bi ser hev da herin, werin...

Tahmîrat bû sebebê tişteki xêrê, bi vê minasebetê ez ê çend kurdên Anatolîyê nas bikim...



Yek ji hevkar û edîtorê kovara me **Muzaffer Özgür** bi navê *Deng û rengê Anatolîya Navîn* her roja înyê bi dema Ewropayê saet di 20.00an de programekê li ser jiyan û çanda kurdên Anatolîya Navîn di Çarpel Medyayê de çêdike. Programa li ser Facebookê bi baldarî û bi eleqeyeka baş tê temaşekirin.

Em ji birêz Muzaffer û Çarpel Medyayê re serkeftinê hêvî dikin û programê pîroz dikin.

Redaksîyon

Kemana dil

Xizan Şîlan

ey kemana dilê melûl
bi awaza têlên te yên zîz
çiya û zozan bi gulên serkeftinê
dixemilin
miriyên goristanan
di xewa aramiyê de
vedihesin
pêlên çeman
bi xumexum zelal diherikin
heyv di şadiya xwe de
dibirique
îskeîska giriyê zarokên bêxwedî
aşt dibe
bi awaza têlên te yên zîz
keç û xortên delal
govenda şervanên wêrek
digerînin
dengbêj di stranên bi şewat de
sermest dibin
ramûsanên eşqê
ji xunava lêvên evîndaran
dibarin
peşkên baranê
li çolistanên ziwa dibin bextewarî
bi awaza têlên te yên zîz
perdeya bédengiya şevên reştari
vedîçire
giyanê xwedawendên pîroz
deng vedidin
çûkên berbangê
ber bi azadiyê ve difirin
ferîşteyên baxçeya bihuştê
meya kêfxweşiyê
dinoşin

bi awaza têlên te yên zîz
çar demsal
dibin bihara rengîn
ji dara jînê hêviyên kesk
dipişkivin
bûkên serbixêlî
kezîyên xwe
bi morîyên nezerê dineqîşînin
agirê tendûra dayikên bermalî
geş dibe
cemedî hinavên belengezan
dihele
bi awaza têlên te yên zîz
rûyê zarokên kenxweş
dibişirin
hungira êvarê şîrê hesretê
di paşila xwe de
dimeyîne
germiya awaza te
birînên sînga min
dikewîne
dayika welatê rojê
dergûşa şaristanîyê
di malzaroka xwe de dihevwîne
bi awaza têlên te yên zîz
hespê xeyalên min
çargavkî ber bi armacê ve bazdide
dîroka jankêş
ji nav lepên talana zaliman
difilite
mij û toza ser laşê çaxên genî
bi bayê hezkirinê
berba dibin

Hansê bextewar

Ji xizmeta heft salan şûnda, Hans ji efendîyê xwe ra gotiye, "efendî wadeya min bidawî bû, êdî ji dil da dixwazim herim mal, ba dayika xwe, kerema xwe heqî min bide!" Efendî bersiv dayîye û gotiye, "te bi dilpakî û sadiqî xizmet kir, heqê te jî divê wekî xizmeta te be!" û kulîçeyek zêr yê vîqasî serîyê Hans gir, daye wî. Hans destmala xwe ji berîya xwe derxistiye li kulîçeyê pêçaye, ew avêtiye ser milê xwe û dev dayîye rêya mala dayika xwe.

Gava ku ew bi rê da diçûye û her tim lingek di ber yê din diavêtiye, sîwarekî şad û teze yê ku hespêkî heşar diloqîne bi ber çavên wî ketiye. Hans bi dengêkî pir bilind gotiye, „Ax, hespajotin çiqas tiştêkî rind e! Yekî mîna ku bibêjî ew î li ser kursiyekê rûniştiye, lingên wî li tu keviran nakevin, meras jê ra ne gerek in, bi rê da diherê, ew nizane çawa!" Gava ku sîwar va bihîstiye, ew dawestîye, bang kiriye û gotiye, "Heyo Hans, lê tu çima peya diherî?" „Ez mecbur

im", Hans bersiv dayîye û daye ser û gotiye, „ez mecbûr im, ji ber ku kulîçeyekî kaş dikim male, ew zêr e, lewma ez nikanim serê xwe berve jor helînim, ji ber ku ew milê min dikute!" „Tu dizanî çî?," sîwar lêvegerandiye û gotiye, „were em bi hev biguhêrin, ez hespê xwe bidim te, tu jî kulîçeya xwe bide min!"

Hans gotiye, „ji dil da, lêbîlem ez ji we ra dibêjim, divê hun kulîçeyê bi xwebixwe ra kaş bikin". Siwar peya bûye, zêr helnaye û sewa ku Hans li hesp sîwar bibe, alikarîya wî kiriye, dîzgîn qeym dayîne destên wî û gotiye, "eger bixwazî bi lez biajoyî, gerek tu lingên xwe lêbikutî û bibêjî, deh-deh!" Hans li hêsp sîwar bûye, ji xwe bawer û bi dîlferehî birêketiye.

Pêçek neçûye, wî xwastiye ku hîn bileztir biajo û destpê kiriye û gotiye, „deh deh!". Hesp lezîyaye û hetanî ku Hans hîşyar bibe û xwe bigre, ew ji hesp da gêr bûye û ketiye korteke di navberê rê û zevîyan da. Hesp jî yê biketa kortê, eger

cotkarekî yê ku bi rê da dihatî û mangeyek diajotî, ew negirtiba.

Hans li organên xwe venihêrîye, xwe berehev kiriye û rabûye ser lîngan. Lêbîlem ew bi berxweketî bûye û ji cotkar ra gotiye, „hespajotin kêfekî ne çê ye, bi ser da jî eger meriv raste yekî vengînayî kin, jar û zincafi bihê yê ku meriva diavê erdê û merivê pê stûyê xwe bişkêne, êdî ez careke din qet li wî sîwar nabim. Manga we ji wî çêtir e, merivê bikane birehetî di pêy wê here û bi serda jî bêguman her roj şîr, rûn û penêrê wê. Mangeyeke mine weng hebe min çî li hemberî wê nedida!“ Dor hatibû cotkar, wî got, “madem we ewqas pir jê hez kir, ez dixwazim manga xwe bi hespê we biguherim!“ Hans pê hezar carî razî bûye. Cotkar bazdaye ser hêsp, bi lez ajotiye û çûye. Hans bê lez manga daye ber xwe ajotiye û bihevguhertin serkeftî bibîranîye: “Tenê parçeyek nanî min hebe bes e, qet tiştêkî din ne hewce ye, ez ê biqasî ku dilê min xwast rûn û penêr bikim nav û bixwim; ku ez tî bibim ez ê mangeya xwe bidoşim û şîr vexwim. Dilo, tu hîn çî dixwazî!?”

Wexta ku ew gihêştiye mêvanxaneyekê, ji vêsînîya pêçekê şûn da, wî bi şabûneke mezin ku di çiqina

wî da çî hebû, nanê xwe yê nîvro û êvarê ku çî li ba hebû, xwar. Û bi çend qurîşên xwe yên ku mayîbûn nîv kase bîra vexwar. Paşê wî mange da ber xwe û berve gundê dayika xwe ajot. Her ku nîvro nêzik dibû tîna germê zêde dibû. Hans li çêregehekê bû ya ku hîn seatekê biajota. Ji ber germê zimanê wî bi pidûyên wî da dinûsikî. „Ji vê ra divê çareyek hebe“, Hans ji xwe-bixe ra gotiye, „aniha ezê mangeya xwe bidoşim û bi şîrê wê xwe rehet bikim!“ Wî mange bi dareke zirav da girê daye, ji ber ku helbika wî tune bû, wî kumê xwe yê çerminî daye bin ganên wê, lê her çiqas wî hewldaye, jê çilkek şîr neçilikîye.

Çima ku ew î jênehatî bûye, heywanê bêsebir bi lingekî paşî tîzek wer pît pê henîya wî va daye, ew şengijîye û ketiye erdê, demekê heş ji serê wî çûne, nedizaniye ku ew li ku derê ye.

A Xwedê ku li wê navberê qesabek bi destarebekê, ya ku xinzirekî cîwan tê da bû, bi rê da dihatiye. Wî deng daye û gotiye, “Ew çî lîstik û yarenî ne!” û baş alikariya Hans kiriye. Hans ji wî ra qala serhatiya xwe kiriye. Qesab şûşeyê xwe dirêjî wî kiriye û gotiye, „kerem bike vexwe û vehêse. Mange nexwaze şîr bide,

ew heyvaneke pîr e, ew tenê dikanê bihê kişandin yan jî serjêkirin.“ „Pêh pêh“ Hans deng daye, dest di navporê xwe ra kiriye û gotiye: „Va dihate bîrîya kê! Ew tişteki baş e, lê eger meriv heywanekî weha li mal serijê bike, çi goştê jê bi derkeve!? Lêbelem ez ji goştî manga pir heznakim, bi min ew î hîşk e. Erê, xwaz bi yê ku xinzerekî xwe yî cîwan heye! Tama goştê wî cûda ye, hela jî suncikê wî.“ „Hans guh bide ser min“ qesab gotiye, „sewa xatirê we ez dixwazim biguherim û xinzir ji ber mangê va ji we ra cihbihilim.“ Hans lêvegerandiye û gotiye, „Xwedê mukafeta hevaltiya we bide!“ û dûv ra mange dewire wî kiriye û hevsarê xinzir yê ku ji erebeya desta beredayî, wergirtiye.

Hans rêwîtîya xwe dom kiriye û difikirîya ku her tişt li gor dilxwazîya wî dihere, kîngê ku ew raste nerindîyekê dihatiye, li dawîyê rewş vedigerîyaye ser başîyê. Paşê xortek tevlê wî dibe. Xort di bin çengê xwe da qazê bedew û sipî kaş dikiriye. Ew li halê hevûdû pirsîyane. Hans ji wî ra qala bextçêyîya xwe û bihevguhertinên ku wî her tim jê qezenc bi dest dixistiye, kiriye. Xort ji wî ra qal kiriye û gotiye, ew vê qazê sewa nanê

seremonîya vaftîzê zarokekî bi xwe ra dibe. Ew pêda çûye û gotiye, „Hela carekê helbigire,“ û wî bi her du qenadên wê girtiye û gotiye, „ew çiqas giran e, belam heyst heftayan ew têr hatiye xwedîkirin. Kî gezekê biavêje goştê wê yê biraştî, gerek e ku ew donê wê yê ku ji her du kevîyên devê wî biareve, pak bike.“ Hans gotiye, „erê“ û giraniya wê bi destêkî xwe pîvandiye û gotiye, „giranîya we di cîh da ye, lê belê xinzirê min ne yeke mihê ye.“ Xort li vê navberê bi awayekî pir şikdar berve her aliyekî mêze kiriye, pê va jî serîyê xwe hêjandiye. „Guh bide min“, Xort gotiye, „dibe, ku li ba xinzirê we her tişt ne di cîh da be. Li gundê han yê ku ez di nav ra derbas bibûm, rast yan derew, xinzirek hatiye dizîn. Tirs li min, ew î di dest we da ye. Xwedîyên wî meriv şandine ku li wî bigerin û eva bibe bazarîyeke pir neçê, eger ew we bi xinzir va bibînin. Kêmtir ew ê we têkin odeyeke tarî.“ Hansê xizan bizdîyaye, gotiye, „Ax, Xwedeyo!“ û li ber xort gerîyaye û gotiye, „di vê tengîyê da alîkarîya min bike, hun van deran baştir nas dikin, xinzirî min bistîne û qazê xwe ji min ra bihêle.“ Xort bersiv dayiye û gotiye, „hîngê lazim

e ku ez cirmekê helinim ser xwe, lê bîlem ez naxwazim ku ji avûrûyên min da xerawîyek bihê serîyê we.“ Li dawîyê wî bi bîen girtiye û bîlez xinzir kaş kiriye û bîriye ser rêyeke kenarî.

Hansê dilpak yê ku ji tahlîyan xelas bûyî, qaz di bin çeng da, berîyê xwe daye warê xwe. „Şayet ez vebinihêrim“, Hans xwebixwe ra gotiye, “ji vê bihevguhrtinê ez î bi avantaj im: Yekem braştîyê wê yê evrende (tamdar), bi ser da, dwînê wê yê ku jê biarave û nanê bi goştê qazê yê ji bo çaryek salê têra min bike. Ê bi ser da jî, perikên wê yên sipî û rindik, wana ez ê têkim bali-fa balgiya xwe û pê rehet ramedim. Dayika min ya çiqas pir pê şa bibel!”

Gava ku ew di nava gundê dawîyê ra derbas bûye, li wir sûtinkarek bi desterebaya xwe dawestîbûye. Te-ker a wî dikiriye giregir û wî bi rû da disitraye û digotiye, „ez meqesê disûtîm û di bîstekê da çerxê ba-didim û sekoyînkê xwe li gor bayê darde dikim!“

Hans dawestîye û li wî seyr kiriye, nihayet bi wî ra deng kiriye û gotiye, “rewşa we baş xwîya dike, hun ê bi şênûşahî karê stûnê dikine!”

Stûnkarê meqesê gotiye; „erê, vî destkarî binetarekî xwe

yê zêrinî heye. Stûnkarê durist û jîrûjêhatî ew meriva ye ku kingê dêst biavêtê berîya xwe, tê da her tim pereyê hebin. Lê we, va qazê rindik ji ku derê kirî?“ „Min ew nekirî, bi xinzirê xwe guhert.“ „Lê xinzir?“ „Min mangeyek bi wî guhert.“ „Lê mange?“ „Min hespek kir berdêla we“, „Ê hesp?“ „Min ew bi kulîçeyek zêr yê vîqasî serîyê min, kirî.“ „Ê zêr?“ „Ax, ew bedelê xizmeta min ya heft salan bû.“ „We her dem heq kiriye ku rê li xwe bikin,“ stûnkar gotiye, “aniha jî hun dikanin bigihên wê qonaxê ku hun dengê xîşînîya pereyan yên ku dixûşin berîya we bibihîzin, eger hun amede bin, hun ê serkevtî bibin.”

Hans gotiye, “ma ez çawa dest pê bikim?” „Gerek e ku hun bibin stûnkarêkî mîna min; ji vê ra, xêyrî kevirê stûnê qet tiştê ne pêwîst e, wekî din her tişt yê bi xwe bi rêva here. Yek li ba min heye, ew î tozîkê bi kêmanî ye, ji ber va, tenê qazê xwe bidin min; hun bi vê razi ne?“ „Ev çi pîrs e“, Hans gotiye, „ez ê pê bibim merivê bextewartir li rûyê dunyayê; her ku min dest avête berîka xwe pereyê bi dest min kevin, hîn çi dixwazime, êdî tu kêmanî û tahlî namînin!“ û qaz

dayîye wî û kevirê stûnê wergirtiye. Stûnkar ji nav çeyîrê kevirêkî bi giranîyeke normal yê li kêleka xwe helinaye û gotiye, „niha, aha bi ser da kevirêkî din yê qeyim ji we ra, yê ku meriv li ser bikane baş bikûte û hun ê pê mixên xwe yên xuwarbûyî rast bikutin, wî heline û baş bipareze!“

Hans kevir li xwe bar kirine û bi dilekî şa bi rê ketiye. Çavên wî ji şabûnê dibiriqîne û ji xwebixwe ra gotiye: “Ez î bi xwedarî hatime dunyayê, mîna zarokekî ku roja yekşemîyê hatiye dunyayê, her tiştê ku ez dixwazim dihê serîyê min.” Li wê navberê, ji ber ku ji sibehê pê ve bi pê bûye, ew westîyaye. Ji alîyekî da jî ezîyetê birçîbûnê, çimkî wî tiştên xwarinê giştik, ji avûrûyê şabûna bi kirîna mangeyê ya bihevguhertinê, bi carekê ra xwariye. Ew bi zehmet bi rê diçûye, zûbizû navber didaye û jî alîyekî da jî keviran yên ku wî kaş dikirin ew dikutaye û pir diêşandiye. Wî nikaniye xwe zept bike, fikiriye û ji xwebixwe ra gotiye ya çiqas baş

bibe ku ew ji kaşkirina wan fereget bike. Mîna şeytanokekî ew xûşîye û çûye ser kanîyeke bor, xwastiye ku li wira vehêse, bi qultek av xwe hênik bike. Gava çok dayine erdê, ji bo ku ew zîyanê nede keviran, wî pir bi dîqet ew deynane hêla xwe û kenarê kanîyê. Sewa vexwarina avê wî xwe xwarve kiriye û bêtî ku haya wî jê hebe, tozîkê def daye wan û her du kevir xwiş bûne û ketine kanîyê. Wexta ku Hans bi çavên serîyê xwe daketina keviran ya biniyê avê diîye, ew ji şabûnê ji şûna xwe firiyaye, dûv ra bi çokan ketiye erdê û bi çavên tijîkirî, sewa ku va rindîya kiriye nesîbê wî dua li Xwedê kirine ku wî kanîbûye, bêtî ku lome li xwe bikira, xwe ji van kevirên giran yên ku hîn ê bibûyana sebeba tengîyan, xelas bike.

Wî bang kiriye û gotiye, „Vîqasî min bextewar li dinyayê kesek tune!“ Bi dilrehetî û ji hemû baran xelasbûyî, ew bi lez bi rê ketiye hetanî ku gihêştiye mal, ba dayika xwe.



Mulla Evîndar

Roj diçû ava, şekil û şewqa xwe wenda dibû. Ku roj çû ava kerîyên pez diketin rêzê dihatin mal. Mîna keştîyên ku di nav deryayê de li dû xwe rêçên avê çêdikin, kerîyên zozanan jî li dû xwe bi toz û dûman dîmenek sipî û xweşik çêdikirin.

Kerîyên pez yek bi yek gişk hatin ser malê, ji xeynî yekî. Tenê yek nehat. Şev bû, wext çû, ne kerî hat, ne jî şivanê xwe Hemo.

Li nav kerîyê Hemo bêlên gund jî hebûn, her yek li benda bêla xwe bû. Dereng dereng li dûr dengê kerîyek pez, dengê kûçikan hat. Şivan û gundîyên zozanan, malbata Hemo bi lez, bi meraq meşîyan ber bi kerî çûn. Pezê Hemo bû.

Hemo li ser kerê ye, serçav bi xwîn, seri qeliştî ye, laş û kinc di xwînê de mane.

Jê pirsîn, wî bersiv da, go:

Pez xweş diçêriya, min pêşî lê negirt, min go ma pez here heta dera ku dihere. Ew çû, ez çûm, em nêzikê zevîyên gundê Omera bûn. Ji jor de siwarek li ser hespê hat, go:

Pezê te ketiye zevîyê.

Min go:

Tu kê yî?

Go:

Ez bekçîyê zevîya me.

Min go:

Tu şaş î, pezê min nekete zevîyê.

Wî go:

Tu him ne ji vî gundî yî, him jî li hemberî min derdikevî.

Şiva xwe ji nişka va derxist li min xist û berxeke çê jî ji nav pez girt, hilda ser hespê û çû.

Herkesî ew heta dawîyê guhdarî kir, yek ji van jî Ele Hecî bû. Ele Hecî, didanên xwe guvîşîn û ji Hemo tenê tiştêk pirsî. Go:

Ew zevîyên ku tu dibê li kudere ne?

Hemo jê re şûn go şunde Ele Hecî go:

Dereng e, bes e em herin, belav bibin, bi Hemo re dibê "derbasî be" û dihere radikeve Ele Hecî.

Seda zû ye, berbang e, roj tarîtiya li esman diqelişîne, hewa hênîk e. Dem dema pezrakirinê ye, Ele Hecî ji xew rabû xwe amade kir, tera xwe ji tiştê xwarinê tiji kir, kûpê avê ji avê tiji kir, şiva xwe ya

ji dara meşe heyne û berê xwe da
zevîyên gundê Omera.

Ele Hecî, qet pezê xwe wir de
nedibir lê îro pezê xwe rakir û beri
wir de kir çû.

Ele Hecî pez nêzikê zevîyên
wê derê kir, li dor xwe mêze kir,
ti kes tunebû. Go heta ku bekçîyê
zevîyan tê ez ji vir narim.

Siwarek bi hespê xwe xuya bû,
bi toz û dûman, bi lez ber bi Ele
Hecî hat û dawestî.

Go:

Şivano tu kî yî?

Ele Hecî go:

Ez şivanê vî pezê me, tu kî yî?

Ji xwe bi bawer go:

Ez bekçîyê van zevîyan im.

Ele Hecî:

Baş e, bi xêr hatî, ser seran, ser
çavan.

Bekçî:

-Tu ji kîjan gundî yî?

Ele Hecî:

Ez ji gundê Xelika me, zozanên
me ji vir ne pir dûr in.

Bekçî:

Te pez berdaye zevîya.

Ele Hecî kêfek lê peyda bû, di
dilê xwe de go: mîna çîroka Hemo
dihere.

Ele Hecî:

Keremke were rûne.

Bekçî çavên xwe li nav pez di-
gerandin, berxeke çê îşaret kir go:

Wê berxê bîne ji min re ez ê te
ef bikim.

Ele Hecî:

Tu heta vê derê hatî, ez te bê
av, bê dew bernadim, ji hespê peya
bibe were.

Bekçî ji hesp dahat. Dema ku
ew ji hesp dehat wî xwe wek şêrê
daristanekê dibînî.

Ele Hecî:

Şiva xwe jî bîne.

Bekçî:

Çima?

Ele Hecî:

Cemêr, mêrxas bêxeber li însên
nexin.

Awirê şêrê daristanê hat guherîn.

Ele Hecî:

Heramî, talankar qet ti car
cemêr, mêrxas nabin.

Bekçî meşîya, li şûna şivê ji tera
hespê xwe kêreke dirêj derxist.

Ele Hecî go:

Min ji te re bi şivê pênc lêxistin
eyar kiribûn lê yek bes e.

Carekê bi hêz, bi şivê li stûyê
wî xist, bi wê lêxistinê ew gēj bû, li
erdê ket, kêr ji dest de ket.

Ele Hecî dest û lingên wî bi bi-
zbenê girêdan, hilda ser hespê, vê
carê jî li ser hespê ew hespê girêda,

kendir di wî nûr kir. Hevsarê hespê di kera xwe girêda, berê pêz ber bi zozanê xwe kir û hêdî hêdî çû.

Li rê Bekçî li ber Ele Hecî gerîya, gotin li ser gotinê go:

Min berde, hespê xwe bidim te, min berde, zêrên xwe bidim te, min berde, çiqes pere dixwazî bidim te.

Lê fêde nekir. Ele Hecî mîna ku qet tiştek nebihîst bi rêya xwe de dewam kir.

Pez hat, kete nav zozan.

Zarokên ku li mêrgê dilîzin dîtî ku Ele Hecî bi vî awayî tê. Zarok bang dikin, xeberê didin gundî û şivanan. Herkes pê dihesê. Gişk rabûn ber bi kerîyê Ele Hecî hatin.

Ele Hecî go:

Ji heramîyan cemêr, mêrxas dernakevin lê ji ber ku li hember wan meydan vala ye, ew xwe cemêr, mêrxas dizanin”.

Ele Hecî hevsarê hespê da dest zarokan û bi zarokan re go:

Li nav zozan bi vî awayî bigerînin û paşê jî li mêrgê, berê hesp ber bi gundê wî bikin û berdin.

Zarokan ew li nav zozan bi wî awayî gerandin, herkes rabû sêr kir. Paşê çûn mêrgê, bekçî li wir li ber zarokan jî gerîya, go: “van girêyên

ben vekin.” Lê fêde nekir.

Zarokan bi wî awayî berê hespê ber bi gundê Omera kirin, hevsar ji serê hespê rakirin, li paşîya hespê xistin û hesp berdan.

Hesp bi loqan meşîya, suretî xwe girt û bi çargavkî ber bi gundê xwe bi lez bezîya û wenda bû.

TÊBÎNÎ

Cemêr: Mêrxasê ku ji ti kesî natirse.

Bêl: Şivan pezê çend malan digihîne hev û pê kerîyekî çêdike, pezê her malekê “bêl” e. Li vir kerî ji bêlan pêkhatiye.

Seda : Sibeh

Ter: Xurcê li ser piştê hesp, kerê ku şivan tiştê xwe dikênê.

Heynandi: Hilanîn. Mîna ku hatiye gotin “Şiv heyne”.

Bizben: Pezbend. Ben e, şivan ku şeveder ma bi hêlekê lingê bizin yan jî mîyê girêdide, hêla din jî lingê xwe pê girêdide, bi vî awayî dema ku pez diçe şivan pê dihesê.

Loq: Dema ku hesp yan jî ker bi gavên biç dimeşe, jê re dibêin “bi loqan dihere”, taybetîyek wê meşe heye, heywan baz nade, heta ku bi çargavkî here ew pê sûretê xwe digire.

Kurdên Anatolîya Navîn

Abdurrahman Benek

Fermo, ji bernameçêkirekî me yî zîrek û jêhatî bernameyeke xweş derheqa kurdên dervayî Kurdistanê da, ku dilê merivan baristan dike û evîna bo gelê me û welatê me xurttir dike.

Ji bo kurdên ku tam di navika Tirkîyê de dijîn, bi vê gotinê tîn binavkirin; “Kurdên Anatolîya Navîn. Dîsa navekî wan yê din jî heye; “Kurdên Gola Xwê.” Li paytextê Tirkîyê Ankarayê, bi pirranî li navçeyên wek Haymana, Polatli, Şereflîkoçîsar û Bala hene. Li bajarê Konyayê bi giranî li navçeyên Kulu û Cîhanbeglî, dîsa li bajarên Kirşehîr, Aksarayê jî gelheyeke kurdan ya berbiçav heye. Em dikarin li van bajarên, bajarên wek Yozgat, Çorumê jî lê zêde bikin.

Di derbarê dîroka wan de agahiyên cuda hene. Hin dîrokzan hatina wan ya Anatolîya Navîn, heta salên 1100î dibin. Hinek dîrokzan dinivîsin ku piştî sala 1500î hatine vira. Hin dîrokzan jî diyar dikin ku 250 an 300 sal berê koça Anatolîya Navîn kirine. Lêkolîner George Perrot, hebûna kurdan ya li herêma Anatolîya Navîn, di salên 1861-1872an de li Haymanayê dibîne û dinivîse û diyar dike “tenê bi zimanê kurdî dipeyivîn.” Perrot vê jî ji me re salix

dide, “Dema min li extiyarên kurdan pirsî, gotin em çend bavan berê hatine vira.” Ev jî hatina kurdan ya Anatolîya Navîn, herî kêr dispêre 300-350 sal berê.

Gelo bi çi sedemê? Çima koçber bûn? Wana surgunî xwarin an bixwe hatin? Gelo ji kuderê hatin? Pirsên bi vî rengî tam bersiva xwe negirtine. Piranî dibêjin, em ji Semsûrê, Qerejdaxê, Rihayê, Sêwregê û wan derdorana hatine, lê tenê gotin in û xwe naspêrine dokumentan. Dîsa em rastî yên ku ji Agirî, Qersê, Wanê hatine jî tîn. Her çiqas hatina kurdan ya Anatolîya Navîn, bi xwe re niqaşên wek kengî û bi çi sedemê hatine tîne jî, rastîya mîna ava çema ev e; wana heta roja me, çand û zîmanê xwe jiyanê û parastine. Le îro pê ve? Mixabin ji bo kurdên jenerasyona nû ya kurdên Anatolîya Navîn em nikarin vê bibêjin; “di pêşerojê de jî ew kurd wê zîmanê xwe ji bir nekin.” Zarok û neviyên kurdên salmezî yên îro li vê herêmê dijîn, were bisekine zîmanê xwe ni-

karin bipeyîvin. Piranî di asta, “em anlamîş dikin, nikarin qonişmîş bikin” de ne. Ditirsim ev jenerasyon a dawîyê be, yên ku zimanê xwe dikarin bipeyîvin. Elbet ev jî mirov xemgîn dike.

Ji wan gelheyeke pir heye ku koça Ewrûpayê kirine. Li welatên wek Denmark, Swêd, Norwêçê bi cihûwar bûne.

Bi Şereflîkoçîsara Enqereyê ve girêdayî 8 gundên kurdan hene. Ji heştan yek bi navê Buyukkuşla gundek e. Ji sed malî pirtir in û hîn jî di mala xwe de comerd in. Ku tu li derîyê kê bixî, dixwaze te biezimîne, ku meha rojîyê be jî. Haa, di nav xwe de yekîtiya xwe ava kirine? Na! Ku ava kurdên Bakur, Başûr û Rojava di bendekê de çawa diherike, ya kurdên Anatolîya Navîn jî bi heman awayî ye.

Wana bi Hesendaxê radîbûne govendê. Radyoya Rewanê guhdarî dikirin. Di mehên dijwar yên zivistanê de, dengbêj û çîrokbêj diezimandin li oda gunda. Wana pişt a xwe dane eşîretên wek Rîşwan an Reşîyan, Canbeg, Xelikan, Cûtkan, Omeran, Bilikan, Şêxbizînî û gellekên din. Nufûsa wan herî kêr ser mîlyon û nivê re ye. Rehmetî Bîlal Ercan hate bîra min, çî xweşmêr bû. Ew jî ji kurdên Anatolîya Navîn bû.

Kurdên ku li cihûwarên Agirîyê rabûne û berê xwe dane Anatolîya Navîn, bawermendên êzîdî bûne. Yên li derdora Meletî û Semsûrê koça Anatolîya Navîn kirine jî kurdên elewî bûne. Ez dibêjim “bûn” çimkî îro ne êzîdî û elewî ne. Di nav sedsalan de bûne bawermendên mezhebê heneftî.

Min ji kurdekî Anatolîya Navîn bihîst. Li Swêdê dijîya. Gotibû: “li cem me roj û agir pîroz in” û lê zêde kiribû: “heta çendekî berê, ku roj diçû ava, me agir nedida cîranekî xwe.” Dîsa xwe ser agir re çekirin an bazdan, li gor bawerîya wan guneh bû. Û helbet şeva îne teqez xwarinek didane cîranên xwe. Ev hemû mînakana, bawerîyên wan yên berê nîşanî me didin. Mînak; min li gundekî kurdan yê Anatolîya Navîn, li hewşa keyayê gund de tawûs dîtî. Camêr ji bo tawûsan ji hewşa xwe beşek veqetandibû û ew xwedî dikirin. Tawûsê mêr an nêr gellekî bi xeml e. Serî niv saetê carê, ev perên xwe yên nûwaze û rengîn vedike û forsa xwe li serê yên mê dike.

Ji tawûs yên nêr, duduyan tu nikarî di cem hev de bihêlî. Ku tu wana li cem hev bigirî şer û pevçûn li wan kêr nabe. Gelo vê rastîyê tiştek hanî hişê we?

Em kurd yek bin kê m in, dudu bin zêde ne. Niha piçekî hişê min tevlihev bû. Me kurdan ev xûya ji tawûs girtiye an ji me sîrayeta wana bûye ev bextreşîya?

Kerem kin hûn bi xwe "cila xwe ji vê ava şêlî derxînin".

□□□

Di amadekirina vê bernameya delal da keda ronakbîrêkî me ji Anatoliya Navîn **Harun Coşar** gelek e, ku niha li Stockholma Swêdê dimîne û bi vî awayî zewqa dilê xwe diyar kiriye:

- *Birayê Abdurrahman, wexta ez hîn 5-6 salî bûm, pîrka min ji me ra çirokên Welatê Jêrîn digotin.*

Berî ku dest bi çîroka xwe bike, ji kurika pîrs dikir dîgo; maleka min tê de, ji axzê dina Firatê, bi du mêra, sê jina, ka bên hela mala kîjan meriyê me ye.

Wexta ku me dizanî dîgo; min bajarê Helebê yan ji Entabê da te. Pîra min dîgo; va tiştina min ji xwasiya xwe, Zexa Tasê bihistine. Zexa Tasê bapîra diya Nazê Zulfî û bavê min e.

Lawê Zulfîyê Heydo hîn ecer bi berdêlî zewicibû, sala 1967 di 27ê meha gulanê de birûskê lêxist. Ez hingê 13-14 salî bûm. Meta min Zulfîye keşka wê Nazê û Fatê bi ro-

jan li kêleka hev disekinîn distiran. Êdî gundî damîş nedibûn, bi zorê kitanê serê wan dikirin devê wan seba ku bihewînin. Ew klamên wan li ser min weqas tesîr kiribûn, kengê min bibihîsta ez digirîyam.

Îro, subê min dişa çaya xwe dagirt, kompîtûra xwe heyna, li balkonê berê xwe da royê. Wexta ku min navê te lêxist seba ku li "Wext çawa derbas bû" mêzîkim, ez di cih da cemidim. Li hemberî min keşa meta min Nazê dîgo;

Nadim nadim, bûkê nadim

Eza serî bişom gulya badim

Wexte gundî Çamlîyê hatin rahîştin bûkê

Eza bi markî reş bim xwe pêvadam

Cara siftê bû ku ez negirîyam. Em ê niha li benda bernama te bin. Çi li vî axzê Firêt, çi li wê axzê Firêt. Li çar alî dunê ku kurd lê heyî, kal û pîrên me yên li dunê din, mîna ku zemanê berê li ber radyoya Rewanê dicivîn, em ê li ber televîzyonan rûnin. Ez nizamim çawa tarîf kim, te ji mîletê xwe ra tişteki çiqas mezin kirîye. Lê ez dibê m ji eşîrê me reşîya, dengbêj, apê Aşîk Abuzer Aşînses hestê me li ser te bi dengê xwe yî xwaş anîye zimên. Mala te hezar carî ava!

Ji kovara Riataza

Bo 175 salîya [jidayîkbûna] bingehtarê edebîyata qazaxan (1845-1904)

Tesîra Abay Kûnanbayûlî li ser edebîyata kurdî



Dr. Prof. Kinyazê Îbrahîm Mîrzojev

Zaneyê edebîyata hemcîhanê, herwiha zaneyê edebîyata qazaxî û edebîyata kurdî profêsor Kinyazê Îbrahîm, ku mamostayê Zanîngeha Almatîyê ya ser navê Abay e, rûpelên nû derheqa pevgirêdanên edebîyata kurdan bi edebîyata mîletên din ra raberî me dike, ku wana çawa tesîreke erênî li ser pêşketina edebîyata hevdu kirine.

Pevgirêdanên berfireh di navbera mîletan da – tradîsyoneke edebîyata qazaxan e, ya ku di nava gelek sedsalan da bi saya pêwendî û hevkarîya bi wêje û çanda Roavayê û Rohilatê ra, serketinên wan yên di hêla edebîyatê da dewlemendtir bû û wê jî di hindava xwe da edebîyata wan dewlemendtir kir. Û femdarî ye, ku îro edebîyata qazaxan bêyî pevgirêdanên bi wêjeya welatên dûr û nêzîk wê nikaribûye bi awayekî serketî pêş biketa.

Îro mîletê qazax hewil dide karekî giring pêk bîne: hemû gelên li Qazaxistanê dijîn li dora xwe bicivîne û tevaya hereketê wan bo pêkanîna wan pîrsdanînan bide xebatê, ku ber civakê sekinîne. Keda edebîyatê di karê pêşketina pêwendîyên dostanîyê di navbera mîletan da pir e.

Di vî karê pîroz da keda ronahîdar û xunedarê gelê qazax Abay bêhempa ye. "Gotinên xîretkêşîyê" –

nimûneyeke pevgirêdanên edebîyata mîletîyê ye bi pêşketinên edebîyata hemcîhanê ra, ji ber ku ew bingehtarê pêşketina tevaya edebîyata Qazaxistanê pirnetewe ye.

Efrandarîya Abay – ew ne tenê îzbata serketina edebîyatê ye, lê herwiha nîşana pêşketina çanda qazaxan e, ya ku rê ber mîletên komarê vedike bona pêşxistina edebîyata xwe. Wergera çend beşên "Gotinên xîretkêşîyê" ser zimanê kurdî bo me serketin û serbilindîyeke mezin bû.

Di berhemên helbestvanên kurdên Qazaxistanê Barîyê Bala, Hesên Hecîsilêman, Mecîtê Silêman da gelek nîşanên pevgirêdanên bi efrandarîya şayîr û nivîskarên qazaxan yên klasîk û yê dema me ra hene. Efrandarîya Abay, Ş. Kûdaybêrgênov, Î. Jansûgûrov, M. Jûmbayêv, M. Mûkatayev, O. Sûlêymanov, F. Ongarsînovî, J. Moldagalîyev. K. Mîrze Alî tesîr li ser



Abay Kûnanbayûlî

efrandarîya helbestvanên kurd kirîye. Têma derheqa hezkirina Welêt da qîmetkirina pêşîyên me, erf-edet û toreyan, tevgera bo serxwebûnê, qîmetîyên ruhanî, parastina şerefa mîletîyê, perwerdekirina nîsla nû bi ruhê welatparêzîyê û dostanîya gelan va, bo efrandinên wan bûne yek ji serkanîyên sereke.

Edebîyata gelên Qazaxistanê dewlemend bû, pê ra tevayî jî ya kurdan, di wê da merdanîya mîlet, rengên pirawazî, êgintîya germ û gurr xuya bû. Îdêya dostanîya mîletan û biratîya kêmeteweyên Qazaxistanê bû serkanîya ruhdar-bûnê û, hîlbet, ew yek di edebîyatê da jî cî digire û bi awayekî geş xuya dibe. Em dikarin bêjin, ku hema

ew îdêya bûn, ku rêyeke ronahî ber nivîskarên mîletên cuda-cuda yên Qazaxistanê vekir.

Bingehdarê edebîyata nivîskîya nû ya qazaxan Abay Kûnanbayûlî, ku edebîyata erebî-farîsî û çagatayê rind zaanibû, di helbestên xwe yên pêşin da gelek gotinên erebî û farîsî bi aqilane dike qalibê qazaxî û bi kar tîne. Ew destanên li ser bingehê naveroke efrandinên şayîrên Rohilatê yên mezin disêwirîne. Destana wî ya binavûdeng “Eskendîr” tam di bin tesîra destana Nîzamî “Eskendername” hatîye nivîsar. Em eynî tişt dikarin derheqa destanên din yên Abay da bêjin, wek “Azîm”, “Magsûd”, ku bi motîvên Rohilatê hatine nivîsar. Abay bû kûrayî mîrata hosta û

zaneyên Rohilata kevinare fêm dikir û qîmetekî mezin dida wan, di nav wan da Nîzamî, û wî mamostayê xwe dihesiband. Hunerê şayîrtîyê yê Nîzamî nesla şayîrên dahatû, ku nûnerên gelên akîna, jîraû bûn, herwiha ronahîdar-dêموکراتên qazax ruhda kir, ewê tesîreke mezin li ser pêşketina şayîrên xwedî kitêb, ango, yên ku bi ruhê aqilmendîya Rohilatê hatibûn perwerdekirin û bi cûrê helbestvanîya klasîk ya erebî-farisî û tirkî dinivîsîn.

Lê naskirina Nîzamî ya ji nêzîk va di dema Sovêtiyê da qewimî, dema berhemên Nîzamî bi hejmareke pir bi zimanên azerî û rûsî dihatine çapkirinê. Sersalîyên rojbûna Nîzamî, ku pîranî berî roja serketina Şerê Hemcihanê yê Mezin dihatine pîrozkirinê, alî ji nêzîk va naskirina wî şayîrê xwedî aqilmendîya mezin dikir.

Min di teza xwe de behsa edebîyata me ya bedew xal bi xal nivîsandîye. Edebîyata çar perçeyên welatê me tê de heye. Min edebîyata me û ya azerîyan daye ber hev. Li gorî vê tezê em dibînin ku gelek rewşenbîr û nivîskarên mezin ên Azerîyan, li ser edebîyata kurdan nivîsandine. Di nav wan de gelek kes jî hene ku kurd in. Mesela nivîskarê

Azerîyan ê mezin Nîzamî Gencewî dinivîse ku dayîka wî kurd e. Nîzamî „qeraseyekî edebîyata dinyayê“ ye. Wî bi xwe „Xemse“ nivîsandîye. Xemse ji pênc berhemên mezin pêk tê. Leyla û Mecnûn, Xosrov û Şêrîn 2 ji wan in. Her wiha wî Îskendername nivîsandîye. Nîzamî di berhema xwe ya Leyla û Mecnûnê de dibêje „dayîka min kurd e û navê wê Reîse ye. Min terbiya xwe ji malxalanê xwe yê kurd dîtiye.“ Gava dayîka wî dimire gelek xemgîn dibe. Li ser dayîka xwe nivîsandîye, me kiriye kurdî. Lê bi azerkî dibêje: ‘Kürt kîzî anamdîr/ Bizi terg etti/Bîr ana kalbîne dînyadan gîtî/Ne geder yansa da, yaksa da ürek/Anama dîl vîren var midir görek?’ Dibêje; ‘Kürt kizi anam/Diya min a keça kurd.’ Jixwe dayîka wî ji bajarê Gencê, ji Êla Şedadiyan bûye. Nîzamî li tu deverî nanivîse; „bavê min faris e, an azerî ye an tirk e.“ Naxwe bavê wî jî kurd e.”

Pevgirêdanên efrandarîya Abay Qunanbayev bi edebîyata gelên Rohilatê ra pir berfireh in û derheqa vê yekê da gelek çavkanî hene. Û ev îzbatîyên ku me li jorê raberî we kirin, didine xuyakirin ka berhemên nivîskarên Rohilatê tesîreke çiqasî mezin li ser pêşketina ziman û edebîyata qazaxan kirine.



**«Bi wefata Bariyê Bala
stêrkeke geş ji esmanê
çand û wêjeya kurdan
vemirî».**

Kinyazê Îbrahîm

Ronakbîrê kurda yî mezin Barîyê Bala

Kinyazê Îbrahîm

*Akademisyen û profesor serokê Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê «Berbangê»
û serokê Federasyona Navnetewî ya Diyasporayên Kurdan*

25ê gulana 2020an helbestvan, nivîskar, şanoger, prozaîk, Endamê PENa Kurd û endamê PENa Navnetewî, Barîyê Bala di 84salîya xwe de li Alma Ataya Qazaxistanê çû ber rehma Xwedê. Bi wefata Barîyê Bala stêrkeke geş ji esmanê çand û wêjeya kurdan vemirî.

Barîyê Bala (Barîyê Elîyê Paşê) 25ê tebaxa 1937an li nehîya Masîsa Ermenîstanê, li gundê Demîrçîyê di nav malbeteke kurdên sade de ji dayîk bûye. Bavê wî Elîyê Paşayê Miho, dayîka wî Qaza Evdoyê Bişo mirovên pir sade û kedhez bûne, bi keda xwe ya helal jîyana xwe derbas kirine. Heft kur û keçeke wî çêbûne.

Barîyê Bala sala 1958an dibistana gundê Demîrçîyê ya navîn xilas dike û li bajarê Yerevanê dikeve Para Dîrok û Fîlolojîya Azerî ya Zanîngeha (Înstîtûta) Dewletê ya pêdagogîyê ya li ser navê Xaçatûr Abovyan, sala 1963an bi dereceyê ke baş xilas dike. Piştî xilaskirina zankoyê salên dirêj di dibistanê da wekî mamosteyê ziman û wêjeyê kar dike.

Ew di sala 1975 an de li gundê Hebilkendê, nehîya Masîsê dibe serwerê dibistana navîn. Paşwextiyê di vê nehîyê da wekî mufetîşê (înspektorê) perwerdeya dibistanên navîn de karê xwe dimeşîne. Salên

dirêj li nehîya Masîsê bûye serwerê sovxoza Serwanlerê.

Sala 1989an wextê şerê li ser Qerebaxa Çiyayî navbera ermenî û azerîyan de malbata Barîyê Bala jî tevî hemû kurdên misilman ji Komara Ermenîstanê dertê, diçe Komara Azîrbêcanê. Sala 1998an tê Qazaxistanê, bajarê Alma Atayê. Li vir jî ew bi awayekî aktîv tevî karê civakî dibe. Di nav xebatên Yekîtîya Kurdên Qazaxistanê «Berbang»ê da wekî mamostê ziman û edebîyatê kar dike.

Barîyê Bala wexta şagirtê dibistana navîn bûye dest bi nivîsara helbestan kiriye. Helbesta wî ya ewilîn sala 1957an bi sernivîsara «*Dayika min*» di rojname «*Rya teze*» de tê weşandin. Paşwextiyê helbestên wî di rojnameyên «*Rya teze*», «*Dengê Kurd*», «*Jîyana Kurd*», «*Ev Roj*» «*Dîplomat*», kovarê «*Nûbar*» û gelekên din de hatine weşandin. Helbest û nivîsarên wî yên vekirî bi zimanê ûrisî, azerî, ermenî û qazaxî hatine wergerandin, di rojname û kovarên wan zimanan de ronkayî dîtine.

Barîyê Bala xwedanê deh pirtûkên weşandî ye. Pirtûka wî ya ewil sala 1974an bi navê «*Dinya min*» li Ermenîstanê ronayîyê

dibîne. Sala 1994an li Azerbêycanê pirtûka wî ya dudayan bi navê «*Kuda herim*» tê çapkirin.

2008ê salê pirtûka wî ya sisêyan «*Dilbera min*» ku pêşkêşî xanima xwe kiriye tê weşandin. 2009ê salê pirtûka wî ya çara bi navê «*Dayik*» ku helbestvan rewayî dayika xwe ya zehmetkêş Qaza Evdoyê Bişo kiriye, ronahî dibîne.

Salên 2011-2012an bi alîkarîya nivîskar û lêkolînavan Hejarê Şamîl du pirtûkên wî «*Kulîlkên neçilmisî*» û «*Deh bûyer*» digihîjine ber destên xwendevanên xwe. 2012ê salê li Kurdistanê Başûr, bajarê Duhokê bi alîkarîya Yekîtîya Nivîskarên Kurdistanê pirtûka helbestên Barîyê Bala bi sernivîsara «*Bijare*» tê weşandin.

2014-2015ê salê bi alîkarîya endamên Yekîtîya Nivîskarên Ermenîstanê û endamên PÊNa Kurd, Nûrê û Zera Serdaryan li bajarê Yêrêvanê du pirtûkên wî «*Ez û kevokê tenê*», «*Zerdeştê kab*» neşir dibin. 2016ê salê pirtûka wî ya bi navê «*Dilê şikestî*» (Разбитое сердце) ronahîyê dibîne. 2005ê salê şair, nivîskar û dramatûrg Barîyê Bala tê hîlbijartin wekî endamê PÊNa Kurd. 2014ê salê bi xelata ser navê Ehmedê Xanî tê rewakirinê.

Barîyê Bala pênûsa xwe di hemû mijaran de: helbest, nivîsara vekirî, bîranîn û dramatûrgîyê de ceribandîye. Mijarên helbest û poêmên Barîyê Bala cuda cuda ne: Evînîya du dila, hub-hizkirina dê û bavan, gel û welat, hizkirina mirovahîyê û tebîyetê, rexne, şîret û yên din. Lê helbestvan di helbestên xwe de fikra hîmlî datîne ser welathezî, hub û hizkirinê.

Koletî û bindestiya welatê kal û bava Kurdistanê, par û parîbûna gelê kurd axîn û kedereke giran dixe dilê şaîr. Zilm û komkujîya li Helepçeyê, Şengalê, Kobanîyê, li bajar û gundên kurdên wêranbûyî dilê wî dişewitîne:

Barîyê bala gelek nivîsarên vekirî jî nivîsîne: «*Nado û Narê*», «*Bila dili dil be*», «*Ez û kevokê tenê*», «*Gelto*»,

«*Paşa û Belgîzar*», «*Çar emir, çar demsal*», «*Cemîle*», «*Zerdeştê kal*», «*Ez û kalê welathezî pir bi derdî kul*», «*Kew, bilbil û sorgula tengezar*», «*Deh bûyer*»; bîranînê xwe- «*Seyda Şamîl*» (Şamîl Eskerov), «*Bîranîn derheqa Mehmedê Siloyê Bava da*», «*Mehmedê Sloyê Mihoyê - Îsa Begê Rewanî*» ku pêşkêşî pismamê xwe Mehmedê Silo Miho kiriye.

Em wekî Yekîtîya Kurdên Qazaxistanê «Berbangê» bi wefata Şaîr û Nivîskarê kurd Barîyê Bala gelekî xemgîn in. Koçkirina Barîyê Bala dibe ku bi awayekî fizîkî be, lê ew ê herdem bi fikir, raman, helbest û nivîsarên xwe, ne tenê li Qefqasyayê û Sovyeta Berê, em di wê bawerîyê de ne ku wê li seranserê welatê me di dilê her neferê kurdan de bijî.



MEM

Barê wî evîn e
Evîna wî Zîn e
Zîn ji wî re jîn e
Dil pê gêj û dîn e



ZÎN

Eşqa wê firî Mem
Evîn li dil bû çem
Şev û roj û herdem
Herikî tim li cem

Mûlla Evîndar

Qerfo

Stîleke nu ye. Bêhed, bêsansur û otosansur e. Rexne û henek in.
Bêtirs in, lê zik û hîsên kesî naêşînin. Çav û mejo vekirîye.

Seyfi Doğan

li dawîyê
çiyayên bilind
kon vekirine

we bihîst
kurdekî
kurdek pîroz kir

perdeyên malê gewr
ê ji derve da
zer dikine

mêşa hingiv
kete hundirî konî siyasetmedar
li ser gula sor danişt

jinik û mêrik
du televizyon
di dest wanan da telefon

karkerê rîsipî
bi hesret di dû
berhemê xwe mêze kir

avahîya kitêbxanê kevn
derî sipî
kilîd bi pas



Ji vir û ji wê -ÇEND KURTENIVÎS-

Nuh Ateş

nuhates48@gmail.com

Fikrên ecayîb

– Fikra ku ne bi tehluke ye ne lay-
iqî wê ye ku bihê fikirîn.

– Meriv kêmtir bi xwe ye gava
ku wî bi şexsê xwe deng kir. Mas-
keyekê bidin wî, ew ê rastîyê bibê.

– Hedefa derewkar bêtir şakirin,
heyranhîştin û kêfbelavkirin e.

– Ku meriv nefsmîr be têr zane
ye. Eger ew ne nefsmîr be, çiqas
zane be jî fêda wê pê nabe.

– Bi civatê ra jiyîn - çi ezîyet e!
Lê li derî civatê jiyîn - çi bêtar e!

– Tiştê ku em dikin trajêdiya
me ya yekemîn e, tiştê ku paşê em li
ser wê bibên jî trajêdiya duyemîn e.

– Ne yê gunehkar, yê bêheş
rûreşîya me ye.

– Wexta ku meriv behsa hewayê
dikin, gerek e meriv bizane ku di es-
lê xwe da qesta wan tişteki din e.

– Bibîranîya şabûnîyê tahlîya
xwe heye, bibîranîya kêfxweşîyê êşa
xwe heye.

– Li gundan her kes dikane baş
bibe, li wira tiştê ku meriva jî rê
derbixe tune.

(Çavkanî: Pirtûka Oscar Wilde, *Extravagante Gedanken*. Wergera ji almanî, Nuh Ateş

Memê Alan û hatina wî ya Cizîra

Botan

Alan navê nijadekî (miletêkî) îranî
ye, wekî kurdan û farisan. Lê alanî
ne kurd, ne ereb û ne jî ecem in.
Memê Alan navê qehremanê Des-
tanê Memê Alan e. Li gor şaxê des-
tanê yê ku Roger Lescot berehev-
kirî Memê Alan ji bajarê Mixribê
ye. Û ew ji Mixribê bi kuriyê behrê,
bozê rewan hatiye Cizîra Botan

Mixrib navlêkirineke bi erebî
ye ji bo herema bakûrê rojavaya
parzemînê Afrikaya re, pirtir ji bo
herêma welatên wekî Tunis, Ce-
zayîr û Fas tê gotin. Navê wê
herêmê berî ereban, Kartaca (Kar-
thago) bû. Fenikîyan di sala 814an
berî mîladê bi navê „Qart-Hadaş“
(bajarê nû) li bakûrê Tunisê ava
kiribûn. Ev herêma berî mîladê
sala 146an dikeve destê romayîyan.
Sala 429an piştî mîladê, vandal û
alan ji Espanyayê da bi leşkerekî ji
80 hezar kesî derbasî wê herêmê
bûne, ew derana bi dest xistine û
Kartaca ji kirine paytexta xwe. Li
wir, wan bi unwanê, *Vandalorum
et Alanorum* qiralîyek êlan kirine û

Geiserichê Vandal jî kirine qiralê wê. Ev qiralîya sed salî zêdetir li ser pêya maye.

Ereb di sedsala 7an da dikevin Bakurê Afrikayê û sala 698an ew Kartacayê bi dest dixin.

Ma vandal û alan kîngê û ji ber çî û ji ku da hatine Espanyayê û Mixribê? Serdema entîk li Ewropayê wekî serdema revendîya (goçberîya) gelan jî tê binavkirin. Revendîya sewa debarê û bi taybetî ji ber êrîş û talankariya hunîyan. Sedsalîya duyemîn berî mîladê da ji ber êrîşên hunîyan komên alanan ji bakûrê Kazaxistan û doralîyê Deryaya Hazarê ber bi herêmên rojhelata Ewropayê, kevîyên çemê Tuna û dorhêla Macaristanê koç kirine. Ji wir da jî komên alanan li her derê Ewropayê belav bûne.

Komek ji alanan tev eşîra German (Alman) ya ku bi navê Vandal tên nasîn û li herêma Macaristan û Romanyayê bi cihûwar bûye, ber bi Başûrê Ewropayê kişiyane. Vandal du qebîle bûne, Asdingen (Azdingen) û Silîngen (Zîlîngen). Azdingen qebîleya qiralên vandalan bûye.

Sala 406an piştî mîladê komeke alanan di bin fermanariya qiralê xwe, Rezpential bi komeke mezin ya vandalan di bin fermanariya

qiralê xwe, Godegisel va tevhev li bajarê Mainzê (Almanya) di ser pira bi navê Romayîyan ra, ji çemê Rênê derbas bûne û ber bi başûr, herêma Galîyaye kişiyane. Ji wir da jî, ew di bin çavdêriya romayîyan da derbasî nîvgiravê Îberîyayê bûne û li Îspanyayê û Portekîzê belav û bi cihûwar bûne. Alan û vandal şervan û siwarîyên şeg û bi navûdeng bûne.

Sala 429an paş mîladê vandal û alanan ji Espanyayê da bi leşkerekî ji 80 hezar kesî, ji wan 20 hezar şervan, derbasî Efrikayê bûne û Kartaca zept kirine. Wan li wir qiralîyek ava û êlan kirine. Ev qiralîya sed salî zêdetir li ser pêya maye.

Romayîyan berê, ku bi dîlnexwazî be jî, qiralîya wan li Kartacayê qebûl kiriye, pê ra peyman jî çekiriye. Lê paşê, demekê qiralîya vandal û alanan sist dibe. Hîngê romayîyan bi fermanê qiralê Bizansê Justinianê yekem bi serkeşîya fermanarê leşkerîyê, Belîsariûs, di despêka sala 533an qiralîya vandal û alanan bi dawî aniye û Bakura Afrikayê kiriye milkê împeratoriya Romaya Rojhelat. Wan qiralê vandal û alanan û endamên malbata wan birine û li Stembolê bi cih kirine û ew li wir di bin çavdêriyê da bûne.

Havîna sala 534an romayîyan

hêjmarek mezin ji leşkerên vandal
û alanan bi keştîyan kaş kirine û bi-
rine Konstantinopelê (Stembole) û
ew li wir di nav leşkerên Bîzansê da
bi cih kirine û di şerê li dijî eceman
(sasanîyan) da bi kar anîne.

Ihtîmal e ku Bîzansîyan sîwarîyên
şeg yênan alan û vandalan (Azdîngen/
Zîlîngen) tev hespên wan şandibin

herêma Cizîrê û di şerê dijî eceman
da bi cih kiribin. Ji xwe di destanê
da jî qala şerê dijî eceman tê kirin.
Dibe ku sebeb û bingeha hatina
Memê Alan ya Cizîrê ev be.

Çavkanî:

- *Destanê Memê Alan*, Weşanên
Rîya Azadî
- *Die Wandalen*, Ludwig Schmidt
- *Die Wandalen*, Helmut Castritius



HELBEST

Bêrîvan Keskin

Bi xatirê te

Êdî baş dizanim, ez ê tu cara azad nejîm.
Ez ê carcaran xwe fenanî pêlan li qeraxê dilê te xim
Ez ê carinan perwaz bidim li qefesa zêrjehrîn
mîna ku li asîmanê te bifirim
Netirse, bila bêhna te fireh be
Çi mayî be ji te bexşî şevê kirim
Rûçikê gewher
Ewirên qemer
Xemzên çeper

Xal

Di paşîla min de qevdek şahî
Hêviyan gul veda bûn reng bi reng
Her ku bi rê vê diçûm diçûmisîn, diperçiqîn
Kolanên bajêr ên ketûm, xedar.
Sar û sipîçolkî bibû bajar...
Bayekî dilgivêş, bi ser guhê min de xwar bû û pispisî
got "bihara emrê çû tevî xwezî û mirazan".

Xwarinên kurdên Anatolîya Navîn

Fatos Koyuncuer-Brunner

Ez dixwazim di nivîsa xwe ya vê carê de qala xwarinên me yên kurdên Anatolîya Navîn bikim û bi mînakên bidim ber çavan ku ka ji dema zarokatîya min de heta niha di derheqa wan de çi hatiye guhartin.

Bêguman nanê sêlê yan jî wek ku em jê re dibêjin «nanê tenik» parçeyê her sifreyê bû. Sifreyek bê nanê sêlê qet naye bîra min. Jinan ew bi zehmetî dipêjandin. Ji sibê de li ber textên hevîr rûdiniştin û pir caran berî êvarê ji ber ranedibûn. Ji ber ku çêkirina nanê tenik pir bi zehmet bû, pir caran jinên cîranan digihiştin hev û wek komeka nanpêjan nanê tenik çêdikirin. Wisa her yekî ji wan bi ya din re alikarî dikir. Em zarok jî dema ku wan nan çêdikir, çend caran diçûn dihatin ku ji me re kilorên bi rûn

û penêr yan jî bi hek çêbikirana. Tahma wan bêhempa bû. Roja ku nanê tenik çêdibû, xwarina wê rojê ji sibê de heta êvarê nanê teze bû. Ji bo nanê êvarê tim “sıkma” çêdikirin. Li ba me gelekî ji wan hez dikin. Sıkma, qozîyên bi rûn û penêr û pîvaz bûn. Hertim bi dewan jî çayê dihatin xwarin. Li havînê pir caran zebeş jî didan rû wan.

Nanê tenik bi qîmet bû. Tê bîra min hertim ji xizmên ku li bajaran an jî Ewrûpayê dîjin re dihatê şandin. Ji goşt bi qîmetir bû nanê tenik. Lê ez dikarim bibêjim di çavên me zarokan de jî kilorên bajêr bi qîmet bûn. Em hertim bi derfeta xwarina wan pir bextewar dibûn. Belkî jî ji ber ku me ew kêmdîtîn, ew bi me pir bitehm dihatin. Tişteki balkêş e ku dema ku mêvan





Ez ê careke din ji we re li ser xwarinên zemanê dapîran binivîsim. Ka çawa bes bi nê û mûjan xwarin çêdikirine.

dihatin em zarok dişandin standina nanê bajêr, lê mêvanan kêfa xwe ji nanê tenik re dihat. Min hê îro jî ew îronîya li pişt wê nihêrîna nanê tenik fêm nekiriye.

Ka em ji taştê de dest bi xwarinên me yên kurdên Anatolîya Navîn bikin. Her sibê tim eynî tişt li ser sifreyê bûn: rûn, penêr, zeytûn, mast û rîçal. Me li zivistanê pir caran li şûna çayê şîr jî vedixwar. Carcaran li şûna rîçal hingiv jî dibû. Malbatan li zivistanê ji çerçîyan helaw distandin û me ew pir caran fikir qozî. Sincûq bes ji

mêvanan re distindan û me xwe dida benda mêvanan ku em bi wan re sincûqê bixwin. Li dema eyda qurbanê çend rojan qorma (qelî) hebû. Îro li ser her sifreyê gelek çeşitên penêr ku ji bajêr têne standinê, Nutella û gelek tiştên wek sewzeyê sorkirî û şênayî hene. Lê mixabin zarokên dema nû dîsa jî bi wan tiştan qayil nabin û pir caran taştêyê naxwin. Em sibê zû radibûn û rasterast li ser sifreyê rûdiniştin. Dapira min digot: “hûn ê nexweş bikevin dema ku we taştê nexwar”.

Hemû xwarinên me yên kurdên Anatolîyê bi heman awayî tîn çêkirin. Hertim rûn tê sorkirin, pîvaz, îsot û ava firingîyan (salça) lê tîn zêdekirin. Pişt re sewzeyê ku hatiye hûrkirin û av û biharat tevî dikin. Piştî demaka kin xwarin amade ye. Wisa bi vî awayî bacan, kundir, fasûlî û qompîr hwd. tîn biraştin. Pê re mast, dew an jî selete dixwarin.

Tê bîra min jinan berê erîşte û tiştên din ku ji hevîr dihatin çêkirin, çêdikirin. Ew di izbeyan de vedişartin û salekê dixwarin. Îro li her malê sarincên mezin hene û wan ji biharê de heta payîzî tijî erzaq dikin. Berê diya min kurabî yan kulîçe çêdikirin, me bi xwe re dibirin dibistanê û dilê hemû zarokan dikete me. Ji ber ku tu jinên din ji gundê me nedikarin wan tiştan çêbikin û nas jî nedikarin. Niha dinêrim di her malê de firinên elektrîkî hene û hemû jinan sarincên xwe tijî kurabî yan kulîçe kirine. Dema ku mêvanek tê hema ji wan pêşkêşî wan dikin.

Gelek xwarinên bi goşt hene. Berê goşt hindik bû û bi taybetî ji bo mêvanan bû. Îro her roj goşt tê xwarin. Xwarin ji ber medyayên civakî gelekî hatine guhartin. Pir caran mat dimê dema ku li gund diçim mala ap an xizmên xwe. Gelek çeşitên şîranî û xwarinên nûjen didin ber mêvanan. Bi taybetî jî ew “zeytinyagli yên tirkî”. Pir caran jî xwarinan ji bajêr siparîş dikin. Nanê sêlê jî ji bajêr tê standin, kes êdî nê jî lénaxe.

Şorbe li ba kurdan ne ewqas pir in. Bes mehir, şorbeyên nîskên kesk û sor û şorbeya pincar a ku bi sarkî tê xwarin hene.

Pirinc bes ji mêvanan re dihat kelandin. Me bi xwe bilxur dixwar. Tehma xwarinên ku dapîra min çêdikirin qet ji bîra min naçe. Pir bextewar im ku ji wê hînî gelek xwarinên xweş bûme. Hê îro şorbeya wê ya nîskên kesk çêdikim û tehmê ji zadê (savar) ser nê derdixim. Ji zadê ser nê re dibêjin xwarina şivanan, ji ber ku merivî têr dike û ji erzaqên ku li mala xizanên jî tîn dîtin tê çêkirin.



Rojîya Evînê

Adem Akat

Dizanim...

Rojîya evînê dizanim ezbenî...

Hesreta birçîbûnê, qirînê dizanim...

Dema fitareke qet neyê çav dikim...

Wê neyê dizanim...

Wê qet tê negihê...

Wê qet neyê xwendin bircîbûna dilê min...

Ji min berê ku wê qet teva nebe...

Umrê min yê ku mîna bayekî derbas dibe...

Çavreşa min, ya ku min gotî ezê hînê bibim...

Bila Yezdan min êdî bibihîze !...

Ma bibihîze !...

Bila êdî vê fitarê veke...

Ma veke, da ku min bigihîne tîbûna min Cebraîl...

Gelo li derî ye Azraîl...?

Bes e êdî bes, ma pufe sûrê ke Îsrafil...

Ma pufê ke...

Mizgînî be li çol, çiya û kurmê jajê...

Mizgînî be Mîkaîl hatîye...

Di ronîya heyvê de bihar anîye...

Bi xêr hatiye xweş hatîye...

Ka ji min re bêje...

Gelo yarê ji min re xeber şandîye...?

Gelo wê jî mîna min bîrê kirîye...?

Êdî dilê min ji vir derbas bû...

Hela wê de ma kerem ke, ma kerem ke...

Ma min bibe ya ku min gotî bihuşta min e...
 Ma min bigihîne zarokatîya min....
 Hatina xwe ji har û agir filitînê dizanim...
 Dizanim...
 Dema umrê min mîna bayekî derbas dibû...
 Talankirina xwe dizanim...
 Belawela,
 Kêmbûyî,
 Şikestî,
 Zarokwarî,
 û qeeet nemezinbûyî...
 Bîna bi xemgînîyê ve dagirtî,
 Mîna ku hema di ber girîne de be disekine,
 Xwe xistibe hindir û xeyîdî be,
 Ji hiskînkên min hincirandî dizanim...
 Gelo ezê bigihêm eşqa erbabê te...?
 Ezê bikaribim xwe têr li stu badim...?
 Min cancanika xwe berda hatim...
 De ka ji min re bêje...
 Wê teva bibe êdî ew hesret...?
 Ji agiran derketim hatim...
 Ji bo ku ji yarê bibim ji har û qijilê reviyam hatim...
 Min hemêz bike tîbûna min hemêz bike...
 Ez hatim ku xwe bigihînim te... bigihînim te...

"Karîn" yan jî "kanîn"

Ecevit Yıldırım

Di kurdî/kurmancî de lêkerên „karîn“ û „kanîn“ hemwate ne. Wek mînak: Tu dikarî sêvekê bidî min? Yan jî: Tu dikanî sêvekê bidî min? Her du pirs jî di heman wateyê de ne.

Di zimanê nivîskî de lêkera „karîn“ rûniştiye. Lê forma „kanîn“ jî di coxrafyayeke pir fireh de tê bikaranîn. Ji herêma me Anatolîya Navîn bigrin heta Xorasana Îranê, ji Efrînê di ser Kobanî re heta Wêranşarê, li Entabê, Semsûrê, Meletî, Mereş, Sêvaz, Dêrsim û Xarpêtê ku eger kurmancî hîn tê dengkirin, forma „kanîn“ tê bikaranîn. Ji ber ku di zimanê nivîskî de „karîn“ tê bikaranîn, gelek însanên me zan dikin ku forma „kanîn“ şaş e. Halbûkî ew ne rast e.

Tev pê re ku forma „kanîn“ ne şaş e, ez bawer dikim, ku „karîn“ şiklê guhertî yê forma „kanînê“ ye.

Di zarava soranî de jî bo heman lêkerê „tiwan“ û şîxbizinên me yên li Haymanayê yên ku bi zarava lekî/lorî deng dikin jî forma „tan“ bi kar tînin.

Ev yek dîtina min piştrast dike ku eslê forma lêkera „karînê“,

„kanîn“ e.

Di her du zaravayan de jî şûna dengê „r“ dengê „n“ tê bikaranîn.

Her wiha zimanên german ku mîna kurdî di heman malbatê de ne heman rewş heye.

Îngîlîzî=Can (wek ken tê xwendin)

Almanî = Können

Holandî = Kunnen

Swêdî = Kunna

Danî = Kan

Norweçî = Kan

Soranî = Tiwan

Şêxbizinkî/Lekî = Tan

Wek mînak di kurmancî de: Tu dikanî sêvekê bidî min?

Di ingîlîzî de: Can you give me an apple?

Di almanî de: Kannst du mir einen Apfel geben?

Di soranî de: Tu etwanî sêwikim pê bide?

Di şîxbizinkî de jî wek: Tu tanî sêvî vidî min, tê pîrskirin.

Ku em xwe bispêrin van pîrsana, em dikanin bêjin: Divê di kurmancî de forma kevin ya lêkera „karîn“, kanîn be. Ji ber ku di hemû mînakên li jor hatine dayîn de tê dîtîn ku şûna dengê „r“, dengê „n“

tê bikaranîn. Lê belê divê di demek pişt re li çend herêmên kurmancî tê dengkirin, forma xwe wek „karîn“ guherîbe.

Gava ez vê yekê dibêjim, meqseda min ne ew e ku em „kanîn“ bi kar bînin.

Di encamê de wate naguhere. Lê belê rastîyeke veng heye: Kurmancîya ku li herêma me tê dengkirin, gora xwe zimanekî qedîm e û koka

wê jî yek ji damarên dîrokî ya zara-va kurmancî ye. Bi mînaka di vê nivîsê de min xwest balê bikşînim ser wê yekê.

Sedemên ku di zimanê nivîskî de lêkera „karîn“ êdî rûniştiye, divê meriv di faktorên siyasî û coxrafîk de bigere.

Wekî din forma lêkera „kanîn“ ku li herêma me tê bikaranîn jî rast e û ne şaş e...



Helbest

ez î dîn im
ez î dîn im
va çend sal in
ez î xemgîn im
malê xerîbîyê serî xwe bixwe
ez î li ber nexweşxanê Huddingê
bi tenê berdîwar im
dehlizên nexweşê tarî û dirêj in
ne rêzanek e
ne rehberek e
ez î li birayê xwe digertime
roj hilat û çû ava
ez î li benda
xebareke xweş im.

Seyfi Doğan

“Feyza me weke Nîl e, lê em Dicle û Ferat in”

Seyîdxan Anter

Pesinên Mezopotamyayê pir in. Li gorî saloxan, Mezopotamya Dergûşa şaristanîyê ye. Berya her warî, li bakur û başûrê Mezopotamyayê li gund û bajar, li peravên rûbarên Tîgrîs û Feratê ji alîye hûrî-mîtanî, sumerî, akadî, elemî û yên din ve gund û bajar avebûne, çandinî û xwedîkirina pez li vir dest pê kiriye, teknîk, matematik û zanistî li vir rûdaye.

Du sembolên mirovatîyê yên giranbûha alfabe (pîktogram û îdeogram ên dema sumeran) û çerxe (teker, dolab) li Mezopotamyayê nuvebûne.

Beşeke mezin ji Mezopotamyayê Kurdistan e. Ji ber dewlemendî, spehîbûna xwe û herdu kezîyên xwe yên hûnandî, rûbarên Tîgrîs û Feratê, pesnê Kurdistanê wek “Cenneta baqî” angî aden an jî buhuşt dane.

Di nav herdu çeman de û li peravên wan, ji roja roj ve mirovahîye cî dîtîye û çî bînaye, ji etmonolojîya navan bigre heta bi tabletên sumeran, ji tofana Nûh heta bi nivîsên di pirtûkên pîroz de,

ji mîtolojîyê heta bi wêje û folklorê îro, ji serçavî heta dawîya Tîgrîs û Feratê, li herdu rûbaran çî cûre masî û ajal peyde dibin, ji bazirganîya bi keleşan heta bi zebeşên Amedê û bendav hatine avakirin, çî hatiye serê Kurdistanê, ji bo me geleşan ne diyar e.


Kambaxîya dolemendîyên serax û binax, zanyarî, hişmendîya dîrokî, wêje, ekolojîya Kurdistanê ji alîyên dagirkeran ve ne karekî nû ye. Lê dagirker û pergala wan bi kapitalîzma îro ve, ev wêranî roj bi roj pît û zêdetir dibe. Dê buhuştê li me bikin doje!

Vê dema dawî hin rewşenbîr li hember wê kambaxê radiwestin û bi kêmanî me û nemaze nîşên nûgihayî di wê xalê de şiyar di-kin. Kedek pêwîst, karekî zext û barekî giran. Yek ji van Mamostê me Amed Tîgrîs e. Wî vê carê herdu rûbarên, herdu “şahdamarên” Kurdistanê û Mezopotamyayê ji xwe re kiriye mijar. Bi çavkanî û belgeyên dewlemend, weşanxaneyên APECê, ev berhema Amed Tîgrîs “Dicle û Ferat” çap kiriye.

Kurdistan û rûbarên Kurdistanê bûye hoya gengeşiyên nav dewletan, an jî mîna ku Amed Tîgrîs dibêje: "Dicle û Ferat jî du çemên tixûbdêr in. Herdu jî ji Tirkîyê derbasî Surîyê û ji wir jî derbasî nav tixûbê Iraqê dibin. Bi çêkirina bendavên ber Dicle û Feratê re her ku diçe sal bi sal di nav van hersê dewletan de gengeşî û nexweşiyên li ser avê bêtir û tûjtir dibin. Hersê jî weke wawîkan ku li ser lêş bi hev kevin, li ser ax, av û petrola me li hev nakin."

Amed Tîgrîs xebatek ansîklopedîk kiriye. Ev berhem hêja ye di her malê de, nemaze di malên ku gedên wan diçin dibistanan de, hebe. Her wiha ji bo dibistanan - dibistanên bi perwerdeya kurdî û zarokên kurd zimanê dê li dervî welat dixwînîn- xezîneyeke zanyariyê û naskirinê ye. Li vir erkek tê ser rêya me ku pedagog, zimanzan û nivîskar û weşangerên bi wêjeya kurdî ve mujûl in, dest bidin hev da ku ji bo Dicle û Feratê kitêbeka xebatê (arbetsbok) saz bikin.

Li vir û li wir hin şaşiyên ziman peyde dibin. Lewra diyar e




ku mamosteyê me Amed Tîgrîs ev berhem bi kêf û hezkirineke berz nivîsîye ku mirov bi xwe re bi rûbarên Tîgrîs û Feratê re cûş dike.

Li nav û peravên Tîgrîs û Feratê çi heye, çi hebûye, çi bûye û çi dibê, bersiva pirsên çi, çawa, kengê û çima dide. Îca ger hinek rabin, bi tecrûbe, zanyarî û çavkanîyên xwe vî karê berfirehtir bikin dê kurd li ser Tîgrîs û Feratê bibin xwedî ansoklopedîyeke dolemend û ji nûve dolemendiyên xwe ji talanan rizgar bikin.

Hêja ye tu vê berhemê peyda bikî û bixwînî.


Kitêbên dersa zimanê kurmançî ji weşanxana APECê




ISBN: 978-88333-48-3 **Gilok** ar en l romedel i nordkurdiskan f r moders lsundervisning i grundskolan. 80 sidor, 150:-



978-91-88333-62-9 **Gilok pirt ka min a ebat **, en  vningbok till boken **Gilok**, l romedel i nordkurdiskan f r moders lsundervisning i grundskolan, 56 sidor pris 140:-




ISBN: 91-89675-03-7 **Alfabe**, 104 sidor, 120:-




ISBN: 978-91-88333-50-6 **Edebiyata kurdi - pirt ka ders ** b htir ji bo xwendekar n li      hatiy  amadekirin. Giraniya v  pirt k  bi kurdi li ser d roka ziman, klasik n kurdi,  kola Hawar , edebiyata modern   folklor  kurdi ye. Litteraturhistoria, en l robok f r gymnasie lever p  kurmandj , 226 sidor, 200:-



ISBN: 978-91-88333-49-0 **Herf n alfabeja min**,  vningbok, nordkurdiska, av Mustafa Uzun, illustrationer av Wolf Dieter K pfer, 72 sidor, 120:-



ISBN: 978-91-86139-89-6 **Kurdi**, 1-3, 64 sidor, 150:-



ISBN: 978-88333-44-5 **Efsaneya werzan** dikt f r barn av Mueyed Tay p, illustrationer av Necmeddin Bir , med latinska alfabetet, 90:-



ISBN: 978-88333-46-9 **Xwez  ez k viyek bama   ne kivi** dikt f r barn av Mueyed Tay p, illustrationer av Necmeddin Bir , 20 sidor, med arabiska alfabetet, Behdinani 90:-


Ev pirt k ji bo f rb na hin herf n alfabeja kurdi hatiy  amadekirin. Di alfabeja kurdi de hin herf hene ku ji aliy  form  ve n zi hev in l  deng n wan cuda ne. Weki herf n s -  , c -  , i -    wd. Hin herf ji hene ku ji aliy  deng ve n zi hev in l  form n wan ji hev cuda ne. Weki herf n f-v-w  wd.



ISBN: 978-91-88333-16-2 **Xwendin   xebata b deng**, Behdinani, 104 sidor, 120:-



ISBN: 978-91-88333-02-5 **Xwendin   xebata b deng**, Nordkurdiska, 104 sidor, 120:-



ISBN: 978-91-88333-14-8 **Niv s n xwendekaran** - ji ders n kurdi- (Elevtexter fr n kurdiskundervisning) Nordkurdiska, 246 sidor, 200:-



ISBN: 978-88333-43-8 **Xwez  ez k viyek bama   ne kivi** dikt f r barn av Mueyed Tay p, illustrationer av Necmeddin Bir  med latinska alfabetet, 90:-



Nejide Hanım
Allah panahı
galligir
insallahi

Zavallı paripatma hic
Vofa ve nolalali
patruca

OSMANLI ARŞIVI		
MVL		
11	16	2